

Kinyazê Îbrahîm Mîrzoyêv

ZIMANÊ KURDÎ

Zaravayê kurmançî

Күрд тілін оқытуға арналған әдістемелік құрал

Алматы
2021

ӘОЖ 811.222.5
КБЖ 81.2Құрд
М56

Қазақстан Республикасы Білім және ғылым министрлігі
Тіл саясаты комитетінің тапсырмасы бойынша
«Қазақстан Республикасындағы тіл саясатын іске асырудың 2020-2025 жылдарға арналған
мемлекеттік бағдарламасы» аясында дайындалды

Редакция алқасы:

Г.А. Алиев — Абылай хан атындағы Қазақ халықаралық қатынастар және әлем тілдері университетінің профессоры;

С.Қ. Бақтыбаева — «Мемлекеттік тілді үйрету элиталық курсы» мәдени мекемесінің басшысы;

М.С. Юсубов — филология ғылымдарының кандидаты, доцент, шығыстанушы;

Н.А. Надыров — қоғам қайраткері, Алматы облысының Еңбекшіқазақ ауданы, Ақбастау ауылы орта мектебінің директоры;

М.Ф. Шамилов — Абылай хан атындағы Қазақ халықаралық қатынастар және әлем тілдері университетінің Халықаралық қатынастар мамандығы бойынша докторанты.

M56 ZIMANE KURDI (Zaravayê kurmancî). Құрд тілін оқытуға арналған оқу-әдістемелік құрал./
Құраст.: К.И. Мирзоев. – Алматы: «Мемлекеттік тілді үйрету элиталық курсы» ММ, 2021. — 176 бет.

ISBN 978-601-08-1355-7

Оқу-әдістемелік құралда құрд тілі, мәдениеті мен дәстүрін игертуге ықпал ететін мәтіндер жинақталған, тіл игерушілерді машықтандыратын жаттығулар оқыту және әдістемелік ұстанымдарға сәйкес құрастырылған. Кітап құрт тілін өз бетімен игерушілерге, жексенбілік мектептердегі мұғалімдерге, жалпы қызығушылығы бар көпшілікке арналған.

Di pirtûka dersê de nivîsên ku pêşveçûna zîman, çand û kevneşopîya Kurdî pêşdixê hene, rahênanên ji bo hînkareên zîman li gorî prensîbên hînkirin û metodolojîyê têne sêwirandin. Pirtûk ji bo hînkareên serbixwe yê zîmanê kurdî, mamosteyên dibistanên yekşemî û raya giştî ye.

Учебник содержит тексты, способствующие развитию курдского языка, изучению культуры и традиций. Упражнения для изучающих язык разработаны в соответствии с учебно-методическими принципами. Книга предназначена для учителей воскресных школ, а также для общего круга читателей самостоятельно изучающих курдский язык.

ӘОЖ 811.222.5
КБЖ 81.2Құрд
М56

ISBN 978-601-08-1355-7

© Князь Ибрагимұлы Мирзоев
© «Мемлекеттік тілді үйрету элиталық курсы» ММ, 2021

Naverok

Peşgotin	4	Jina nandar	96
Hîmnê Komara Qazaxistanêye Dewetê	6	Sîr û hingiv li hev nakin	97
Alfabe û tîp	8	Efîyê Evdirehman	98
Nivîsandina tîpan	10	Rewşa jina kurd	99
Hevokên jêrîn bixwînin û binê tîpan xez bikin	12	Peyvên pêşîyan	101
Ji van tîpan bêjeyan çêbikin	16	Çend mijûlî ji bo xwendin û rastnivîsînê	102
Şîrîn û xweşe zimanê kurdî	18	Xwestek yek, ziman cuda	103
Navên fêkîyên jêrîn binivîsin	20	Du pêkenok	104
Navên heywanên jêrîn binivîsin	21	Weten	105
Navên van tiştên jêrîn binivîsin	23	Hezkirina çivîkan	106
Dibistana me	24	Rastnivîsara hejmaran	107
Navên rengan	25	Hevnasî	108
Dîlber û Qenco	26	Saet	109
Demsalên sale	27	Welatê me Kurdistan e	110
Hêlên sereke	29	Lêker	114
Bihar	31	Mar û rûvî	116
Kilamên zarokan	33	Çand û dîroka me hebûna me ye	118
Dersdarê min	34	Têderxistinok	120
Kurdên Qirgîzistanê	35	Skender û Dîyojen	121
Navên mehan	37	Bûk û stun	122
Navdêr (îsim)	38	Tiştonek	123
Dersa zimanê kurdî	39	Zira kerê, lota devê	124
Li baxçeyê kulîlkan	41	Zimanê kurdî	125
Televîzyon û şanoya kurdî	42	Kurdî û zaravayên wê	127
Zayenda Navdêran	43	Heqî winda nabe	129
Zimanê Dayikê	47	Xeberdana bi têtêlêfonê	130
Pêşgir (pêşpirtik/prefiks)	49	Mijûlîyên cimaetê	132
Cihnav	51	Çarîn	133
Malbata me	52	Sentaks (ristesazî)	134
Xidirnevî ((cejna kurdan ya kevnar)	55	Dîyar ji xewê hişyar dibe	135
Bêjeyên hevnav	56	Hevok	136
Bêjeyên dijmane (antonîm)	57	Îsmail û Îbrahîm	137
Malbata Dîyako û Şîlanê	60	Çemê gundê me	138
Du heval	63	Masiyên akvaryûmê	139
Zivistan	66	Simore (sivorî) ji zarokan hez dikin	140
Dilê dayîkê	67	Hevalê min tê mala me bi mêvanî	141
Kilamên govendê	69	Cejna we pîroz be	142
Cixare mirovan dikuje	70	Min Newroz çawa nas kir	146
Cihnavên nîşandêr	71	Çîroka newrozê û Kawa	145
Name	75	Kulîlka min	147
Cihnavên pirsyarî	76	Dîk, keresû (reşêlek), werdek û rûvî	149
Almatî	77	Diz û mele	150
Şêr û mişk	79	Axayê min bûye bostan	151
Rasthatin	80	Ha gulgulî, gulgulî	152
Alan û Beybûn fêkîyan dikirin	82	Hevala min ji min xeyîdî	153
Kurê bexîret	83	Rast û çewt	154
Têderxistinok	84	Mirov û mar	155
Pîrs û Bersiv	86	Biratîya quling û rûvî	156
Ez û xweza (tebîet)	87	Ji zargotina gelê me (Têderxistinok)	157
Malbata Berfinê	88	Pêkenok	158
Hevaltiya gur, rûvî û hirçê	90	Kûsî û rûvî (ji zargotina kurdan)	159
Kesera teyr	91	Bizin û karikên wê	160
Silêman û Têlman	92	Balerîna kurd Leyla Bedirxan (1903-1986)	163
Rengdêr	93	Komara Kurdistanê 1946 – Mehabad	166
Mamoste – Tûtî	95		

*Min ev nivîsî ne ji bo sahibrewacan,
belkî ji bo biçûkên kurmancan.
Ehmedê Xanî (XVII)*

Peşgotin

Ziman, edebîyat û çanda kurdan wekî dîroka gelê xwe kevnar û devlemend in. Ev dur û cewahirê neteweyê me ji kûranîya qirnan tên, di moxil û bêjînga sal û zemanên giran ra derbas bûne, ji nifşan derbasî nifşan bûne û bi vî awayî gihîştine dema me. Xebat û berhemên giranbiha yên dîrokzan û filozofên cihanê yên sedsalên berî Îsayî û her weha li gel çavkaniyên yûnanan, çavkanîyên Rojhilatê yên mîna çînî, babilî, erebî, farisî û hwd jî guwahîya (şahidiya) vê yekê dikin. Hê di destpêka sedsala 11an da helbestvan û ronakbirê kurdan yê navdar Elîyê Herîrî û di qirnê navîn da jî Melayê Cizirî, Feqîyê Teyran, Melayê Batê, Ehmedê Xanî û gelek kesên din di heqê hînbûn û giringîya zimanê kurdî da fikirên pir hêja ji me ra hiştine. Seydayê mezin Ehmedê Xanî di dîroka çanda kurdan da, ne bi tenê helbestvan, hozan û filozofekî mezin e, ew her weha zimanzan û me yê ekî nemir e jî. Ew berî di destana (poema) xwe ya “Mem û Zîn”ê (1695), hê di sala 1683an da cara yekem ferhenga xwe ya erebî-kurdî (Nûbara biçûkan) dinivîse û di medresa xwe ya şexsî da dersê dide zarokên kurdan.

Seydayê mezin di vê berhema xwe da gotîye: “Min ev nivîsî ne ji bo sahibrewacan, belkî ji bo biçûkêd kurmancan”. Ew gotinên hozan û zanyarê kurd yê nemir heta îro jî ji kemala xwe ya zanistî û filozofî tu tiştek wînda nekiriye û temî û rênîşandêrîyên wî yên ji bo hînbûna zimanê dayikê tu caran ji bîra me naçin. Rast e ku liKurdistanê hebûna neteweyê kurd hatîye înkarkirin, li hin cihan axavtina bi zimanê kurdî jî hatiye qedexekirin. Ji ber van sîtemên pêşgotî bi hezaran kurd asîmîle bûne û vê çerxa asîmîlasyona dijwar weha kiriye ku ew zimanê xwe yê dayikê ji bîr bikin û bi vî awayî bibin “ewladên” dêmarîyan. Pêşîyên me di wextê da belasebeb negotiye: “Çavên li derîyan, xwelî li serîyan”. Ev gotina pêşîyên me îro jî li cem gelê me kemala xwe wînda nekiriye. Li gel van astengîyan jî di vê sedsala dawî da li welatên cuda cuda kitêbên zimanên kurdî bi tîpên erebî, latinî, kirîlî û ermenî ronahî dîtine. Bi alîkarîya wan hetanî roja îro zarokên me, gelê me, ziman, dîrok, urf û adet û çanda xwe bîr nekirine. Ji bo wê yekê em keda wan mamoste û zanyarên gelê xwe yên eyan ji bîr nakin. Ew kitêbên han girîng in ku ji aliyê mamoste û dersdaran me yên mezin ji bo xwendin û nivîsara kurdî hatine hazirkirin. Keda wan hêja û pîroz e.

Di sala 1921ê da li Ermenistanê nivîskar û pedagogê ermenî yê navdar Hagop Kazaryan (Hagop Lazo) ji bo dibistanên kurdî bi tîpên ermenî kitêba dersê weşand ku navê wê “Şems” bû, lê belê bi van tîpan bi tenê kitebek hat çapkirin. Paşê di sala 1929an da bi tîpên latinî nivîskarê kurd Ereb Şamîlov û Îshak Morogûlovê asûrî alfabeya zimanê kurdî amade kir.

Divê em bîr nekin ku ji bo xwendina zimanê kurdî, li welatê Sovyetan ji berê da bi tîpên latinî kitêb kême zêde hatine çapkirin ku wê demê ji bo xwendin û hînbûna zimanê dayikê gelek ferz bûn. Paşê di sala 1945an da tîpên kirîlî li kurdan hatine ferz kirin ku heta îro jî zarokên me li dibistanan xwendin û hînbûna zimanê dayikê li ser wî esasî didomînin. Ev ne qelsîyek e û ne jî kêmasîyek e, dîyar e ku di dema xwe da ew elfabeya kirîlî gelekî bikêrhatî bûye. Lê em dinêrin ku di roja îroyîn da ev yeka têrê nake, lewra li gel pareka alem û neteweyên din, kurdên me (çi li bakurê welatê me, çi jî li rojavayê welatê me) jî derbasî alfabeya latînî bûne.

Gelê kurd jî zû da tîpên kurdî yê lafînî bi kar anîne û dema em li cîhana kurdayetîyê dinêrin, em keda Celadet Alî Bedirxanê mamosteyê kurdan yê mezin jî bi şêkirandin bi bîr tînin.

Divê bê gotin ku ji bo me kurdên me yê li welatê Sovyetan yê berê (Qazaxistan, Rûsya, Kirgizistan, Ermenistan, Gurcistan, Azerbaycan, Tirkmenistan), derbasbûna alfabeya latînî hem ji bo xwendin hem jî ji bo hînbûnê pêwîstîyeka mezin e. Bi vê kitêba “Zimanê kurdî” armanca me ew e ku em vê valatîya di xwendin û hînbûna zimanê dayikê da bi tîpên latînî dagirin û wekî destpêkekê jî em bikarin bi alîkariya fikir û nêrînên zanyar, nivîskar, zimanzan û mamosteyên kurd, feyde û zanînêkê bidin gelê xwe ku hêjayê vê yekê ye.

Divê bê gotin ku di wexta nivîsar û hazirkirina vê kitêbê da ji alîyê rêzimana zimanê kurdî da, me rêç û rêbaza mamosteyên mezin Celadet Bedirxan, zimanzan û profesorê zanistê Qanatê Kurdo, Wezîrê Nadîrî, Awa Balî, Hecîyê Cindî û yê din di ber çavan ra derbas kirin û feydeka mezin jî şêwir û fikirê wan ên zanistî stand.

Di dema nivîsîn û hazirkirina vê kitêbê da, me ji gelek çavkanîyan qinyat hildane. Ev çavkanî ne ku bi tenê kitêbên bi zimanê kurdî ne, her weha kitêbên bi zimanê cuda cuda yê wekî qazaxî, rûsî, tirkî, azerî, ermenî, farisî, erebî, inglîzî û yê din in jî ku di warê hînbûna zimanan da dewlemend in.

Di vê xebata me ya diwar da, kitêbên bi dewlemendîya folklor, edebîyat û diroka kurdan ve mişt, alîkariya mezin da me. Me di vê kitêba hînbûna zimanê kurdî da, mêtoda xwendin, serwextbûn û cawdana mesele, metelok, têderxistinok, zûgotinok, gilîyên kal û bavan, meseleyên civatê, çîrok, parçeyên xwendina edebiyata klasîk û nûjen kirin bingeh. Ji bo ku zarokên me bikarin bi zimanê dayikê wan binasin, me cih da berhemên edebîyata cîhanî yê curbicur jî.

Em gelekî şad in ku îro zarokên me dê bikarin dersên zimanê dayikê di dibistanan da bixwînin û xwedî li dîrok, edebîyat û zargotina xwe ya dewlemend derkevin û di nava civatên din da pê serbilind bin. Çawa ku Cegerxwînê helbestvanê zimanê kurdî yê nemir temîyê dike û dibêje: Bixwîne zimanan gelek kûr û dûr Zimanê te xweş tûj dibe rengê şûr. Ji vê kitêbê, ne ku bi tene zarok, lê her weha ew kesên ku dixwazin zimanê kurdî hîn bibin jî dikarin feydeyeka baş bistînin. Kitêb bi navê “Zimanê kurdî” (ji bo polên/dersxaneyên 2-5an) tê binavkirin. Ev destpêk e ji bo hînbûna zimanê dayikê. Kitêba duyem ji bo polên 6-9an hatiye nivîsîn. Di vê kitêbê da pîrsa hînbûn û zanebûna ziman, edebiyat û çanda kurdî bi her alîyî ve û bi kûrayî tê dan. Di amadekirin û çapkirina vê kitêbê da, mamoste û zanyarên me yê hêja yê mîna akademîk Nadîrê Kerem, Necmedînê Ehmed, profêsor Hesenê Evdoyê Elî, Mihemedê Silêmîn, û yê din bi fikir û nêrînên xwe yê giranbiha alîkariya mezin daye me. Ev tiştekî eşkere ye ku tu kar bê kêmasî nabe. Her çend me cehd kiriye ku em kêmasî û qisûran kêmbikin jî divê bê zanîn ku mirov nikare bi temamî xwe ji wan safî bike. Loma em dê di pêş da spasîya xwe pêşkêşî wan mamosteyên qedirbilind, pîşekzan û xwendekarên ezîz bikin ku ew dê bi fikir, nêrîn, peşdanîn û rexneyên xwe yê hêja alîkariyeka mezin bigihin û vê kitêbê.

**Kinyazê Îbrahîm
Gulan 2021
Almatî - Qazaxistan**

Hîmma Komara Qazaxistanê ye Dewletê



Қазақстан республикасы мемлекеттік әнұраны

Сөзін жазғандар: Жүмекен Нәжімүденов, Нұрсұлтан Назарбаев
Музыкасын жазға: Шәлші Қалдаяқов

*Алтын күн аспаны,
Алтын дән даласы,
Ерліктің дастаны,
Еліме қарашы!
Ежелден ер деген,
Даңқымыз шықты ғой.
Намысын бермеген,
Қазағым мықты ғой!*

Қайырмасы:

*Менің елім, менің елім,
Тұлғ болып егілемін,
Жырың болып төгілемін, елім!
Туған жерім менің – Қазақстаным!*

*Ұрпаққа жол атқан,
Кең байтақ жерім бар.
Бірлігі жарасқан,
Тәуелсіз елім бар.
Қарсы алған уақытты,
Мәңгілік досындай,
Біздің ел бақытты,
Біздің ел осындай!*

Қайырмасы:

*Менің елім, менің елім,
Тұлғ болып егілемін,
Жырың болып төгілемін, елім!
Туған жерім менің – Қазақстаным!*



*Yekemîn Serokkomarê Komara Qazaxistanê Rêberê Netewe
ye Nûrsultan Nazarbayêv*

*Қазақстан Республикасының Тұңғыш Президенті – Елбасы
Нұрсұлтан Әбішұлы Назарбаев*

Alfabeya Kurdî

Ji desteyeka nîşanen grafîkî ra, ango ji desteyeka tîpanra alfabe tê gotin.

Tîp (herf) jî di nivîsînê da nîşanên grafîkî ne ku bergindên dengan in. Ango di zimanê axaftinê da deng hene û di zimanê nivîsînê da jî tîphene.

Di zimanê kurdî da 31 tîp hene. Ev 31 tîp **alfabeya kurdî** pêk tînin.

Divê em rêza tîpan hîn bibin û ji ber bikin bê ew çawa li dû hev rêz dibin. Lewra tîp li gor rêza xwe di alfabeyê da cî digirin.

Niha jî em hînî tîpên zimanê kurdî bibin.

Nivîsandina girdekan (tîpên gir)

A B C Ç D E Ê F G H Î J K L M N O P Q R S Ş T U û V W X Y Z

Nivîsandina hûrdekan (tîpên hûr)

a b c ç d e ê f g h i î j k l m n o p q r s ş t u û v w x y z

Destnivîsara tîpan

a b c ç d e ê f g h i î j k l m n o p q r s ş t u û v w x y z

Spartek:

Van tîpan di deftera xwe da binivîsin û bi dorê ezber bikin. Destnivîsara tîpan paqij binivîsin.

ABC



Aa	Av ala	Nn	Nan nal
Bb	Bav bar	O	Por sol
Cc	Car ceh	Pp	Pel pap
Çç	Çav çar	Qq	Qame qalûç
Dd	Dar dev	Rr	Req roj
Ee	Ez em	Ss	Sêl sîr
Êê	Êl êvar	Şş	Şîr şêr
Ff	Feq fîşek	Tt	Tû tar
Gg	Ga gul	Uu	Gund kund
Hh	Hêk heft	Ûû	Gund kund
Îi	Rim bira	Vv	Vîrus votka
Îî	Încîl îsot	Ww	War welat
Jj	Jûjî jajî	Xx	Xal xar
Kk	Ker kûsî	Yy	Yek yazdeh
Ll	Lep ling	Zz	Zar ziman
Mm	Mar masî		

NIVÎSÎNA TÎPAN

A
a



Ala

Tîpên jêrîn bixwînin û navên nîşanên wan ên grafîkî di defterên xwe da binivîsin.

B
b



Baran

C
c



Cil

Ç
ç



Çivîk

D
d



Dar

E
e




Eynik (neynik)

Ê
ê



Êzing (ardû)

F
f



Firinde

G
g



Gul

H
h



Hesp

î
î



Şekîr

Î
î



Îsot

J
j



Jûjî

K
k



Kewrişk

Q
q








Quling

L
l



Legleg



Hevokên jêrîn bixwînin û binê tîpên sorkirî xêz bikin.



A – **Agir** nîşana Newrozê ye.
Ava kanîyên Kurdistanê sar e.



B – **Beran** di nava pêz da ye.
Berf dibare.
Berx dikale.



C – **Cemîle** doktor e.
Canê diçe dibistanê.



Ç – **Çîyayê** Alataûyê pir bilind e.



D – **Dibistan** nezîkî mala me ye.
Dar şîn e.



E – **Esmer** li cem dayika xwe ye.
Esker şaîr e.



Ê – **Êrîş** lawê kurdan e.
Êl maka merivan e.



F – Fîl pozdirêj e.
Ferzende li hespê siwar bûye.



G – Gizêr şîrîn e.
Gulnaz gulan bêhn dike.



H – Hirç heywaneka zaf mezin e.
Hesp hogirê mirovan e.



Î – Çivîka me bedew û rindik e.



Î - Îro sala teze ye.
Îslam li hespê siwar bûye.



J – Jûjî ji maran hez nake.



K – Kevçî û çengal li rex hev in.
Kûçik dicemide.



L – Lampe malê rohnê dike.
Leylê kulîlka Kurdistanê ye.



M – Mişk pênîr dixwe.



N – Name ji birayê min hat.
Nan li ser sêlê ye.



O – Otobûs diçe.
Oda me mezin e.



P – Pisîk dijminê mişkan e.
Pire bilinde.



Q – Quling sekinîye.
Qelem ji bo nivîsarê ye.



R – Rûvîyê fêlbaz xapînok e.
Rengîn keça kurdan e.



S – Sêvên Almatîyê gelekî bi
tehm in.
Sol lingê min diêşîne.



Ş – Şêr hakimê daristanê ye.
Şemê dayika Berfînê ye.



T – **Televîzyon** nîşan nade. **Teşt** tijî ar e.



U – **Utî** germ e.
Ulumdarên kurdan ronahîya gel in.



Û - **Ûrfa** bajarê kurdan e.



V – **Av** heyat e.
Vizik di destê min da ye.



W – **Werdek** di nava golê da ne.
Welat şîrîn e.



X – **Xezal** heywaneka pir bedew e.



Y – Keçên **yûnanî** kincên dawetê li xwe kirine.



Z – **Zebeşên** Kapçêgayê gelek mezin û şîrîn in.
Stûyê **zurafeyê** dirêj e.

Ji van tîpan bêjeyan çêbikin.



dra



êşr



îsr



vça



îred



eşş



rke



phse



sted



hgu



lid



smta



çrih



ndgu



lma



vba



irab



rjaab



khê



ayç



Ji van tîpan bêjeyan çêbikin.

xreb

nbare

nzibi

êlçek

çkûki

spkîi

rwedek

şkmi

fedrte

rpiûkt

efnel

east

xzeal

îsma

êrnî

şzebe



Bêjeyên ji sê kêteyan pêk tên (bêjeyên sêkîteyî)

Hin bêje hene ku ji sê kêteyan pêk tên. Em ji wan ra dibêjin bêjeyên sêkîteyî.

Nimûne:

ba-we-rî	→	bawerî
ger-ma-yî	→	germayî
tay-be-tî	→	Taybetî

Bêjeyên ji sê kêteyan pêk tên (bêjeyên çarkîteyî)

Hin bêje hene ku ji çar kêteyan pêk tên. Em ji wan ra dibêjin bêjeyên çarkîteyî.

Nimûne:

dew-le-men-dî	→	bawerî
ser-pê-ha-tî	→	germayî
niş-ti-man-î	→	niştimanî



Kîte

Kîte ew dîyardeyên zimanî ne ku bi carekê jidevên mirovan derdikevin.

Dendika kîteyan dengdêr in, ango a, e, ê, i, î, o, u, û.

Loma di her kîteyeka kurdîya kurmancî da dengdêrek heye.

Kîte beşên bêjeyan in. Bêje ji kîteyan pêk tên.

Bêjeyên ji yek kîteyan pêk tên (bêjeyên yekkîteyî)

Hin bêje hene ku bi tenê ji kîteyekê pêk tên. Em ji wan ra dibêjin bêjeyên yekkîteyî.

Nimûne:

av, bar, car, çar, dar, ez, êl, fen, ga, hin, jar, lal, mar, nan, ol, par, sar, şêr, tû, ûr, vîn, war, xal, yek, zar

Bêjeyên ji du kîteyan pêk tên (bêjeyên dukîteyî)


Hin bêje hene ku ji du kîteyan pêk tên. Em ji wan ra dibêjin bêjeyên dukîteyî.

Nimûne:



de-rî	→	derî
a-gir	→	agir
ze-beş	→	zebeş



Navên fêkîyên jêrîn binivîsin.



Navên heywanên jêrîn binivîsin.



Navên van tiştên jêrîn binivîsin.



Ev çi ye?

.....
.....



Ev çi ye?

.....
.....




Ev çi ye?

.....
.....



Ev çi ye?

.....
.....




Ev çi ye?

.....
.....

Di hefteyekê da heft roj hene

1. Duşem
2. Sêşem
3. Çarşem
4. Pêncşem
5. Înî
6. Şemî
7. Yekşem



Rojên bihurî
Duh, pêr, betirpêr

Îro

Rojên hatî
Sibe, dusibe, sêsibe

Nimûne:

Îro roja biharê ya pêşî ye.

Duh ez çûm dibistanê.

Sibê em ê herin Cambûlê..

Pêr tu ji Astanayê hatî? Ez ê pêncşemê bêm malê

Betirpêr ez li malê bûm. Ez duşemê çûm Çîmkendê.

Roja hatî dora min e.

Dibistana me


Dibistan pir xweşik e,
Bi hogir û hevalan.
Bi nivîs û mamoste,
Bi çîrokê kal û bavan.
Em hemû jê hez dikin,
Ji bo zanîn kanî ye.
Tê da kenîn, leyîstok,
Dibistan xweş xanî ye



Spartek

Di heqê dibistana xwe hûn jî bipeyivin.

NAVÊN RENGAN



Spî Reş Şîn Kesk Zer Qehweyî Sor Gulê

- Ev kîjan reng e?
- Ev reng **kesk** e.
- Rengên daran çawan in?
- Rengên daran **hêşîn** in?
- Medîne, ev reng çi ye?
- Ew reng **reş** e.
- Hespa we çi reng e?
- Rengê hespa me **qehweyî** ye.
- Ezman çi reng e?
- Ezman **şîn** e.
- Ka bi rengê sor tiştekî bibêje.
- Xwîna merivan **sor** e.
- Rengê tavê çawan e?
- Rengê tavê **zer** e.
- Eferim ji we ra.

- Bavê min ji min ra şaleke **sipî** kiri.
- Kumê birayê min **reş** e.
- Ala kurdî **kesk, sor, zer û sipî** ye.
- Birayê min xortekî dêm **qemer** e.
- Rengê minarê **hêşîn û belek** e.



Pişti baranê, li rûyê asîmanê me di şikilê heyva nû da, nîvgulovereka rengin dertê. Bi kurdî ji wê ra keskesor dibêjin. Ew tîrêjên tavê ne. Tîrêjên tavê ji heft (7) rengan pêk tên. Dema tîrêjên tavê li hewayê, di nava dilopên avê ra derbas dibin, dişikên. Wê gavê her heft reng jî tên dîtin.

Gava keskesor derdikeve, zarok bi hev ra distirên:

**Were, were keskesor
Bilind ve ezmanê jor
Keskesorê bibînim
Mişk û mara nebînim**

Spartek

1. Çend hevokan di defterên xwe da binivîsin û navên rengan bidin kivşê.
2. Hûn keskesorê kengî dikarin bibînin?

Dilber û Qenco



Dilber jineka pir jêhatî bû. Navê mêrê wê Qenco bû. Du zarokên wan hebûn. Kûçikekî wan jî hebû. Mala wan li gundekî Cizîrê bû. Zarokên wan her tim ji malê derdiketin û bi hevalên xwe ra dilîztin. Carinan cîran dihatin û gazindên xwe dikirin .

Cîranan digot:

- Zarok ketine baxçeyên me.

Wê gavê Dilber û Qenco pir aciz dibûn û ew temî dikirin.

Digotin:

- Ji xwe ra bilîzin. Lê ji bo xatîrê Xwedayî, bila cîran gazindan ji we nekin.

Gava cîranan dengê wan dibihîst, îcar li ber dilê wan digerîyan û digotin:

- Zarokên, cîranên delal! Ma qey me zarok nedîtine...

Pexşana jorîn gelek caran bixwîne û bersivên pirsên jêrîn bidin.

Ji van 7 hevokên jêr 4 rast in, 3 şaş in. Baş bifikire û hevokên rast nîşan bike!

1. Dilber jinebî ye.
2. Navê mêrê wê Qenco ye.
3. Pênc zarokên Dilberê hene.
4. Wan zarokên xwe temî dikirin.
5. Zarokên wan her tim li malê bûn.
6. Cîranan gazind dikirin.
7. Mala wan li gundekî Cizîrê bû

DEMSALÊN SALÊ


Di salekê da 12 meh, 4 demsal, 52 hefte, 365 roj hene.
Her demsalek sê meh in. Demsalên salê ev in:

- 1- Bi-har
- 2- Ha-vîn
- 3- Pa-yîz
- 4- Zi-vis-tan

1	Bihar
2	Havîn
3	Payîz
4	Zivistan



Havîn



Zivistan





Yek û yek

Yek û yek
Teyrê belek

Zaza bilbil
Dermanê dil

Şerq û şima
li ber çema
Çem miciqî
av tê nema

Ez kuncî
Tu kuncî
Li ser textikê firincî
Ez firîyam
Tu ma li cî

Yek û yek (Guherteyeka din)

Yek û yek,
Çûçika belek.
Gul û bilbil,
Dermanê dil.


Şekir û şima,
Li ber çema.
Çem çikçikî,
Av tê nema...

Yekanekê

Yekanekê
Dibistanekê
Zîzanekê
Gula çepo

Çep hilmijo
Xana gujo
Gul hine ye
Bîst pere ye
Bîst a te ye

HÊLÊN SEREKE



Çar hêlên sereke hene:

- ☐ Bakûr
- ☐ Başûr
- ☐ Rojhilat
- ☐ Rojava



HÊLÊN SEREKE Û YÊN NESEREKE LI GEL HEV



Çar hêlên nesereke hene:

- ☐ Bakûrê rojhilatî
- ☐ Başûrê rojhilatî
- ☐ Bakûrê rojavayî
- ☐ Başûrê rojavayî

Çar hêlên nesereke bi vî awayî jî dibin:

- ☐ Bakûrrojhilat
- ☐ Başûrrojhilat
- ☐ Bakûrrojava
- ☐ Başûrrojava



BIHAR

Bihar demsala yekem e, demsaleka pir xweş e. Destpêka biharê û dawîya zivistanê ye. Dawîya serma û seqemê ye. Êdî berf nabare, cîyê xwe ji baranê ra dihêle. Berfa ku ji zivistanê da li serê çîyayan maye, hêdî hêdî dihele û tevî çem û robaran dibe. Hewa hêdî hêdî germ dibe. Herkes cilên xwe yên qalind hiltînin û cilên xwe yên biharê li xwe dikin.

Di demsala biharê da deşt, zozan, çîya, her der bi gul û gîya û şînahîyê va dixemilin. Darên ku di payizê da pelên xwe weşandine, ji nû va dixemilin, pel û bergên wan ji nû va vedibin, kuîlkan vedikin. Mirov dikare bibêje ku bihar xemila dinyayê ya herî xweş e û rewşa wê ya herî geş e.

Bihar demsala bi xêr û ber e. Zevîyên ku zivistan û payizê hatine ajotin û çandin, tev zîl didin. Ceh, genim, nok û nîsk û gelek şînahî zîl didin, bi qasî bihustekê bi ser erdê dikevin. Li hin deveran cotkar diçin cotên xwe yên biharê dikin.

Êdî pez û ajalên gundan di gom û axuran da êm û alif naxwin. Ji bo çêrê derdikevin çolê, ji ber ku biharê gîya û çêrê jî pir dibe. Biharê berx û karikên nûzayî bi kêf û eşq didin lotikan, dilîzin û li pey makên xwe diçin, şîrê di guhanên makên xwe da dimijin.

Hemî ajal û kurm û kêzikên ku ji zivistanê da ketine hêlîn û lanên xwe, hişyar dibin û jê derdikevin. Çivîk li ser gulîyên daran vedinîşin û bi çîkeçîkan dixwînin û mizgînîya hatina biharê didin.

BERSIVÊN VAN PIRSAN BINIVÎSIN.

- 1- Destpêka biharê dawîya kîjan demsalê ye?
- 2- Biharê êdî berf nabare. Di dewsa berfê de çi dibare?
- 3- Biharê berfa li serê çîyayan çi dibe?
- 4- Biharê dinya sartir dibe yan germtir dibe?
- 5- Biharê em cil û bergên xwe yên qalind çi dikin?
- 6- Di demsala beharê da, deşt, zozan, çiya çi dibin?
- 7- Darên ku payizê pelên xwe weşandine, çi dibin?
- 8- Zevîyên ku zivistan û payizê hatine ajotin çi dibin?
- 9- Pez û ajelên gundan biharê çi dikin?
- 10- Biharê berx û karikên nûzayî çi dikin?
- 11- Ajel û kêzikên ku zivistanê raketine biharê çi dikin?
- 12- Çivîk çawan mizgînîya hatina biharê didin?
- 13- Tu jî dikarî pênc hevokan li ser biharê binivîsî?

Kilamên zarokan

*Zarok bi destên hev digirin û
bî hev ra distirên:*

Ha Gulê...

De werin, em gulan biçînin,
Ha gulê, ha gulê, gula min,
Xweş bîhnê jê hilînin,
Cengê, şoxê, ruhê min.

Cot zerî avê tînin,
Ha gulê, ha gulê, gula min,
Agirê dila direşînin,
Ha gulê, ha gulê, gula min.

Lo dilo...

Em ê îşev li ku bin,
Lo dilo, dilo, lo dilo,
Em ê îşev li ku bin,
Sefîlo dilo, sorgulo?

Ha li ser pira Qersêbin
Lo dilo, dilo, lo dilo,
Ha li ser pira Qersêbin
Sêfîlo dilo, sorgulo.



Gilîyên xweşik

- *Helalî û dilê paqij, balgîyê herî
rehet e.*

- *Ê zane karê xwe dike, ê ku nizane
qelfan dike.*

- *Çaxê pisîk diçe, mişk dibe axê
kulînê.*

- *Belengazî, kasivî ar nîne, tembelî,
şermê tîne.*

Sala Teze

Namet naz e,
Fincan kase,
Wê hat, wê hat,
Sala teze.

Xemil nexş e,
Şabûn xweş e,
Wê hat, wê hat,
Sala teze.

Miraz xweş e,
Bi hub rez e,
Wê hat, wê hat,
Sala teze.

Ew bi lez e,
Tê dibeze,
Bimbarek kin,
Sala teze!

Çerkezê Reş





DERSDARÊ MIN

Dersdarê min, zanyarê min,
Sermîyan û rêberê min,
Te ez dame xwendinê da,
Bigrim rîya rast dinê da.

Mijûl bûyî, min ra bi dil,
Te daye min, hiş û aqil,
Te'lîm, tore, terbîye kirim,
Berbi civaka rast birim.

Wê rêyê da min gul veda,
Roj bi roj ez çûme pêş da,
Têda min da, zar û ziman,
Bûyî min ra hekîm - loxman.

Bi hurmetî, bi sîyanetî,
Bi nav-dengî, me'rîfetî,
Dê û bav te dibin amin,
Zarokan ra dibî zamin.

Emekê te, ez bîr nakim,
Her tim ez ê dil te şakim,
Sujde dikim, ez li pêş te,
Ku bilind kim nav-dengê te!

Hesenê Hecîsilêman

Pirs

Şaîr di vê helbestê da emekê dersdarê xwe çawa bi qîmet dike?



KURDÊN QIRGIZISTANÊ

Qirgizistan welatekî Asya Navîn e. Ew di nava çîyayan da bi cî û war bûye. Gola Îssîk-kûlê bedewîyeka cûda dide wê. Qirgizistan di sala 1991ê bûye dewleteka serbixwe. Serbajarê wê Bîşkêk e. Kurd ji 1937an û vir da ye ku li vî welatî dijîn. Kurdên vê derê ji alyê rêjîma Stalîn ve ji Erîmenîstan, Gurcistan û Azerbaycanê hatine sirgûnkirin. Îro ji bîst hezarî zedetir kurd tevî gelên qirgiz, rûs, qazax, ozbek, tirk, ûyxûr, azerî û yên mayîn bi hev ra dijîn.

Gelek kurdên me li komarê xwendine û bûne dersdêr, doktor, mi-hendis, rojnamevan û hwd.

Li Qirgizistanê Navenda Çanda Kurdan «Mîdîya» heye. Bi zimanê kurdî weşanên radyoyan hene. Cîyê ku kurd pir lê dijîn, ji bo zarokên wan dersa zimanê dayikê jî lê heye. Zaravayê wan kurmancî ye. Kurdên Qirgizistanê hetanî îro jî zimanê dayikê hîndibin, wusa jî ziman, urf, a'det, rabûn-rûniştina xwe ya miletîyê parastine.

Spartek

- 1-Di heqê Qirgizistanê da hûn çî fêr bûn, qise bikin.
- 2-Ji nivîsara jorîn pênc hevokên girîng ên li ser vî welatî binivîsin.

Destpêk bi navê
Yezdan,
ev e diçim dibistan.

Divê êdî bixwînim,
bo rastiyê bibînim.

Da her tiştî bizanîm,
heya ku pê bikanîm.

Berî vêya gelê min,
nezan mabûn mêr û
jin.

Daketibûn hêla jêr,
reben pepûk û bêkêr.

Lê ji îro bi şûn da,
di nav bajar û gunda,

Dibistan



Osman sebrî

1905-1993

Herçî kurd e wê
bixwîn,
da ku bibe xweyî şîn.

Welatê xwe bistîne,
neyaran jê derîne.

Em in xweyî war û
şûn,
doza me ye
serxwebûn.

Ji bo me ye hêla jor,
hildin ala kesk û sor.

Serxwe nabe
Kurdistan,
bê xwendin û
dibistan.

Gundê me

Can gundê me, gundê me,
Tune tayê gundê me,
Nava hezar gunda da,
Dîsa tenê gundê me.
Kanîya zelal ortê da,
Meşe-çayîr rex wî da,
Her malekê, her gava,
Ken û kilam e, ser lêva.
Can gundê me, gundê me,
Tune tayê gundê me,
Qalçîcek ku radibe,
Wexta teze vedibe,
Ew jî xwezila xwe tîne,
Xeml û rewşa gundê me.



Simoê Semo

1928-2000

NAVÊN MEHAN

*Di salekê da 12 meh hene. Hin meh 30 roj in, hin jî 31 roj in.
Le meha sibatê 28 roj e, ji çar sala carekê jî dibe 29 roj.*

1	Çileyê paşîn
2	Sibat
3	Adar
4	Nîsan
5	Gulan
6	Hezîran
7	Tîrmeh
8	Tebax
9	Îlon
10	Çirîya pêşîn
11	Çirîya paşîn
12	Çileyê pêşîn



Spartek

1 - Newroz di kîjan mehê da ye?

2 - Niha em di kîjan demsalê û mehê da ne?

3 - Kîjan meh 30, kîjan 31 roj in? Di deftera xwe da binivîse.

4 - Navên mehan di deftera xwe da binivîse û ezber bike.

NAVDÊR (îsim)

Navdêr çi ye?

Navdêr ku ew cureyên bêjeyan in, ango ji wan beşên axaftinê ne ku navên kes, heywan, nebat, tişt, made, rewş, hest, çalakî, cejn, rojên pîrozkirinê, kom, cih, hêl, hindav, dîyardeyên xwezayî û hwd dîyar dîkin.

Nimûne:

Remezan (navê kesekî ye)
Berfîn (Navê kesekê ye)
Almatî (Navê deverekê ye)

Nimûne:

kulîlk (navê nebatekê ye)
baran (Navê dîyardeyeka xwezayî ye)
Mehîn (Navê ajelekê ye)

❖ Navdêrên şênber (konkret)

Ew cureyên navdêran in ku mirov dikare wan bibîne, ango dîtbar in.

Navên mirov, ajal, tişt, dever û hwd navdêrên dîtbar in.

Nimûne: zarok, bira, xwişk, Berfîn, Remezan, dar, gul, bizin, hesp, Mêrdîn, Dîyarbekir, baran, zîpik, gore, dev, por, rojname û hwd.

❖ Navdêrên razber (abstrakt)

Ew cureyên navdêran in ku mirov nikare wan bibîne, ango nedîtbar in.

Nimûne: biratî, xweşî, qencî, evîn, xem, biserketin, his, bawerî, fikir û hwd.

DIVÊ EM BÎZANÎN

Navên bajar, welat, navçe (qeza-nehîye), kes, çîya, beh, okyanûs, gol, çem û deştan bi girdekan (tîpên gir) tên nivîsîn.

Nimûne:

Serbajarê **Q**azaxistanê **A**stana ye. **P**arlamentoya **K**urdistanê li **H**ewlêrê ye.
Çîyayê **A**latoê bilind e. Gola **B**alxaşê li **Q**azaxistanê ye.
Çemê **D**îcleyê di ber **D**îyarbekirê ra derbas dibe. **K**urdistan welatê kurdan e.
Moskova serbajarê **R**ûsyayê ye. Ez li bajarê **Ç**îmkendê dijîm.

DERSA ZÎMANÊ KURDÎ

Dersdar: Dem baş!

Xwendekar: Dem baş mamoste!

Dersdar: Hûn çawan in zarokno?

Xwendekar: Gelek spas, em baş in.

Dersdar: Fermo rûnin, em dest bi dersê bikin. Kî dikare bibêje, bê dersa me ya bihurî çi bû?

Xwendekar: Dersa me ya bihurî **navdêr** bû.

Dersdar: Azad, ka were behsa navdêran bike.

Azad: Navdêr ev in: mal, kevir, Kemal, gund, pez, zebeş, sêv, dar û yên mayîn.

Dersdar: Tu dikarî çend navdêrên *şênber* û *razber* bibêjî?

Azad: Êrê mamoste; bûk, dar, gul, çîya, defter, baran û hwd navdêrên *şênber* in û xweşî, fikir, bawerî, biratî, evîn û hwd navdêrên *razber* in.

Dersdar: Aferim Azad, kerem bike, runê. Kesekî din heye ku bixwaze li ser navdêran xeber bide?

Dildar, Hisên, Sozdar, Nazê destên xwe bilind kirin.

Di hevokên jêrîn da navdêrên *şênber* û *razber* hilibijbêrin û binê wan xêz bikin.

Rindê keçeka porzer e. Gulê keçeka bejinbilind e.

Di destê Rindê da qelem hene. Biratî pir xweş e.

Evîna Berfîn û Alan qedîya. Ez îro çûm parkê.

Di destê te da çend sêv hene? Tu li parkê li hêlekanê siwar dibî?

Spartek

1-Em çawa dizanin ku kitêb, qelem, defter navdêrên *şênber* (konkret) in?

2-Çend navdêrên *şênber* di defterên xwe da binivîsin.



- Têmir** : Roj baş Fatê!
Fatê : Roj baş Têmir!
Têmir : Tu dizanî ku ez îro dikevim şanzdeh salîya xwe?
Fatê : Yanî îro, rojbûna te ye?
Têmir : Belê, ez gelek mijûl im, hazirîya xwe dikim. Em ê êvarê pîroz bikin, ez dixwazim tu jî werî.
Fatê : Ez gelek şa me, ez ê berê ji dayika xwe ra bibêjim û paşê ez ê bêm.
Têmir : Tu werî, ha! Tu neyê ez ê bixeyidim..
Fatê : Nexeyide, ez ê bêm.
Temir : Ez li hêvîya te me.

DESGIRTÎYA XORTAN

Nalînek tê guhên min,
 Lê winda û nihan e.
 Agir berda dilê min,
 Tev bû pêt û dixan e.
 Barek da ser milê min,
 Lê barekî giran e.
 Dane ser hev kulê min,
 Hemî derd û bela ne.

Dengê kê ye dinalî?
 Nalenala welat e.
 Dike gazi, dikalî,
 Rabin çaxê xebat e.
 Kurmanc, zaza, celalî
 Tev de çêkin tifaqê.
 Kes xwe medin vî alî
 Îro roja welat e.

Cegerxwîn



Li baxçeyê kulîlkan

Navê min Êvêlîna ye. Ez ji kulîlkan pir hez dikim. Îro ez ji xewê zû rabûm. Çawa ku dayika min gotibû, sibê zû rabe, em ê kulîlkan av bidin, loma jî ez sibê zû rabûm û min taştê kir. Paşê ez tevî dayika xwe derketim nava baxçe yê li ber malê û me tevî hev kulîlk avdan. Dayika min yeko yeko axa ber kulîlkan teze kir. Piştî ku kulîlkan av vexwar rengê wan hêşîn bûn, vebûn, em jî şa bûn. Kulîlk bi me ra dikenîyan. Dayika min dibêje, ev baxçê Êvêlînayê ye. Keça min jî wekî van gulan bedew e. Ez jî carinan diçim gulan baq dikim, ji dayika xwe ra tînim. Dayika min dibêje: "Tu kulîlka nava baxçe yî, rûnê li bal min, divê tu dûr neçî."

Spartek

Bersiva van pirsan binivîse.

- 1- Êvêlîna ji çi pir hez dike?
- 2- Êvêlîna çima zû rabû?
- 3- Dayika Êvêlînayê êvarê çi gotibûyê?
- 4- Êvêlîna sibê zû rabû çi kir?
- 5- Êvêlîna tevî dayika xwe derkete kî derê?
- 6- Piştî avdanê, kulîlk çawa bûn?

Êvêlîna ji kulîlkan pir hez dike.

.....

.....

.....

.....

.....

.....

TELEVÎZYON Û ŞANOYA KURDÎ



- Evdile: - Keça min, rabe televîzyonê bitemirîne, dereng e.
- Eyşê: - Bavo, min li şanoyeka kurdî temaşe kir, bila ya din jî biqede, ez ê bitemirînim.
- Evdile: - Keça min, şano hetanî saetekê jî xelas nabe.
- Gulê: - Eyşo, ka te dersên xwe xwendine?
- Eyşê: - Dayê, ecele nîn e, e zê paşê bixwînim.
- Arif: - De hiş bin, em li şanoyê temaşe dikin, ji dengê we min qet tiştek fêhm nekir.
- Evdile: - Kurê min, Arif wexta razana te hatiye. Ev çi hal e, tu hetanî nîvê şevê li şanoyê temaşe dikî.
- Arif: - Ez çi bikim bavo, xewa min nayê.
- Gulê: - Lê çima wexta tu dersê dixwîni xewa te zû tê?
- Evdile: - Zûka televîzyonê bitemirîne! Keça min rabe dersa xwe bixwîne, Arif, divê tu jî rast herî têkevî cîyê xwe.
- Eyşê: - Lê bavo, ev şanoyeka pir xweş e...
- Evdile: - Keça min, ev ne saeta şanoyê ye, lazim e tu niha li ser dersên xwe bî û divê birayê te jî di nava cîyan da be. Ez çi dibêjim, wî bikin! Arif, ka ji dêya xwe ra bibêje şev baş!
- Arif : - Şev baş, dayê!
- Gulê: - Şev baş, kurê min!
- Eyşê: - Şev baş!
- Evdile: - Şev baş, keça min, divê tu dersên xwe baş bixwîni.

TELEVÎZYON Û ŞANOYA KURDÎ

Di kurdî da zayenda her navdêrê heye. Hin navdêr mê ne, hin navdêr jî nêr in. Em ji navdêrên **mê** ra dibêjin **zayendmê** û ji navdêrên **nêr** ra jî dibêjin **zayendnêr**.

Hin navdêrên zayendnêr:

Mêr, kur, xort, bav, bira, xal, ap, kurxal, kurap, zava, pismam, beran, nêrî, dîk, şêr, ga, gur, gund, bajar, kevçî, derî, dîwar, heş, ling, dest, çav, guh.

mêrê qenc	kurê pak	bavê min	birayê te	derîyê malê	gayê reş
-----------	----------	----------	-----------	-------------	----------

Hin navdêrên zayendmê:

Jin, keç, bûk, met, dayîk, gul, nogin, çêlek, mî, bizin, mirîşk, pişt, bîhn, xwarin, beroş, bîr, sêv, mizgeft, tilî, enî, gotin,

jina bedew	dayika min	bizina kol	enîya te	gula sor	gotina wî
------------	------------	------------	----------	----------	-----------

DIVÊ EM BÎZANIN

Navdêrên zayendnêr gireya <ê>yê digirin, navdêrên zayendmê jî gireya <a> yê digirin. Ev yek dema di hevokê da tê şixulandinê, dîyar dibe.

Hinek navêr hene hem zayendnêr hem zayendmê ne;

mamostey a wan	heval a te	doktor a min	gundîy a me
mamosteyê wan	hevalê te	doktorê min	gundîyê me
serok a jêhatî	jêhatîy a malê	mezina me	wezîr a kar
serokê jêhatî	jêhatîyê malê	mezinê me	wezîrê kar

Navdêrên zayendmê yên pirhejmar gireya <ên>ê digirin.

Nimûne:

Jin ên bedew	bizin ên kol	Qelem ên reş	gul ên sor	gotin ên xweş
---------------------	---------------------	---------------------	-------------------	----------------------

BINÊ ZAYENDNÊRAN XÊZ BIKE

Pir hindik li nav beyaran meşî,
Rastî wî hat birakê rûvî.
Li halê wî nihêrî û berda keser,
Got: Vê sala xerab ku da herî ker.
Li wî pir zor hat, wexta jêra got ker,
Got kerê kurtanzer, sinîk ceh li ber.

Hinek din meşîn gelî û kendal,
Beran û dîk jî wan ra bûn heval.
Hinek din meşîn bintara çîya,
Kewrişkê bejî wan ra gîya.
Teva xwe kir yek bi soz û gilî,
Dîk û kewrişk, beran û rûvî.

Binê zayendmêyan xêz bike.

Hebû pîrek bejinkin,
Diran ferş bû nola cin.
Kofî li ser serê wê,
Pêşmala nan li ber wê.
Hevîr tevda kir girêk,
Gilover kir mîna hêk.

Rast kir li binê teştê,
Êzing anîn ji deştê.
Avêt hundirê tendûr,
Agir lê nebû ilûr.
Çûkê beytik firî hat,
Li wê pîre mabû mat.

Cegerxwîn

ZİMANÊ KURDÎ

Bi xemil, rewş e,
Şîrîn û xweş e,
Zimanê kurdî.

Qezel, helbest e,
Şemdana dest e,
Zimanê kurdî.

Bi nexş awaz e,
Letîf û naz e,
Zimanê kurdî.

Beyta Feqî ye,
Sewta Xanî ye,
Zimanê kurdî.


Gewgewê çîya ye,
Kubara teyra ye,
Zimanê kurdî.

Şikoyê Hesên




Spartek

Helbesta «Zimanê kurdî» di defterên xwe da binivîsin û ezber bikin.


Ji heywanên jêrîn kîjan zayendmê ne?




	Nêrî
X	Çêlek
	Hesp Hespê nêr
	Mirîşk
	Dîk
	Beran
	Beraz
	Mehîn




Ji heywanên jêrîn kîjan zayendnêr in?



	Golik
	Mî
X	Gur
	Hirç
	Ga
	Dêlegur




Di malikên jêrîn da kîjan **yekhejmar** in? Kivş bikin!



()	()	()	()
zîlamên kurd	jinên kurd	zarokê bîaqil	keçika delal

Di malikên jêrîn da kîjan **pirhejmar** in? Kivş bikin!



()	()	()	()
helbestvanê me	jina kinspî	zarokên bedew	Keçikên xweşik

Spartek

Rewşên yekhejmar û pirhejmar di defterên xwe da binivîsin û di nava hevokan da bidin kivşê.

21ê Sibatê Roja Zimanê Zikmakî (Zimanê Dayikê)



Bengladeş berî 1971ê di bin destê Pakistanê da bû. Wê demê li Bengladeşê zimanê fermî zimanê ûrdû bû. Zimanê Bengladeşê, ango bengalî qedexa bû.

Di 21ê Sibata 1952yan da xwendekarên bengladeşî ji bo zimanê xwe xwepêşandanek amade kir. Polîsên pakistanî bi awayekî pir dijwar êrişî xwendekaran kir. Yazdeh (11) xwendekarên bengladeşî hatin kuştin.

Di 1956an da Pakîstan neçar ma ku zimanê bengalî bipejirîne. Bangladeş jî paşê di 1971ê da ji Pakîstanê veqetiya û bû dewleteka serbixwe.

UNESCOyê ji bo ku hemû zimanan biparêze, di 17.11.1999an da biryar da ku roja 21ê Sibatê bibe roja zimanê dayikê/zimanê zikmakî ya cîhanê.

Ev roj her sal li seranserê cîhanê bi çalakîyên pirrengî tê pîrozkirin. Kurd bi gelek awayan û bi çalakîyên berfireh vê rojê pîroz dikin.



UNESCO (United Nations Educational Scientific and Cultural Organization): Dezgeha Kultur û Zanîn û Perwerdeyê ya YNyê (Yekîtiya Neteweyan)

21ê Sibatê Roja Zimanê Zikmakî (Zimanê Dayikê)

Li gor nivîsa jorê, bersiva van pirsan binivîse:

Roja Zimanê Zikmakî kengî ye?

.....

Bengladeş di bin destê kê de bû?

.....

Xwendekarên bengladeşî di 21ê Sibata 1952an da çi kirin?

.....

Pakistanê kengî zimanê bengladeşîyan qebûl kir?

.....

Çend xwendekarên bengladeşî hatin kuştin?

.....

Hevokên jorîn bi sê zimanên ku tu pê dizanî binivîse.

- | | | |
|---------|---------|---------|
| 1-..... | 1-..... | 1-..... |
| 2-..... | 2-..... | 2-..... |
| 3-..... | 3-..... | 3-..... |
| 4-..... | 4-..... | 4-..... |
| 5-..... | 5-..... | 5-..... |

PÊŞGÎR (pêşpirtik/prefîks)

Gireyên (pirtik) ku têne pêşîya bêjeyan pêşgir in. Bêje bi alîkarîya van pêşgiran pêk tên û maneyeka nû peyda dikin. Pêşgirên kurdîya kurmancî yên sereke ev in: **bê, nav, ne, ber, bin, ser ...**

Nimûne: *Bêxweyî, navber, nedîtî, berdêl, berpal, binerd, bindest serdest...*

PAŞGÎR (paşpirtik/suffîks)

Gireyên ku têne paşîya bêjeyan paşgir in. Paşgirên sereke ev in: **anî, ar, baz, bend, dar, ger, ok, kar, stan, war, mend, bar, van, î, tî, ayî, ek, xan, saz, wî, um**

Xeber bi alîkarîya van paşgiran pêk tên.

Nimûne: *azadî, nivîsar, gilîbaz, hevalbend, şevger, gerok, xwande**kar**, berwar, aqilmend, rojnamevan, deyndar ...*

Kawa û Rojda

Navê min Kawa ye. Ez ji bajarê Mêrdînê me. Gava ez 9 salî bûm me bar kir. Me du sal berê bar kir Qazaxistanê. Mala me niha li bajarê Almatiyê ye.

Bavê min rojnamevan e. Pir digere. Loma dêya min jê ra digot “gerok”. Nivîsarên wî di rojnameyan da hene. Ez jî xwendevanê wî me. Pîrika min aqilmenda wî ye. Bavê min pir deyndar bû. Loma me bar kir. Ew û destbirakekî xwe bi hev ra dixebitin. Biraktîya wan pir xweş e.

Ez li Almatiyê hînî zimanê qazaxî dibim. Li dibistana me dersa zimanê kurdî jî heye. Ez li vê derê dilşad im. Ez carinan xemgîn dibim. Lewra ez bêrîya Kurdistanê dikim. Ez bêrîya hevaltîya wê derê dikim. Ez bêrîya hevalên xwe dikim.



Niha ez yazdeh salî me. Ez di înternetê da bi hevalên xwe yê Kurdistanê ra dipeyivim. Hevaltîya vê derê jî xweş e. Gelek kurd hene. Çend hevalên min jî çêbûne. Ez bi wan ra futbolê dilîzim. Ez ji wan hez dikim. Ew jî ji min hez dikin.



Hevaleka min li Kurdistanê maye. Navê wê Rojda ye. Em pir ji hev hez dikin. Ew hezkirîya min e. Ez evîndarê wê me. Ew jî diçe dibistanê. Bavê min soz da min, em dê havînê biçin Mêrdînê. Ez dê Rojdayê bibînim.

Min sê roj berê telefonî wê kir. Ew li mala xalê xwe bû. Ew jî diçe dibistanê. Bavê wê dersdêrê zimanê kurdî ye. Min pir bêriya wê kiriye.

Spartek

Di nivîsa "Kawa û Rojda"yê da pêşgir û paşgiran nîşan bike.

CIHNAV

Cihnav ew parçeyên axaftinê ne ku di şûna navdêran da tên bikaranîn.

Cihnavên kesî du grûp in:

1. Cihnavên xwerû
2. Cihnavên tewandî

Cihnavên xwerû

Yekhejmar

ez

tu

ew

em

hûn

ew

Cihnavên tewandî

Yekhejmar

min

te

wî/wê

me

we

wan

Ez kurd im

Tu kurd î

Ew kurd e

Em kurd in

hûn kurd in

Ew kurd in

Min got

Te got

Wî got/wê got

Me got

We got

Wan got

Peyvên pêşîyan

Şixul bi aqil bi pêş da diçe.

Av rêya xwe dibîne.

Xeber hene zêr in, xeber jî hene ava çêr in.



MALBATA ME

Malbata me mezin e. Bavê min, dayika min, du bira û xwişkeka min hene. Kalik û pîrika min jî bi me ra dijîn. Apê min, xalê min, meta min û xaltîya min her tim têne mala me bi mêvanî.

Îro di malbata me da şahî ye. Rojbûna birê min ê Alan e. Em gişt şa dibin. Kalikê min xeber dide. Gişk guhdarîya wî dikin. Bi dûr a kalikê min ji xwişka min pirsî:

- Gulê, tu li kî derê dixebitî?

Xwişka min bersiv da:

- Di mektebê da, ez dersdêra zimanê kurdî me. Şagirtên min rind dixwînin.

Îsal ji dersxaneyê min şeş zar qebûlî xwendina bilind bûne.

Kalikê min got:

- Di dibistana we da xêncî zarokên kurdan, zarokên kîjan milletên din dixwînin?

Gulê got:

- Zarokên qazax, rûs, alman tirk, azerî, ermenî û yên din hene.

Kalikê min pirsî:

- Hûn bi hev ra bi kîjan zimanê diaxivin?

- Em hemû bi zimanê qazaxî dizanin.

Spartek

Bersiva van pirsan di deftera xwe da binivîsin.

1 - Malbata we çend nefer in?

2 - Kî bi mêvanî hatibû mala we?

3 - Ji bo çi, qewmê we hatibûne mal?

4 - Gulê li ku dixebite?

5 - Di dibistana we da zarokên kîjan milletan dixwînin?

EZ - MÎN
LÎ CÎHÊ VALA BÎNÎVÎSE

..... serê xwe şuşt.	 hevala xwe dît.
..... xwarinê dixwim.	 îro pir çay vexwar.
..... gulek kirî.	 ê sibê herim Parîsê.
..... diçim Dîyarbekirê.	 nikarim razê.
..... ketim erdê.	 ji xwe ra cotek sol kirî.
..... li balafirê siwar bûm.	 av keland.
..... dersa xwe çêkir.	 ava pir sar venaxwim.
..... ji Almatiyê hatim.	 serma girtîye.

WÎ - WÊ - EW
LÎ CÎHÊ VALA BÎNÎVÎSE

Nesrînê dersa xwe çêkir.	 dersa xwe çêkir.
Azad li malê ye.	 li malê ye.
Berfînê derî vekir.	 derî vekir.
Kemalî (Kemêl) ji min ra got.	 ji min ra got.
Zînê av anî.	 av anî.
Gulê karê xwe xelas kir.	 karê xwe xelas kir.
Kurdo (Kurdoyî) av vexwar.	 av vexwar.
Xwişka min got were.	 got were.

Ez xwendekar im

Navê min Alan e. Malbata me gelek mezin e. Bavê min, dêya min, birayên min û xwişkên min hene. Bavê min karsaz e. Cîyê xebata wan zaf mezin e. Dayika min doktor e. Xwişka min a mezin dersdêr e. Birayê min ê ji min mezintir diçe unîversîteyê. Ew dixwaze bibe rojhilatzan û bi dîrok û çanda kurd û Kurdistanê ve mijûl bibe. Ez jî diçim dibistanê. Ez di pola sêyan da dixwînim. Mamosteyê min, ji min gelekî hez dike. Ji min ra dibêje "tu gelekî bîaqil î."

Dibistana me nêzîkî mala me ye. Dorûberê dibistana me tev dar in. Hêşînayî pir e. Li kêleka dibistana me parka zarokan heye. Wexta ku ders xelas dibin, ez tevî hevalên xwe tême malê.

Navê birayê min ê mezin Eslan e. Ew unîversîteyê dixwîne. Unîversîteya wî li bajarê Almatiyê ye. Ez jî dixwazim unîversîteyê bixwînim bibim doktor.

Hevalê min

Hevalekî min ê zaf baş heye. Navê wî Hisên e. Ew hê yazdeh (11) salî ye. Li bajarê Çîmkentê dijî. Havînê bi mêvanî tê Almatiyê, mala me. Carinan ji min ra nameyan dişîne. Ez jî bersiva nameyên wî didim. Mala wan li Çîmkentê ye û gelek mezin e. Dorûberê mala wan baxçe ye. Wekî di nameya xwe da dibêje, ew ji kulîlkan pir hez dike. Ez jî ji kulîlkan pir hez dikim.

Min duh jê ra nameyek şand. Di nameyê da min jê xwast ku ew ji min ra navên kulîlkan wî bajarî binivîse û bişîne.

Ew ê ji min ra navên kulîlkan bişîne, ez ê jî ji wî ra wêneyên kulîlkan baxçeyê me bigirim û bişînim.

Ez niha li hêvîya nameya wî me.

Spartek

- ☐ Di heqê malbata xwe û hevalê xwe da bi hûrgilî qise bikin.
- ☐ Hûn jî ji hevalên xwe ra nameyan dişînin?
- ☐ Hûn bi rêya înternêta bi hevdu ra diaxivin?

Xidirnevî ((cejna kurdan ya kevnar)

Bi gotina gotîyan, carekê Xizir (Xidir) tevî Eylaz pêxemberî, ji çîyayê Qaf derbas dibin, di çol û bestan ra diçin digihêjin cîyekî xilîxalî. Li ava jîyanê (ava nemirîyê) digerin. Diçin digihêjin ber avekê, nanê xwe derdixin, sivrika xwe radixin û hedî hedî dixwin. Di nava tûrikê wan da masîyên kelandî hene. Yek ji wan tasa xwe dixê avê, dixwaze avê vexwe, dilopên avê dipişike ser masîyê pijîyayî. Masî sax dibe, ruh tê ber û xwe davêje çem û diçe.

Xizir jî Eylaz jî metelmayî dimînin, li hev dinêrin û paşê tê derdixin ku ew av ava jîyanê ye, ava nemirîyê ku ew lê digerin. Her yek tasa xwe ji wê avê dadigire û vedixwe. Li gor efsaneyê, Xizir jî Eylaz jî heta roja îro dijîn. Yek ji wan li ser erdê dijî, yek jî li ser avê dijî. Salê carekê, wê roja ku wan ava jîyanê (kewserê) vexwaribû, tên cem hev, xêr û duayên xwe li xweza û mirovatîyê dikin. Yekîtiya wan her du pêxemberan bûye sembola jîyan û hişyarbûnê. Û di nava gel da heta îro jî wekî Cejna Xidirnevî tê pîrozkirin.



Cejna Xidirnevî her sal zivistanê di dawîya meha Sibatê da, di destpêka biharê da, tê pîrozkirin. Wê roja pîroz her kes li mala xwe şîrînahîyên cuda cuda çêdikin, kulor û kadeyan dipêjin, qilênekan diqelînin, zarok rengên hêkan sor dikin, hêkan li hevdu dixin, ji hevdu dibin û şa dibin... Qewm, der û cînar, keç û xort diyarîyan didin hev. Kesên ji hev xeyîdî tên cem hev. Xweza jî wê rojê da hişyar dibe, cebre (germayî) dikeve erdê, germayî usa jî dikeve ruhê însanan. Hilmegulma biharê dikeve erdê. Xweza roj bi roj bedew dibe. Mirov jî loma jî xwe hesab dikin ewledên Adem û Xizir...

Tiştonek

Ser şey e,
Dûv meqes e:
Bibêje ka ew çî ye?



Bêjeyên hevnav (homonîm)

Ji wan bêjeyan ra dibêjin bêjeyên hevnav (homonîm) ku di kurdîya kurmancî da wekî hev tên bilêvkirin û nivîsandin, lê maneyên wan cuda ne.

Nimûne:

Top: top (gog, topa lîstikê); top (çeka giran, top)

Çav: çav (çavê xênî); çav (çavê mirovan); çav (çavê kanîyê)

Kar: kar (şixul); kar (qezenc)

Ser: Ser (serê mirovan); ser (serê kanîyê); ser (serê çîyayan)

Zar: zar (ziman, zarava); zar (zarok)

Ber: ber (berê xwe bide min); ber (berê îsal: mehsûla îsal)

Bêjeyên hevmane (hevwate/sînonîm)

Ji wan bêjeyan ra bêjeyên hevmane dibêjin ku nivîsandin a wan cuda ne, lê maneyên wan yek in an jî nêzîkî hev in.

Nimûne:

- rind, pak, baş, çê
- mêrxas, wêrek
- Leheng, qehreman
- vir, derew
- zanîngeh, unîversîte
- dibistan, mekteb
- pir, gelek, zaf
- kevir, ber
- wilo, wisa, weha, wanî, werê
- rêziman, gramer
- ferheng, qamûs
- Ala, beyreq

Spartek

**Çend bêjeyên hevnav bibêjin û di nava hevokan da bidin xebatê.
Çend bêjeyên hevmane bibêjin û di nava hevokan da bidin xebatê.**

Bêjeyên dijmane (antonîm)

Ji wan bêjeyan ra bêjeyên dijmane dibêjin ku maneyên wan li dij hev in, ango bervajî hev in.

Nimûne:

ser-bin
germ-sar
pir-hindik
erzan-biha
zirav-qalind
gir-hûr

Nimûne:

baş-xerab
rast-xwar
giran-sivik
şev-roj
reşbîn-xweşbîn
jêr-jor

*Ba dewete, hesra e'wra jî baran,
Her şayê şînek heye, her usan.
Tim peşê însan e, hub û hizkirin
Şin û şayî ji hev naên kirin.*

Wezîrê Nadirî

Xort û Kalo

Carekê xortek gayê xwe bar dike, dikeve rê û ber bi gundekî ve diçe. Di rê da rastî kalekî tê û ji wî dipirse:

- Apo, tu nizanî ez ê kengî bigihêjim malê? Ez ji gundê Qeşgebûlaxê me.

Kalo divêje:

- Kurê min, wekî tu hêdî bajoyî, tu dê zû bigihêjî gundê xwe. Wekî tu bilezînî bajoyî, tu dê dereng bigihêjî malê.

Xort hew zanibû ku Kalo laqirdîyê xwe pê dike. Guh neda xebera wî û gayê xwe da ber şivan û zû zû ajot û çû. Lezand ku bigihêje malê. Di rê da gayê wî westîya û mexel hat. Kalo gihîşte xort, dît ku gayê wî mexel hatîye. Kalo halê xort dît û got:

- Ne min got ku nelezîne, wekî usane de tu jî cefayê xwe bikişîne.

Xortî got:

- Loma te digot ku tu zû zû bajoyî, tu dê dereng bigihêjî malê? Apo, gilîyê te rast e. Bavê min jî tim digot: «Lez nekevî, hêdî herî, tu dê zû bigihêjî, bilezînî, bi lezan tu nagihêjî mirazan...»

Spartek

Van bêjeyan di nava hevokê da bidine xebatê û di defterên xwe da binivîsin. **bilind-nizim, şîrîn-tehl, şev-roj, germ-sar, zû-hêdî, qalind-zirav.** Di helbesta jorîn da dijmaneyan hilbijêrin û binê wan xêz bikin.

Van bêjeyan di hevokan da bi cî bikin

Di her hevokekê da cîyek vala heye, ji nava malikan bersivên rast hilbijêrin û di nava hevokê da bi cih bikin.

- | | |
|---|-------------------|
| 1. Lazim e ku em qedrêbizanin. | gelek _____ |
| 2. Welatê mirovan.....mirovan e. | xwarinên _____ |
| 3. Ehmedê Xanîkurdan e. | bajarê _____ |
| 4. Ez ji temaşekirinapir hez dikim. | gelên _____ |
| 5. Apê Silêman dewletî ye. | hatime _____ |
| 6. Li çîyayê Alataûêheye. | rûspîyê _____ |
| 7. Berf zivistanê.....dibare. | pir _____ |
| 8. Lazim e ku însan ji.....hez bike. | şaîrekî _____ |
| 9. Mirov..... zimanê kurdî hîn bibe. | ala _____ |
| 10. Dayika minxweş çêdike. | dibistan _____ |
| 11. Astana Qazaxistanê ye. | kedî _____ |
| 12. Li Kurdistanê cuda pir in. | baş _____ |
| 13. Ez li Almatiyê.....dînê. | hêlîna _____ |
| 14. Yê ku gotinên pêşîyan gotineberê ne | pêncî _____ |
| 15. Kilamêngelek xweş in. | herim _____ |
| 16. Kesk, sor û zerkurdan e. | heywanan _____ |
| 17. Pişîk heywanekaye. | dikare _____ |
| 18. Bavê minxwendîye. | berf _____ |
| 19. Em mamosteyê xwe.....guhdarî dikin. | têlêvîzyonê _____ |
| 20. Li dibistana mexwendekar hene. | mezinan _____ |

Dûmeqesk

Dûmeqesk cînara me,
Wê hergav bê mala me,
Em çi bikin, çi nekin,
Em ê jê ra hêlînê çêkin,
Wê bikeve baxçê me,
Wê bikeve cegerê me,
Û nahêle para me.



Berxvano

Berxvano, berxa bîne,
Tu cîyê xwe biçêrîne,
Dayika te qurbana te,
To bide ser nanê te.
Berxvanê me delal e,
Desteka wî kara çal e.
Êvarê bîne malê,
Ez qurbana bejn-balê!



"Merivê xerîb, teyrê kor e."

Gotina Pêşyan



"Bila mirov kuştîyê
şêra be, ne girtîyê
roviya be."

(Gotina Pêşiyên Kurda)



MALBATA DÎYAKO Û ŞÎLANÊ

Dîyako ji bajarê Dêrikê ye. Dêrik di navbera Dîyarbekir, Wêranşar û Mêrdînê da ye. Dîyako 33 salî ye, mamoste ye û zewicî ye. Navê jina wî Şîlan e.

Şîlan 31 salî ye, ji Dîyarbekirê ye. Şîlan hemşîre ye, li nexweşxaneyê kar dike. Mala wan li Dîyarbekirê ye. Sê zarokên wan hene, du keç û kurek. Navê kurê wan Dara ye, Dara 7 salî ye, navê keçeka wan Zerga ye û ya din jî Nêrgiz e. Ew cewî ne, 4 salî ne.

Dara diçe dibistanê, Zerga û Nêrgiz jî diçin kreşê yanî hêlîna zarokan. Servîsa dibistan û kreşê heye, bi mînbûsê wan dibin kreş û dibistanê û êvarê jî wan tînin malê. Ew ji bo kreş û servîsê her meh pereyekî didin.

Mala wan li Dîyarbekirê li taxekê ye ku jê ra dibêjin Ehmedê Xanî. Xaniyê wan şeş qat e, ew li qata çaran rûdinin. Mala wan sê ode û salonek e. Li salona wan televîzyoneka mezin heye. Du dîwanên wan hene, rengên wan reş in. Dîwanên wan hem ji bo rûniştinê hem jî ji bo razanê ne.

Metbaxa wan gelek mezin e. Maseyeka 8 kesî tê da heye, carinan deh kes jî dikarin rûnin û xwarinê bixwin.

Odeyên zarokan jî pir xweşik hatine raxistin. Kurê wan Dara li odeyekê dimîne, keçên wan Zerga û Nêrgiz jî li odeyeka din dimînin. Rengên odeyên wan sipî ne. Li odeya keçikan du textên razanê û du mase û du kursî hene. Ji bo pirtûkan jî refek heye.

Li odeya Darayî jî textekî razanê, maseyek, kursîyek û refeke pirtûkan heye.

Zarok her êvar piştî şîvê diranên xwe dişon û diçin odeyên xwe, dersên xwe çêdikin. Lê piştî saet 21.00ê li odeyên wan komputer û telefon qedexe ne.

Gava ew dersa xwe baş fam nakin, ji dayik û bavê xwe alîkarîyê dixwazin. Dê û bavê wan jî alîkarîya wan dikin da dersa xwe baştir fam bikin.

Ew pir ji dayik û bavê xwe hez dikin. Dayik û bavê wan jî ji zarokên xwe pir hez dikin.

Ji van 16 hevokan 8 **rast** in, 8 **xelet** in.

Li ber ya rast binivîse: **R**

Li ber ya xelet binivîse: **X**

1	Dîyako doktor e.	X
2	Şîlan hemşîre ye.	
3	Şîlan li gundan dixebite.	
4	Çar zarokên wan hene.	
5	Navê kurê wan Dara ye.	
6	Kurê wan diçe kreşê.	
7	Keçên wan cêwî ne.	
8	Navên keçên wan Zerga û Nêrgiz in.	
9	Zerga û Nêrgiz 4 salî ne.	
10	Dara 7 salî ye.	
11	Dîyako 28 salî ye.	
12	Şîlan 29 salî ye.	
13	Mala wan li qatê heftan e.	
14	Mala wan 3 ode û salonek e.	
15	Maseya metbaxa wan ji bo heft kesan e.	
16	Zarok her êvar piştî şîvê diranên xwe dişo.	

Di hevokên jêrîn da, binê cihnavên kesî yên xwerû xêz bikin.

Nimûne: Tu ji xwe gelek hez dikî.

- 1- Ez îro diçim mala Bêrîvanê.
- 2- Hûn li kîjan alîyê rûdinin?
- 3- Ew kengî diçin bajarê Astanayê?
- 4- Em îro naçin dibistanê.
- 5- Tu li gilîyên dayika xwe guhdarî dikî?
- 6- Ew çima ji te pir hez dike?

Di hevokên jêrîn da, binê cihnavên kesî yên tewandî xêz bikin.


Nimûne: Wan roja xwe bi kêf û eşq derbas kir.

- 1- *Were mala me sêvan bixwe.*
- 2- *Min duh xwarin bir mala cînanan.*
- 3- *Te kengî ew dît?*
- 4- *Ez dê ji te ra kilamekê bibêjim.*
- 5- *We ji me ra çi kiriye?*
- 6- *Wî destên dê û bavê xwe paç kir.*

Spartek

Cihnavên xwerû û yên tewandî di defterên xwe da binivîsin û pê hevokan ava bikin.

1.
2.
3.
4.
5.
6.



Du heval (Ji zargotina cimaetê)

Hebû, tune bû du hevalê nêzîk hebûn. Navê yekî Heso bû, navê yê din Keso bû. Rojekê ew diçin daristanê, wekî karîya berhev bikin. Digerin, karîya ji xwe ra berhev dikin, dixwazin vegerine malê, ji nişkê ve hirçek ji nava kola derdikeve peşîya wan. Heso hevalê xwe dihêle û ji tîrsa zû hildikişe ser darê. Keso nizane çi bike. Hirç êdî nêzîk dibe, dixwaze lepê xwe bavêjê wî, lê Keso natirse, xwe davêje erdê, xwe li mirîtîyê datîne. Hirç tê, lê dinêre, bêhn dike, guh dide ser bêhna wî, bawer dike ku ew bi rastî jî mirîye û dihêle diçe. Heso dinêre, ku hirç çû, bi lez xwe ji ser darê davêje erdê û ji Keso dipirse: "Hirçê tu bêhn kirî, li dora te çû û hat, di guhê te da çi got?"

Keso: "Hirçê got, careka din bi hevalê usa xerav ra hevaltîyê neke, gumana xwe pê neyne, pê ra neçe daristanê..."

Bav û kalan gotiye:

Şûşa dil ku şikest nacebire.
 Şîna tevî hevalan, şayî ye.
 Dostê çê di rojên tengasîyê da bi kêrî mirova tê.
 Du dost bi hev ra rast bin, yê sisêyan Xwedê ye.
 Hevaltî bi rastî.
 Hevalê xerab, kula parxanê ye.
 Dostê xêr ji brayê bêxêr çêtir e.

Di hevokên jêrîn da cihnavên xwerû hene, ya destpêkê binê wê xêzkirî ye, hûn jî yên mayîn xêz bikin.

Gulîzera piçûk heft salî ye. Ew li Almatiyê ji dêya xwe bûye. Bavê wê sibehê zû diçe karê xwe, dayika wê li malê dimîne û karê malê dike. Gulîzer diçe pola (koma) yekê. Kêfa wê ji dibistana wê ra zaf tê. Ew ji mamosteya xwe pir hez dike. Gulîzer keçeka pir biazil e. Ew bi sê zimanan dizane: qazaxî, rûsî û kurdî. Ew li dervayî dibistanê jî bi hevalên xwe ra dilîze û digere. Ew bi wan ra bi qazaxî xeber dide.

Di hevokên jêrîn da cihnavên tewandî bibînin û binê wan xêz bikin.

Ev Qaso ye. Ev jî xwişka wî Meryem e. Îro ji bajêr hatine, wekî ku li nava baxçeyê gundê me kêf û eşqê bikin. Apê wan Ezîz e. Mala wî li gundê me ye. Em cînarên hev in. Ew ji Qaso û Meryemê gelek hez dike. Carinan wan tîne malê ku bi wan şa bibe. Wexta Qaso û Meryem tene vê derê, pir şa dibin û ji xwe ra dilîzin. Carinan jî diçin baxçeyê apê xwe û heta êvarê li wê derê dimînin.

Li navnîşanê pirsîn

- Bibexşînin!
- Kerem bikin!
- Stasyona otobusan li kî derê ye? - Tu dixwazî herî kî derê?
- Ez dixwazim herim Bîşkêkê.
- Wê wextê divê tu herî gola Seyranê. Stasyona otobûsan li wê derê ye.
- Ez çawa dikarim herim gola Seyranê?
- Li vê rawestgehê li hêviya otobusa hejmarê 503yan bisekine. Ew ê te bibe wê derê. Wekî din jî hejmarên 402 û 333yan jî diçin wê derê.
- Gelek spas!
- Rêya te vekirî be!



Di hevokên jêrîn da cihnavên xwerû hatine derxistin, hûn temam bikin.

- 1- *Tu çend salî yî?*
- 2- *Kî hevalê min e?*
- 3- *Kî li vira bû?*
- 4- *Kî bi avtoyê hat?*
- 5- *Kî rûniştîye?*
- 6- *Ew li kêderê man?*

Ez heyşt salî me.
.....hevalê min î.
.....li vê derê bû.
.....bi avtoyê hatin.
.....rûniştîye.
.....li malê mane.

Di hevokê jêrîn da cihnavên tewandî hatine derxistin, hûn temam bikin.

- 1- *Kê qelema sor biriye?*
- 2- *Kê defter ji te sitend?*
- 3- *Kê di tendûrê da nan pê?*
- 4- *Kê pamîdor kirîn?*
- 5- *Kê sêvên baxçeyî anîn?*
- 6- *Kê xwarin çêkirîye?*
- 7- *Kê zarok civandine?*

Min qelema sor biriye.
.....defter ji min stend.
.....di tendûrê da nan pê.
.....pamîdor kirîn.
.....sêvên baxçeyî anîn.
.....xwarin çêkirî.
.....zarok civandin.

Têderxistinok

**Tiştêkî min heye tiştonek,
Dinya hemû tê da ye.**

Ew çî ye?

huG

**Xwar e, ne dare,
Dikale, ne kar e,
Dixuşe ne mar e.
Ew çî ye?**

meÇ

**Ew çî ye ku mehê carekê kal dibe,
Dimire û paşê sax dibe?
Ew çî ye?**

vîH

**Vî alî dîwar, wî alî dîwar,
Tê da girêdaye seyêkî har.
Ew çî ye?**

namiZ

**Apê minî bi lingekî,
Çû ber garana gundekî,
Ew çî ye?**

tukêM

**Li avê dixim dişikê,
Li kevir dixim naşikê,
Ew çî ye?**

zixaK



ZIVISTAN (şîreta doktor)

Rojên zivistanê sar in. Berf dibare, mij û dûman in û carinan jî hişkî dikeve. Usa dibe ku mirov nikare derkeve deverekê. Zivistana Almatiyê pir sar e, berf pir lê dibare. Çîya û banî bi berfê ve dixemilin.

Rojên zivistanê mirov cilên qalind li xwe neke, dê nexweş bikeve. Loma ji lazim e ku mirov xwe ji sermayê biparêze. Lazim e ku zivistanê em cil û berkanên qalind li xwe bikin. Di rojên berfê da divê em sîwanê (zontîkê) bi xwe ra bigerînin. Di rojên bagerê da lazim e ku em dernekevin dervayî malê.

Wexta em têne malê, divê em cilên xwe yên germ ji xwe bikin. Wexta ku nexweşî çêbû, divê em xwe jê biparêzin û herin ser doktoran. Çi tiştê ku doktor dibêjin, divê em wan pêk bînin û dermanên xwe di wextê da bixwin. Divê em xwe ji nexweşîyên arsim (grîpe), kuxikê dûr bigirin.

Lazime ku em firaqên xwarinê tim paqij bikin, avrîya hev nexwin.

Tiştên zererê didin bedena we bi kar neynin. Rojên biberf kum û lepikên xwe ji bîr nekin.

Heger em vana pêk bînin, rojên zivistana me dê xweş û bê nexweşî derbas bibin. Saxlemî ji her tiştî ferztir e, şîrîntir e, ezîztir e. Xwedîkirina wê di destê we ye.

Spartek

Hûn di heqê zivistana herêma xwe da çi bizanin, defterên xwe da binivîsin.



DILÊ DAYÎKÊ (zargotina cimaetê)

Hebû tune bû, jinîkek û kurekî wê yê hesretî hebûn. Kurik mezin dibe, dibe xort. Wexta zewaca wî tê, ew aşiqê keça cînarê xwe dibe. Ew ji hevdu pir hez dikin. Ji ber hezkirina keçikê, xort bi şev û rojê xewê nake. Xort doza zewacê dike. Keçik qayîl nabe. Nazî û tûzîya dike. Dixwaze xort biceribîne. Ka bi rastî jî ew jê hez dike, yan na.

Ê, qerez, xulase keçik şertekî dide pêşîya wî û dibêje:

- Baş, ez razî me, em hev bistînin. Tu gerek şertê min biqedînî. Here, dilê dayika xwe derxe û ji min ra germî bi germî bîne. Wê gavê ez ê bizanim ku tu bi rastî jî ji min hez dikî.

Xortê cahil û bêaqil diçe malê, kêrê hildide, ber bi dayika xwe ve diçe û dibêje:

- Dayê, ez hatime dilê te derxim, ji hezkirîya xwe ra bibim. Paşê em ê bizewicin.

Dayîk qet beşera xwe naguhêre û dibêje:

- Bibe lawo, bira qurbana te be.

Xort zûtirkê dilê dayika xwe derdixe, bi pîneyekê dipêçe û ber bi hezkirîya xwe ve direve. Di rê da lingê wî li keviyekê dikeve, dilê dayîkê divê ax! Ew deverîya dikeve, dilê dayîkê di nava boxçeyê da dibêje:

- Of kurê min, çavên dayika te birijîn, tu neêşîyayî, ez qurbana te me!

Xort ecêbmayî dimîne, saweka giran bi ser wî dikeve. Ew bi halekî radibe û diçe cem keçikê û dilê dayika xwe dide wê. Keçik tû rûyê wî dike û dibêje:

- Here, heramo, bêaqilo! Tu îro ji bo gilîyê min çû û te dilê dayika xwe derxist ji min ra anî, tu dê sibê jî ji bo gilîyê yeka din dilê min derxî ji wê ra bibî...

Spartek

**Hub û hezkirina dayîkê û bêaqilîya kurê wê bi gilîye xwe va qisekin
(şirovebikin).**

KILAMÊN GOVENDÊ

LO DÎLO



Em ê îşev li ku bin,
Lo dilo, dilo, lo dilo,
Em ê îşev li ku bin,
Sêfilo dilo sorgulo?
Ha li ser pira Qersê bin,
Lo dilo, dilo, lo dilo, Ha
li ser pira Qersê bin,
Sêfilo dilo, sorgulo.

Xweş tê dengê bilûrê,
Lo dilo, dilo, lo dilo,
Xweş tê dengê bilûrê,
Sêfilo dilo, sorgulo.
Em ê îro li ku bin,
Lo dilo, dilo, lo dilo,
Em ê sivê li ku bin,
Sêfilo dilo, sorgulo

LÛRKE, LÛRKE, XATÛNÊ, LÛRKE



Lûrke, lûrke, lûrke, lûrke, xatûnê, lûrke,
Lûrke, lûrke, lûrke, lûrke, dîlberê, lûrke,
Çûme mala Eliyê Metê, xatûnê, lûrke,
Hatime mala Eliyê Metê, dîlberê, lûrke.
Danî ber min goştê betê, xatûnê lûrke,
Danî ber min goştê betê, dîlberê, lûrke,
Min heram be vê dewatê, xatûnê, lûrke,
Min heram be vê dewatê, dîlberê, lûrke..



Tu jî bi heq î (Ji zargotina cimaetê)

Mele carinan qazîti jî dîkir. Carekê yek tê bal meleyî şikayata cîranê xwe dike, wekî cînarê wî hespê wî dizîye û nadê. Lazim e ku ew bê ceza kirin. Mele guh didê û di dawîyê da dibêje:

-Tu bi heqî!

Bi dû wî ra yê ku li ser şikyat hebû tê bal mele û zêrekî nişanî wî dide û xwe diparêze:

- Ew rast nabêje, derewan dike, min gunehkar dike.

Mele çav li zêr dikeve, guh dide wî difikire û dibêje:

-Tu bi heqî!

Pîreka mele li emelê mêrê xwe ecêbmayî dimîne û dibêje:

- Mêrik, ev çî emel in, qet tiştê nekete serê min. Çawa dibe, dewakar jî bi heq e û gunehkar jî bi heq e? Qet şîxulê ha dibe?

Mele qet beşera xwe neguhêre, li pîreka xwe dinêre û dibêje:

- Bermalîya min, heger ez rastîyê bibêjim, **tu jî bi heqî!**..

Pirs

Di nivîsara jorîn da hûn heqî û neheqîya mele û aqilbendîya jîna wî çawa qîmet dîkin?



CIXARE MIROVAN DIKUJE (Şîreta doktor)

Sedema kansera ceger (kezeb), pişik, qirik, lêv û mêtjûyê mirovan kişandina cixare ye. Yên ku cixareyê dikişînin, li gor yê ku nakişînin, ji sedî 15 kêmtir oksîjenê distînin.

Yên ku cixareyê dikişînin, li gor yê nakişînin, zêdetir tiştan ji bîr dikin. Sedema kansera ku di dest, ling û tilîyan da dertê, kişandina cixareyê ye. Bê guman, dilê mirov dibe qurbana cixare kişandinê. Li ser rûyê erdê bi milyonan mirov cixareyê dikişînin û loma nexweş dikevin. Kirîna cixareyê rehet e, lê dest jêberdana wê gelek çetin e.

Zanyarên ku li ser saxlemîya mirovan lêkolînan dikin, bi awayekî pir zelal dibêjin ku cixare dijmînê mirovan e. Zerera ku cixareyê dide mirovan, tu tişt nadê.

Di nava cixareyê da nîkotîn heye. Ev made jehr e û dihêle, ku herikîna xwînê bilind bibe, bêhn standin çetin dibe û mehdê mirovan tê girtin. Loma jî oksîjen kêmtir dibe, di şûna wê da mecbûr karbondîoksît tê standin. Axirîyê di rehên dilî da kolesterol zêde dibe, reh teng dibin. Di dev û qirikê da dihêle ku rizandin çêbibe. Cixare dibe sebeb ku gelek cureyên kanserê çêbibin. Ceger û pişika mirovan dixetîmîne. Yên ku cixareyê dikişînin, pir dikuxin.

Ji ber vê yekê, lazim e ku mirov cixareyê qet nekişînin, yê ku dikişînin jî divê zû dest jê berdin. Yên ku dest ji cixareyê berdidin, dibêjin; "jîyana bê cixare çî xweş e". Ji bo ku em jîyana xwe xweş bikin, divê em cixareyê nekişînin. Cigare, îlehî ji bo zarokan mirin e. Ew "mijûlîyeka" pir xerab e, ziyankar e û malxerabî ye. Zarokên delal, hûn jî li hember cixarekişandinê him li malê, him jî li derva şerkarîyê bikin.

Spartek

**Dê û bavê xwe ra, der-dorê xwe ra, li derva, li dibistanê derheqa vê
je'ra bê derman da gilî kin**

Cihnavên nîşandêr



Ji wan cihnavan ra dibêjin cihnavên nîşandêr ku di şûna navdêran da an jî li gel wan ji bo nîşandana tên bikaranîn. Nîşandana navên kesan, navên heywanan, navên gul gîyayan , navên tiştan û navên hwd bi alîkarîya van cureyên cihnavan pêk tê.

Cihnavên nîşandêr yên xwerû tewandî

ev
ew

cihnavên nîşandêr yên

vî, vê van
wî, wê wan

ev: Ji bo nîşandana nav û tiştên nêzîk

ew: Ji bo nîşandana nav û tiştên dûr

vî, vê, van: Ji bo nîşandana nav û tiştên nêzîk

wî, wê wan: Ji bo nîşandana nav û tiştên dûr

Nimûne:

	ev	ew
Ji bo yên yekhejmar	{ Ev çi ye? Vê keçikê got. Vî dîkî bigire.	Ew çi ye? Wê keçikê got. Wî dîkî bigire.
Ji bo yên pirhejmar	{ Ev xort dibêjin. Ew keç dixwînin.	Van xortan got Wan keçan xwend.

Di van hevokên jêrîn da cihnavên nîşandêr yê xwerû bidin kivşê û binê wan xêz bikin.

Nimûne: Ev jî birayê me Şerîf e.

1. *Ev çi ye?*
2. *Ew çi ye?*
3. *Ev kitêb ya kê ye?*
4. *Ew kitêb ya kê ye?*
5. *Ez van zarokan nas dikim.*
6. *Ez wan zarokan nas nakim.*
7. *Ev kurxalê min e.*
8. *Dibistana me ew e?*
9. *Ev mala me ye.*
10. *Zilamê ku mamostetîyê dike ew e.*
11. *Pismamê te ew e?*

Di van hevokên jêrîn da cihnavên nîşandêr yê tewandî kîjan in bidine kivşê û binê wan xêz bikin.

Nimûne: Wê berê werzîşvanî dikir.

1. *Ez vê jinikê nas nakim*
2. *Ez wî mêrikî nas dikim.*
3. *Ez ji wê derê hatim.*
4. *Ez ji wî gundî hez nakim.*
5. *Min ji wan gundîyan ra got.*
6. *Ez dê van pereyan çawa hilînim?*
7. *Divê tu nekevî nava van karan.*
8. *Ew wan malan nîşan dike.*
9. *Ew navên van zilaman li deftera xwe dinivîse.*
10. *Em ji van tiştan pir dûr mane.*
11. *Hûn ji wan tiştan hez dikin?*

Spartek

Hûn jî deh hevokan di defterên xwe da binivîsin ku bila pênc cihnavên nîşandêr yê xwerû û pênc cihnavên nîşandêr yê tewandî tê da hebin



Kuro, kuro

Kuro, kuro, kuranî,
Kevir avêt kewkanî,
Çavê kewê deranî,
Xwe ra kire mêranî.

Wîl wîl wîl didim


Wîl wîl wîl didim
Her du çava kil didim
Kilê ji kilê buharê
Ava ji ava çinarê
Çinarîka qirşika
Kumê hirçê zêrîn e
Hirç elimye ser texta
Qeytana devê rexta
Yê xwestî bi pirtûk e

Kara bizina belek e

Kara bizina beleke
Hoy karê, hoy karê.
Kara bizina beleke,
Hoyla gura xarê.

Yek bi yek

Yek bi yek
Dudu bi dudû
Sisê bi sisê
Çeqla tisê
Mamê dinê Bi
kevirê sînê
Di ber ra çûm
Û di ber ra hatim



Li gundekî kalek û keça xwe diman. Havînê gundîyan ji xwe ra ardû berhev dikir, debara zivistanê dikir. Rojekê keçik ji bavê xwe ra dibêje:

- Bavo, em jî ji xwe ra ardû berhev bikin.

Bav dibêje:

- Keça min, heta zivistan bê, ez ê bimirim, tu dixwazî berhev bikî, divê tu herî ji xwe ra berhev bikî. Tu berhev dikî an nakî, êdî tu dizanî.

Keçik dibêje:

- Heta zivistan bê, ez ê jî mêr bikim, êdî ardû çî ji me ra divê?

Wa dimînin, zivistan tê, ne Kalo dimire, ne jî keça wî mêr dike. Di dawîyê da her du jî di xanîyê sîkîsar da dimînin, ji sermayê diqerisin.

Zozanê me

Me li zozanên bilind danî,
Me ji kanîyan ava sar anî,
Em ê bixwin mastê tîr,
Em ê rûn hildin ji maste şîr.

Vî zinarî

Vî zinarî şeşeşeq e,
Ez ê gîha herînim,
Tu sosina têke baqe,
Evîntîya min û te ser,
Cote gore, kite saq e.

Gotinên pêşîyan

Îro sır û serma ye, sibê def û zirne ye.
Mirov bixwaze, wê çîya dayne ser çîya.
Îro dora we ye, sibê dora me ye.
Aqilê sivik, barê giran.
Kê havînê dixebite, zivistanê pir rehet e.



Name

Hevalê min ê hêja, Têmir!

Ez niha li malê me û ji te ra nameyê dinivîsim. Nameya ku te şandibû, gihîşt destê min. Ez pir şa bûm.

Hewa zaf germ e. Ev çend roj in ku di nava rojê da em ji ber germayê nikarin ji malê xwe derkevin. Baş e ku li baxçeyê me birkek (hewzê avê) heye, ez carinan dikevimê û hênik dibim.

Odeya min jî germ e. Dê û bavê min jî niha li malê ne. Wan bihîst ku ez ji te ra nameyê dinivîsim, ji min ra gotin ku silavên wan jî te û silavan li dê û bavê te jî dikin. Bavê min li ser dîwanê rûniştîye û li televizyona kurdî temaşe dike, dêya min jî li xwaringehê xwarinê çêdike.

Tu dizanî ku bavê min niha naxebite. Ew 30 salî wek dersdêrê zimanê dayikê xebitîye. Carinan xwendekarên wî tên û wî ziyaret dikin.

Ev çend meh bûn ku ez li hêvîya nameya te bûm, dê û bavê min pir fikira te dikin. Bavê min hê jî dibêje: "Têmir xwendekarekî baş bû", ji te pir hez dike.

Gelo tu niha çî dikî? Halê te çî ye? Kar û xebata te bi rê ve diçe?

Silavên me bigihîne dê û bavê xwe jî. Bila fikira me nekin, em baş in, bi tenê fikira me hûn in. Heger tu bikarî ji bedêla min silavan li heval û hogiran bikî, ez dê kêfxweş bibim. Ez li hêvîya nameya te me.

Li gel rêz û silavên min ên hevaltîyê...

05.07. 2021

Hevala te, Berîvana Mehmûd

CIHNAVÊN PIRSYARÎ

Grûpa xwerû

Kî

Kîjan

Çi

Çend

Grûpa tewandî

kê

kîjanî (di cihê navdêrên nêr da)

kîjanê (di cihê navdêrên mê da)

kîjanan (di cihê navdêrên pirhejmar da)

Nimûne (Grûpa xwerû):

Kî dibêje?

Kîjan ji wan jîr e?

Kîjan jîr e?

Kîjan ji wan qenc in?

Kîjan ji wan bi ser ketin?

Bersivên nimûneyan

Ew dibêje

Ew xortê bejindirêj jîr e.

Ew keça çavreş jîr e.

Ew pênc xortên kurd qenc in.

Ew jinên ji Kurdistanê bi ser ketin

Nimûne (Grûpa tewandî):

Kê got?

Kîjanî ji wan te ra got?

Kîjanê ji te ra got?

Kîjan ji wan qenc in?

Kîjana ew dîtiye?

Kîjanan ew dîtine?

Bersivên nimûneyan

Wî got. /Wê got.

Wî xortê bejindirêj got

Wê keça çavreş ji min ra got.

Ew pênc xortên kurd qenc in.

Wan keçan ew dîtiye.

Wan xortan ew dîtine?

Spartek

Pênc hevokan binivîsin ku cihnavên pirsyarî tê da hebin.



ALMATI

Li bajarê Almatiyê gelek cihên bedew hene. Çar alîyên bajêr hêşînayî ne. Li jora bajêr çîya û daristan hene. Li jêra bajarê Almatiyê deştên fireh û mezin hene. Li wan deştan genim, ceh û fekî têne çandin. Kurdên me ji zû ve hatine vê derê û bi cî û war bûne. Ev çend sal in ku halê kurdên me yên vê derê baş bûye. Ji xwe ra kar dikin, hemû jî ji Qazaxistanê hez dikin û wekî welatê xwe yê duyem hesab dikin. Li vî bajarî cimaeta kurdan xurt e.

Mirovên ulimdar (zanyar), nivîskar, doktor, mihendîs, dadger, wênegir, karsaz û karmend jî ji nava kurdên vê derê derketine. Tev welatparêz in. Her kes ji bo pêşdaçûyîna çanda kurdan karekî dike.

Li Almatiyê Navenda Çanda Kurdên Qazaxistanê "Berbang" heye. Bi zimanê kurdî kovar, rojname, kitêbên zimanê kurdî, kitêbên şair û nivîskarên kurdan çap dibin. Gelek komên kilam û govendan hene, wekî koma «Kurdistan», «Nûr-E'î», «Alan», «Mîdîya», «Kevokên Aştîyê», «Baxçê Gulan» û yên mayîn.


Pirs

Nivîsa jorîn bixwînin û hûn jî behsa bajarê xwe bikin.

**Di van hevokên jêrîn da yên ku wexta didine kivşê kîjan in?
Binê wan xêz bikin.**

Nimûne: Ji êvarê da ji wî ra dibêjim nabêjim, ew guh nade min.

- 1- Sibê mêvanên me tên.
- 2- Wê gavê ez û Mihemed li Astanayê bûn.
- 3- Par na, pêrar bavê min çû ber dîlovanîya Xwedayî.
- 4- Berê kurdên me li vê derê kêr bûn.
- 5- Biharê ev dever gelekî hêşîn dibin.
- 6- Îşev daweta birayê min e.
- 7- Ehmed gelek dereng ma.



- 1- Li jêra gundê me darîstaneka mezin heye.
- 2- Li alîyê daristanê yê çepê hindik dar hene.
- 3- Hundirê daristanê tarî ye.
- 4- Li alîyê daristanê yê jorîn serê daran digihêjin hev.
- 5- Darên fêkîyan zû gul vedidin .
- 6- Di bin daran da gîha heye.
- 7- Navbera daran ne teng e.
- 8- Li hêla rastê darên bedew bilind dibin.
- 9- Bêhneka pir xweş ji daristanê tê.

Spartek

- 1. Li wêneyê jorîn binêrin û hûn jî behsa bedewîya bajarê xwe bikin**
- 2. Hevokên jorîn bikin hevokên pirsyarî.**



Şêr û mişk

(Çîrok)

Lana şêr û qulika mişk tev hev bûn. Şêr usa kubar kubar diçû û dihat, qet li ber pîyê xwe jî nedinhêrî.

Rojekê wexta şêr dîsa hat derbas bû, mişk kete nava lepên wî, şêr dixwast ku mişk bihinciranda, mişk gotê:

-Ya Rebê min, axayê min! Min azad bike, ez ê rojekê bi kêrî te bêm.

Bû tîqetîqa şêr û kenîya. Usa kenîya weki çok lê sist bûn. Mişk ji nava lepên wî derket revîya. Çendakî bi şûnda, nêzîkî qulika mişk zarîna şêr hat. Mişk bi tirs serê xwe derxist û nihêrî. Wî lê nihêrî ku şêr pir nexweş e. Zarezara wî ye. Mişk dît ku şêr ketîye tela nêçîrvanan. Ji şêr pirsî:

- Şêro, birako, çi bûye?

Şêr got:

- Ez ketime telê.

Şêr posîde posîde bersiv da.

Mişk got:

- Qet belengaz nebe, ez ê te xelas bikim.

Mişk kincirê telê bi diranê xwe cût, birî, şêr ji qezîyayê xelas bû. Wexta şêr rastî mişkî dihat, digot:

-Ax xelaskarê min, ruhdarê min!

Du hêştir (deve)

Du hêştir xwişkên hev bûn. Ew çûne berîyê û çêrîyan. Hêştirek diçêrîya, çêra devê xwe dida ya din. Hêştira din gotê:

-Xwişkê, ez jî diçêrim, tu jî diçêrî. Tu çima çêra devê xwe didî min?

Hêştira din gotê:

-Xwişkê, ez ji ter a hîmetê dikim. Her kes divê hîmetê qezenc bike. Ez ji xwe ra bi vî tehrî qencîyê dikim. Ji destê min bi tenê ev tê, ez jî wê dikim...

Spartek

Van çîrokan bixwînin û maneya wan şirove bikin.

"Qencî rûmeta rûyan e" ... Bi vê mijarê nivîsarekê binivîsin.

Rasthatin



- Roj baş, xwişka Rewşan!
- Roj baş, xwişka Sozdar! Duh tu li kî derê bûyî?
- Ez li malê bûm. Mêvanên me hebûn. Tu jî wan nas dikî. Mizgîn û Binefş li mala me bûn.
- Erê, ez nas dikim. Mirovên baş in. Hevalan duh ji min ra got ku Mizgîn û Binefş ne li dibistanê bûn.
- Erê, dersa wan tune bû, bi mêvanî hatibûn mala me. Me gelek xeber da, xwar û vexwar, Binefşê ji me ra çend kilam sitran.
- Ez zanim, dengê wê gelek xweş e.
- Ma birayê te Barî jî li malê bû?
- Na, ew ne li malê bû. Ew çûbû xebatê, paşê hat malê, lê wê gavê Mizgîn û Binefş çûbûn.
- Wekî din kî hebû li mala we. Bavê te jî li malê bû?
- Di destpêkê da ne li malê bû, çûbû gundan, bi dû ra hat.
- Dayika te li malê bû?
- Erê, wê ji me ra gelek xwarinên xweş çêkirin.
- Xwişka Rewşan, niha tu dê herî kî derê?
- Ez ê herim cîyê xebatê. Li wê derê karekî min heye. Divê ez zû biqedinim.
- Kerem bike, Xwedê oxirê bide te.
- Pir spas.

Bersivên van pirsan di defterên xwe da binivîsin!



- ☐ Çend kitêbên te hene?
- ☐ Tu çend salî yî?
- ☐ Hûn çend bira ne?
- ☐ Tu çend salî çûyî dibistanê?
- ☐ Çend sal in ku tu bi sporê ve mijûl dibî?
- ☐ Tu çend kîlo yî?
- ☐ Çend qelemên te hene?
- ☐ Çend destên te hene?
- ☐ Pamîdor bi çend tengan e?
- ☐ Trên di saet çendan da tê?
- ☐ Çend rojên hefteyê hene?

- ☐ Mala we kîjan e?
- ☐ Kîjan ji van bavê te ye?
- ☐ Dayika te kîjan e?
- ☐ Tu ji kîjan rengî hez dikî?
- ☐ Tu li kîjan welatî dijî?
- ☐ Newroz dikeve kîjan mehê?
- ☐ Mehên havînê kîjan in?
- ☐ Roja hefteyê yekem kîjan e?
- ☐ Tu ji kîjan zimanî hez dikî?
- ☐ Tu li kîjan bajarî mayî?
- ☐ Welatê te kîjan e?

Bersiva pirsên jêrîn binivîsin!



- | | |
|--|---------|
| 1. Di koma we da çend xwendekar hene? | 1. |
| 2. Çend mamosteyên we hene? | 2. |
| 3. Ji xwendekaran çend keç in? | 3. |
| 4. Ji xwendekaran çend kur in? | 4. |
| 5. Hûn di saet çendan da dikevin dersê? | 5. |
| 6. Hûn di saet çendan da ji dersê dertên | 6. |



ALAN Û BEYBÛN FÊKÎYAN DIKIRIN

Sîbê zû Alan û Beybûn çûn sûkê (bazarê), ji bo fekî û pincaran bikin. Di rê da Beybûnê pirsî:

- Alan, em ê bi çi herin sûkê?

Alan got:

- Em li otobusê siwar bibin, em ê piştî deh deqîqeyan bigihêjin sûkê.

Alan û Beybûn bi hev ra li otobusê siwar bûn û piştî çend deqîqeyan li sûkê peya bûn. Ji nişkê va yekî nas derket pêşîya wan. Silav da wan, lez kir û çû. Lê Alan û Beybûn hêdî hêdî ketin nava sûkê. Wan li dorûberê xwe nêrî û ji hev ra gotin ku fêkî pir biha ne.

Alan:

- Were, em kîloyek sêv, kîloyek jî tirî bikin û herin.

Paşê hatin ber pincaran, Alan sekinî û ji Beybûnê pirsî:

- Em çi qas pincar bikin?

Beybûnê gotê:

- Em bi tenê têra îro bikin.

Alan:

-Va bîber, pamîdor û xiyarê baş jî hene.

Beybûn:

- Ji her yekê kîloyekê bikire.

Alan kîloyek bîber, kîloyek pamîdor û kîloyek xiyar kirin, pênc sed tenge danê û ji Beybûnê ra got:

- Êdî dereng e, em herin.

Alan û Beybûn dîsa li otobusa xwe siwar bûn û çûne malê.

Spartek

Hûn jî nivîsarekê binivîsin ku li ser bazarê û kirîna fêkî û pincaran be.



Kurê bêxîret

Hebû, tune bû, kalek û kurekê wî yê bêxîret hebû. Mêrik kal bûbû, êdî xebat pê nedibû, ne sax bû, ne jî mirî. Zû bi zû nexweş diket. Kurê wî jê aciz dibû. Rojekê xort bavê xwe dike sepetekê û dibe datîne serê çîyayekî bilind ku gur bixwin.

Wexta kur wî datîne erdê, dixwaze ku vegere malê, bav dibêjê:

- Lawo, te ez anîme, ew karê te ye, destê Xwedayî li ser te be. Lê sepeta xwe hilde bibe malê, wê rojekê jî ji te ra lazim be.

Kur dibêje:

- Bavo, sepet dê ji bo çi ji min ra lazim be? Ez ê çi bikim bi sepetê?

Kalo dibêje:

- Lawo, wexta tu jî kal bibî, kurê te jî dê te têxe vê sepetê bîne vê derê.

Kur bi ser xwe ve tê, sepetê digire û diavêje, bavê xwe hildigire pişta xwe û tîne malê, bi şev û roj jê ra qulixîyê dike.

“Dê û bav taca serê merivan e”.

Li ser vê mijarê nivisarekê binivîsin.

Têderxistinok

Tiştêkî min heye,
canê wî goşt e,
kincê wî derzî.
Ew çî ye?

îjûj

Tendûreke zimzimî,
Tijî nanê genimî.

Ew çî ye?

rtês

Her tim li mal e,
geh şekir e,
geh tahl e.
Ew çî ye?

nzaim

Ji şekir şîrîntir e,
ji hesin girantir e.

Ew çî ye?

wxe

Li avê dixim naşikê,
li kêvir dixim dişikê.

Ew çî ye?

êkh

Tiştêkî min heye,
Ga diçe, boçik naçe.

Ew çî ye?

çkveî

Peyvên pêşîyan

- Benîştê dînan bi lîtiren e.
- Dengê diholê ji dûr vexweş e.
- Dewê ceribandî ji mastê neceribandî çêtir e.

- Bi ya ker manker horî ye.
- Ji çavê kor hêsir nayê.
- Mar nabin yar.
- Gur bi tu parîyan namire.



Kî - Kê

- Kî hat mala we?
- Kê ev kitêb daye te?
- Kî li min gerîya?
- Kê dîtiye?
- Kê sêv xwarin?
- Kê xwarin xwariye?
- Te ji kê pirsî?
- Em ê herin mala kê?
- Kî li wê derê ye?
- Kî dibêje?
- Kî bi min ra tê?

Kengê

- Tu kengê hatî?
- Ew kengê çû Astanayê?
- Ez kengê bêm mala we?
- Em kengê ji Moskvayê hatin?
- Kengê gîha zer dibe?
- Newroz kengê ye?
- Tu kengê ji dêya xwe bûyî? -
Bavê te kengê diçe?
- Hûn kengê diçin dibistanê? -
Tu kengê ji xewê radibî?
- Alan kengê tê malê?

Bersiva pirsên jêrîn bidin.

- 1- Tu kurê kê yî?
- 2- Tu ji kê hez dikî?
- 3- Tu çîma diçî dibistanê?
- 4- Mamosteyê te kî ye?
- 5- Tu kengê têlêfonî malê dikî?
- 6- Tu kengê diçî cîyê sporê?
- 7- Tu kengê radizêyî?
- 8- Tu kengê li muzîkê guhdarî dikî?

Pirs û Bersiv

- Tu kî yî?
- Ez dersdar im.
- Tu gundî yî?
- Na, ez ne gundî me. Ez ji bajêr im, ez bajarî me.
- Mihemed jî bajarî ye?
- Na, Mihemed gundî ye.
- Çima ew jî dersdar e?
- Erê, ew mamosteyê zimanê kurdî ye.
- Tu karkerî?
- Erê, ez karker im.
- Tu karsazî?
- Na, ez ne karsaz im, ez mihendîs im. Ev jî cîgirê min e.
- Ew kesên ha kî ne?
- Ew keçik in. Şagird in, di dibistanê da dixwînin.
- Ew kî ye?
- Ew doktor e, doktorê diranan e. Birayê wî jî avûkat e.
- Ev çî ye?
- Ev bixêrî ye.
- Vekirî ye?
- Na, dadayî ye.
- Çend pencereyên vê odeyê hene?
- Du pencereyên vê odeyê hene.
- Xwendekar, li kî derê ne?
- Xwendekar derketine hewa temîz.
- Tu kengê dest bi dersê dikî?
- Ez aniha dest bi dersê dikim.
- Dersdêrê te yê zimanê kurdî kî ye?
- Mamoste Senem e.
- Serwerê dibistana we kî ye?
- Mamoste Selîmê Barî ye.
- Hûn rojê çend dersan dikin?
- Em rojê şeş dersan dikin.
- Baş e, ji we ra sihet û qewatê dixwazim.
- Gelek sipas!





EZ Û XWEZA (TEBÎET)

Min tebîyet hemêz kir,
 Warê kal û bava.
 Paşilê da razam,
 Mîna zara sava.
 Û wextekî şevê,
 Stêrk ketin reqasê,
 Şemal dan erd û ezman,
 Wek şamdanê tasê.
 Her derê bû îşîq,
 Mêşe jî hişyar bû,
 Belga hev ramûsa,
 Eynî şaneşîn bû.
 Bê ji nermik wiland,
 Beden porê min maç kir,
 Bîhna hezar û yek gol,
 Tijî qefesa min kir.
 Gel tebîyet hikîyat e,
 Bedewî rewşa wê,
 Her feslek terîq e,
 Terîqa emrê wê,

Carna dike serma,
 Carna tirincê wê,
 Bi form û şûrê xwe,
 Xemlê li xwe dike,
 Ji kesî napirse,
 Û hêvî jî nake.
 Însan tebîyet bira ne,
 Tebîyet padîşahê dewra,
 Însan wadelî ye,
 Mîna belgê dara,
 Bihara hêşîn dibe,
 Payiza dadiweşe,
 Xema tebîyetê nîne,
 Û xwe ra tim dimeşe,
 Û min ji çend sala
 Li wê rind mêze kir,
 Pir-hindik ked danî,
 Emrê min jî qol kir...

*Temirê Hecî
 Sadiqê Şamîlzade*

MALBATA BERFÎNÊ

Navê min Berfîn e. Ez ji Dîyarbekirê me. Ez çardeh salî me. Ez xwendekar im. Rengê porê min qehweyî ye. Çavên min jî qahweyî ne. Bejna min dirêj e, lê ez zeîf û lawaz im.

Navê dayika min Sosin e. Ew mamosta ye. Ew sîh û pênc salî ye. Porê wê zer û kurt e. Çavên wê şîn in. Ew jineka xweşik e.



Bavê min mirovekî bejndirêj e. Navê wî Bazo ye. Ew bazirgan e. Ew çil salî ye. Porê wî reş e. Çavên wî qehweyî ne.

Xwişkêk û du birayên min hene. Navê xwişka min Hêlîn e. Navê birayekî min Ferhat e, navê birayê min ê din Rohat e.

Ferhat 14 salî ye, ew xwendekar e. Ew porzer û çavşîn e. Rohat 12 salî ye. Ew porkurîşk e, porê wî xelek xelekî ye. Çavên wî qehweyî ne. Bejna wî kurt e, piçekî qelew e.

Xuşka min Hêlîn neh salî ye. Porê wê reş e. Rengê çavên wê hingivîn e. Bejna wê dirêj e. Porê wê jî dirêj e. Ew porê xwe dihûne, dike du gulîyan.

Bapîr û dapîra min, yanî bavê bavê min û dêya bavê min jî cînarên me ne, mala wan nêzîkî mala me ye. Bapîrê min 72 salî ye, dapîra min 70 salî ye. Gelek caran ew tîn mala me, carinan jî em diçin mala wan.

Dema ku em bi wan re diaxifin, em nabêjin dapîr an jî bapîr, em ji bavê bavê xwe re dibêjin KALO û ji dêya bavê xwe re jî dibêjin PÎRÊ. Em pir ji wan hez dikin.

PIRS	BERSIV
1-Berfîn ji kê derê ye?	
2-Berfîn çend salî ye?	
3-Rengê porê Berfînê çawa ye?	
4-Çavên Berfînê çi reng in?	
5-Bejna Berfînê kurt e, yan dirêj e?	
6-Navê dayika Berfînê çi ye?	
7-Dayika Berfînê çi karî dike?	
8-Dayika Berfînê çend salî ye?	
9-Porê dayika Berfînê çi reng e?	
10-Rengê çavên dayika Berfînê çawa ye?	
11-Navê bavê Berfînê çi ye?	
12-Bavê Berfînê çend salî ye?	
13-Çend xwişk û birayên Berfînê hene?	
14-Navên xwişk û birayên Berfînê çi ne?	
15-Birayên Berfînê çend salî ne?	
16-Navê xwişka Berfînê çi ye?	
17-Xwişka Berfînê çend salî ye?	
18-Xwişka Berfînê porê xwe çi dike?	
19-Bapîr û dapîra Berfînê çend salî ne?	
20-Ew ji bapîr û dapîra xwe re dibêjin çi?	



Hevaltîya gur, rûvî û hirçê

Gur, rûvî û hirç bi hev ra hevaltîyê dikan. Goştê heywanekê dikeve destê wan. Hirç dibêje:

- Gelî bira, de bînin, em li hev par ve bikin, çika hûn ê çawa par ve bikin.

Gur dibêje:

- Çî ye, em ê çawa par ve bikin? Heçî bû goşt nîvî ji min ra, nîvî ji hirçê ra, ceger jî besî rûvîyî ye. Rûvî nikare ew qas goşt bixwe.

Hirç gur hildide ser lepê xwe û diavêje nava herîyê, ji bedena wî bi tenê boçika wî tê kivşê.

Hirç îcar berê xwe dide rûvî:

- Birayê rûvî, îcar tu were, çika tu dê çawa par ve bikî?

Rûvî bi fêlbazî dibêje:

- Bira, dewarek rastî me hatîye, xwedê parvekirîye, nîvî taştêya te, nîvî firavîna te, nîvî jî şîva te...

Hirç li rûvîyê fêlbaz dinêre û dibêje:

- Tu wê parvekirina baş û bîaqil ji kê hîn bûyî?

Rûvî bi fêlbazî dikene:

- Ji hevalê xwe yê di nav heriyê da!..

- Ha! ha! Te dêla gur di heriyê da dîtîye, loma tu hatî ser heqîyê, ji min ra jî dikî qencî û pakîyê...

Spartek

Di nivîsa jorîn da hûn çawa hevaltîya **gur**, **rûvî** û **hirçê** serwest dibin, bi gilîyên xwe şirove bikin.



Kesera teyr

Nêçîrvanek rojekê diçe nêçîrê. Li kêleka çem rûdinê, dîna xwe didê teyrêkî bedew di nava avê da ye. Teyr digire tîne malê, jê ra qefeseke zêrîn çêdike û çî qas tiştên baş hene dide ber wî. Teyr dîsa razî namîne, her dibêje:

- Ax welat! Wax welat!

Nêçîrvan pir difikire, bi dû ra teyr dibe, diavêje wî cîyî ku wî ew lê girtibû. Wexta teyr dikeve nava avê dibêje:

Ax welato! Xweş welato!.. Qefesa xelqê ya zêrîn ji bo min zîndan, hebs û laneto!

*Bavê min, welat xweş e
Boy gerê Bexdad xweş e.
Ji bo rewşê kincên bedew
Boy mirinê welat xweş e.*

Spartek

2- Hûn jî fikira xwe bi mijara “Welat şîrîn e” binivîsin.

Silêman û Têlman

- Merheba, Têlman!
- Roj baş, birayê Silêman!
- Tu çawa yî, baş î?
- Gelek spas, ez baş im. Tu çawa yî? - Sipas, ez jî baş im.
- Tu ku da diçî?
- Ez ber bi unîversîteyê diçim.
- Tu li wê derê dixwînî?
- Belê, ez di sinifa (kûrsa) sisêyan da dixwînim.
- Di kîjan parê da?
- Di para ziman û edebîyatê da.
- Di wê parê da tu hînî çî dibî?
- Ez hînî ebebîyata cîhanê dibim.
- Îro dersa te heye?
- Erê, piştî nîv saetê, dersa min dest pê dike.
- Di dersê da hûn çî dikin.
- Em diroka edebîyata cihanê dixwînin.
- Tu bi kîjan zimanan dizanî?
- Ez bi zimanê kurdî, rûsî, qazaxî û îngilîzî dizanim.
- Piştî xelaskirina unîversîteyê tu dê çî karî bikî?
- Ez ê li ser ziman û edebîyata kurdî lêkolînan bikim.
- Ez zaf şa me, bira.
- Oxir be, qurban!
- De bi xatirê te. ez ii te ra serkeftinê dixwazim.
- Gelek sipas!



RENGDÊR

Rengdêr ew parçeyên axavtinê ne ku bi awayekî giştî saloxên çawanî û çendîniya navdêran didin. Ango em bi xêra wan saloxên rewş, reng, teşe, taybetmendî û hwd yên kes û tiştan werdigirin.

Nimûne

- mirovê **dirêj**
- roja **xerab**
- kêra **tûj**
- keça **xweşik**
- kûçikê **reş**
- lawikê **jîr**
- gula **sor**
- rêya **xwar**
- jina **jêhatî**

mirovê **dirêj**



Rengdêr wekî ku di nimûneyên jorîn da jî dîyar dibin, di zimanê me da piştî navdêran tên. Loma divê em wan navdêran piştî navdêran bibêjin û binivîsin.

Nimûne: jina **qenc**

Ji ber ku "**qenc**" rengdêr e, em wê piştî navdêrê dinivîsin.

Rengdêrên sade: Rengdêrên sade ew rengdêr in ku ji bêjeyekê pêk tên.

Nimûne: hişk, nerm, reş, xurt, qelew, dirêj, kurt

nanê hişk, jina dirêj, pêlava reş, mêrê xurt, balîfa nerm, xortê kurt

Rengdêrên nesade: Rengdêrên nesade ew rengdêr in ku gava "bi-", "bê-" û "ne-" tên pêşîya bêjeyan, an gava "-dar", "-bar" û hwd tên paşîya bêjeyan pêk tên û bi hev ve tên gotin û nivîsîn.

Nimûne:

bêşekir, bêderman, bidar, bêav, neçê, nebaş, deyndar, xembar
çaya bêşekir, derdê bêderman, devera bidar, gundê bêav,
hevalê neçê, karê nebaş, mirovê deyndar, rewşa xembar

Li cihên vala rengdêran binivîsin.

qelega

çavê

hevalê

xwarina

pisîka

rêya

derîyê

gundê

bejna

xanîyê

kurê

keça

Wêneyên jêrîn û van rengdêran bigihînin

hev: qelew, hişk, lawaz, pîr, nerm, ciwan



Merivek diçe dikanekê,
dinêre ku her cûre çûk û bilbil û
şalûl û tûtîyan difroşin. Mêrik
dixwaze ji xwe re tûtîyekê
bikire. Berê xwe didê, sê qefes
û di her yekê de tûtîyek. Mêrik
tûtîyê pêşî nîşan dide
û ji dikandar dipirse:

- Ev bi çiqasî ye?
 - 1000 Dolar!
 - Çima hewqas buha?
 - Ji ber ku bi 12 zimanan dizane!
 - Baş e, eva duyem bi çi ye?
 - 2000 Dolar!!
 - Çima?
 - Ê ew jî bi 12 zimanan, bi kîmya, matematîk û bîyolojîyê jî dizane!
- Mêrik yê sisêyan nîşan dide û dibêje:
- Baş e, ev bi çi ye?
 - Ew bi 10 000 Dolarî ye!
 - Weeeehew! Çima?
 - Welleh ez jî pir bi hunerên wî nizanim, lê tiştê ku ez dizanim, ev herdu tûtîyên din jê re dibêjin "mamoste"!



Bersiva van pirsan binivîse.

Li dikanê de çi difrotin?	çûk, bilbil, şalûl û tûtî
Mêrik dixwaze çi bikire?	
Tûtîyê pêşî bi çiqasî ye û çima?	
Tûtîyê duyem bi çiqasî ye û çima?	
Tûtîyê sêyem bi çiqasî ye?	
Herdu tûtî ji tûtîyê sêyem re dibêjin çi?	

Jina nandar

Carekê rêwîyek diçe û di gundekî kurdan ra derbas dibe. Gelek birçî ye, loma dadigere malekê, dinêre ku mêrek dêw dikilê û digirî. Rêwî ji kevanîya malê ra dibêje:

- Xwişkê, ez birçî me, tu parîyek nan nadî min?

Jinik bi ser wî da hêrs dikeve, dibê:

- Ji vê derê, here, ez ê ji te ra nan ji ku bînim?

Rêwî vedigere ser mêrê jinikê:

-Tu çira digirî?

Dibêje:

- Jina min ez kutame.

- Ê dibê, jina te dîsa baş e, lê wexta jina min, min dikute, qet nahêle ez bigirîm jî. Jinik gava wan gilîyan dibihîze dibêje:

- Birango, vegere, bê nan û av ji mala min neçe.

Jinik rêwî tîne malê, xwarinê dide ber wî, mêrik nanê xwe têr dixwe, şikirbûna xwe ji Xwedayê dike û bi rê dikeve û diçe.

Li jêrê çend hevok hene, ji wan hevokan di kîjanê da rengdêrên sade hene, bidin kivşê.

- 1- *Li dibistanê xwendekarekî jêhati hebû.*
- 2- *Mamosteyê min gelek zana ye.*
- 3- *Ew hevaleyê devliken e.*
- 4- *Em di esilê xwe da arî ne.*
- 5- *Golikê wan belek e.*

☐
☐
☐
☐
☐

Li jêrê çend hevok hene, ji wan hevokan di kîjanê da rengdêrên nesade hene bidin kivşê.

- 1- *Bavê min zilamekî deyndar e.*
- 2- *Ez ji zû va evîndarê çavên te yên belek im.*
- 3- *Ew keçeka bedew e.*
- 4- *Dayika min gelek mirovhez e.*
- 5- *Li gundê me mirovên qenc pir in.*

☐
☐
☐
☐
☐

Li jêrê çend hevok hene, ji wan hevokan di kîjanê da rengdêrên nesade hene? Bidin kivşê!

- 1- *Tu merivekî rind î.*
- 2- *Şemam qîzeka bîaqil e.*
- 3- *Ew zarokeke delal e.*
- 4- *Tu nazdar î, dilgeş î û xwînşirîn î.*
- 5- *Hejar şaîrekî navdar e.*

☐
☐
☐
☐
☐

Sîr û hingiv li hev nakin.

Rojekê yekî ixtîyar rûdinê, sîr û hingiv tevî hev dike, dixwe.
Xortek tê bal wî û dibêje:
-Rojxêra te, kalê!
Kalê dibêje:
-Ser çava hatî, xortê delal.
Xort dibêje:
-Kalê, tu çima sîr û hingiv tev hev dikî dixwî, ne ewana hev nakin.
-Kalê dibêje:
- Bira li hev nekin, wê çi bi min bikin? Wê hevra rê herin.
Saetek derbas dibe, ew xort dîsa tê, dibîne kalê rûniştîye, ofe-ofa wî ye:
-Hewar, hewar ez mirim! Hewar, ez mirim! Werin, werin!
Xort nêzîkî wî dive û dibêje:
-Kalê, ne min ji te ra got, sîr û hingiv tev hev neke, ew hevra rê naçin, ew li hev nakin...
Kalê dibêje:
- Eh, kurê min, tu nizanî, ew baş hevra rê diçin, li hev dikin, şerê wan ew e ku, min ji ortê zû hilînin...

Spartek

Di nivîsa jorîn da çend rengdêran hilbijêrin û di deftera xwe da binivîsin.



1920 – 1994

Elîyê Evdirehman

Elîyê Evdirehmanê Momîn di sala 1920î da li gundekî Wanê bûye û di sala 1994an da çavên xwe li dinyaya gewrik girtiye. Gava ew hê şeş salî bû, malbata wî tevî êla Birûkîyan tê sirgûnkin.

Wî ji bo milletê xwe xebatên pir hêja kirine. Ew nivîskar, helbestvan û rojnamevanekî me kurdan yê pir hêja ye.

Wî heta dawîya temenê xwe ji bo çand, edebîyat û zimanê milletê xwe bê rawestan xebateka bêhempa kiriye. Ew yek ji nivîskarên rojnameya Rya Tezeyê bû. Navûdengê wî hem li nava kurdên Kafkasyayê, hem li nava kurdên her çar parçeyên Kurdistanê û kurdên welatên cîhanê yên dir belav bûye.

Wî bi berhemên wekî "Morof, Xatê Xanim, Gundê Mêrxasan, Dê, Hesreta Min û Gulistan"ê kitêbxaneyê kurdî dewlemend kiriye. Di berhemên wî da mirov bi awayekî eşkere rastî şer û mêrxasiyên kurdan tê. Kitêb, nivîs û helbestên wî wergerîyane çend zimanên bîyanî jî.



Rewşa jina kurd

Kofî, kitan,
Qolê zêran,
Mezer, kavtî,
Xala movî,
Bisk û kezî,
Bejna nazî,
Birûyê qeytan,
Çevê adan,
Sûret sor e,
Algevez e.
Navkelk zirav,
Gulî gulav,
Tilîyê mûmîn,
Levê medîn



Gerden gazê,
Mîna qazê.
Xizêm, gustîl,
Poz qerefil,
Bazin – xirxal,
Kenê cemal,
Tiving, qirme,
Halet, qeme
Eve rewşa Jina
kurda, Mal li
gund da, Wek
we tune, Li tu
erda...

Elîyê Evdîrehman

Spartek

Di ve helbestê da rengdêran bidin kivşê.

Li jêrê çend hevok hene, di van hevokan da kîjan rengdêr in binê wan xêz bikin.

- 0- Ew mirovekî dilrehm e.
1- Mehmûd mirovekî dilo van e.
2- Şemam keçeke porsor e.
3- Şamil yekî simbêlreş e.
4- Hesen mirovekî pir zana ye.
5- Gulîzer keçeke çilkezî ye.
6- Kendal yekî bejnî bilind û navmîlpehn e.
7- Xudêda zilamekî devliken e.

Peyvên pêşîyan

Xebat dur û cewahîrê benda ye.
Hesin germegerm tê kutan.
Darî xwar e, lê hosteyî rast e.
Kî dixebite, ew jî dixwe.
Şixulkarê xwe be, hezkirîyê benda be.
Kar, arê naxwaze.

Li jêrê çend hevok hene, di kîjanan da rengdêr tune bin, bidin kivîşê û nîşanê daynin ber wan.

- () 1- Refîk kurekî xebatkar e.
() 2- Eylaz mirovekî bêhnfireh e.
() 3- Narê keçeke bedew e.
() 4- Silêman dersê dixwîne.
() 5- Tîtal xortekî şîrîn e.
() 6- Ew xortekî jîr e.

Çend mijûlî ji bo xwendin û rastnivîsînê



Îro hewa xweş e. Duh sar bû. Niha germ e. Duh Têmirê bira li mala me bû. Ew zaf westîyayî bû. Me nan xwar. Hundirê malê germ bû. Derva jî germ bû.

Xwişka min ne li malê bû, çûbu mala cînaran. Li gundê me postexane tune ye, dibistan heye. Elî xwendekar e, bavê wî Ûsiv di nexweşxanê da ye. Birayê wî Hesen jî nexweş e. Le ez ne nexweş im. Ez li ser xwe me.

Mecîd ne hekîm e, ew dersdar e. Apê Cemîl li gundê xwe ye, diçe ber pêz. Duh tu vala bûyî? Na xêr, kar ê min zaf bû. Ez heta êvarê li cihê karê xwe bûm.

Mihemed duh êvarê hat mala we? Erê, hat mala me. Tu duh li kî derê bûyî? Duh çarşem bû, ez li fêrmê bûm. Nûrê li kêderê bû? Ew li gund bû. Gelo Nûrê li gund dimîne? Na, Nûrê li gund namîne, qewmê wê li wira ne, carna diçe û serîkî li wan dixê. Ewa li bajêr dimîne. Xaniyê wê yî erdê heye. Di baxçe da pamîdor û pincar çandîye. Mirîşka jî xweyî dike, nevîyê xwe ra hêka dişîne.

Çima hûn duh ne li dibistanê bûn? Na, duh yekşem bû. Roja yekşemê ji bo dibistanan tatîl e. Baş e, hûn li kîderê bûn. Duh ez bi hevalên xwe ra li nav daristanê bûm. We li wira çi dikir? Em ji xwe ra gerîyan, me hinekî lîst, paşê em vegerîyan malê.

Wezîr jî li ba we bû? Na Wezîr got, ez ê ese bêm, lê nehat. Paşê têt kir got, biborînin, hinek mêvanên min ji Moskvayê hatine, ez nikarim bêm.

Ez niha li dibistanê me. Ev ode, cîyê dersxana me ye. Eva mamosteyê me ye. Wexta dikeve hundir em ji pêş va radibin. Ew ji me ra dibê, zarno, roj baş! Em jî bi dengekî bilind dibêjin, rojbaş mamoste!

Spartek

Di nivîsa jorîn da diyalog bi xêzikên axaftinê nehatine diyar kirin. Vê nivîsê di defterên xwe da binivîsîn û xêzikên axaftinê di deverên lazim da bi cih bikin.



Xwestek yek, ziman cuda

Rojeke payîzê ya xweş bû. Çar heval bi hev ra derketibûn rêwîtiyê. Çend rojan bi rê ve çûn...

Carekê pê hisîyan ku pereyên wan dikin xelas bibin. Li cem her çaran sed tenge pere mabûn. Xortê ku pêşîyê diçe, bi zimanê qazaxî dibêje:

- Êy, **cigîtter** (xortno), bi wan perayan em ê kîlok **juzim** (tirî) bikin, bixwin.

Xortê kurd dibêje:

- Na xer, em ê kîlok **tirî** bikin, bixwin, paşê Xwedê kerîm e. Yê rûs dibêje:

Nêt (na), em ê kîlok **vinograt** (tirî) bikin.

Xortê faris dibêje:

- Na xêr, em ê kîlok **engur** (tirî) bikin.

Bi vî awayî her çar xort li hevdu nakin, dengê xwe bilind dikin. Bi hev ra rê naçin. Rêwîyek dengê wan dibihîze, tê tevî xeberdana wan dibe, wan diseqirîne û dibêje:

- Ka, pereyên xwe bidin min. Ez ê bi wan perayan xwastina we bînim cih. Rêwî perayan hildide, diçe kîlok tirî dikire. Li ber wan datîne û dibêje:

- Niha kerem bikin bixwin, xwastina we hat cih. Fikira we yek bû û xwasteka we jî yek bû, lê zimanên we cuda ne.

Xort hevdu hemêz dikin, tiriyê xwe dixwin. Paşê dikevîne rê û diçin.



Du pêkenok



Mişkek û çêlikên xwe li derve
digerîyan. Bi carekê de çavê
wê li pisikekê ket.

Mişk dest pê kir ewtîya.

– Ewt ewt ewt!

Gava ku pisîkê 'ewtîna wê bihîst,

got qey kûçik e, ji tirsê, ji wê derê revîya.

Mişkê jî ji çêlikên xwe re weha got:

– Yaaa zarokno, we jî bi çavên xwe dît ku çiqas bi feyde ye
ku meriv bi zimanekî biyanî zanibe!



Şevêkê li gund yek li derîyê yekî
dixe.

Xwedîyê malê dipirse:

– Ew kî ye?

Mêrik:

– Ez ji filan gundî me, mîvanê
Xwedê me, min qebûl bikin.

Xwedîyê malê hema derî vedike û dibêjê "bide dû min,
were" û wî dibe ber derîyê mizgefta gund û jê re dibêje:

– Fermo mîvanê Xwedê, a mala Xwedê ev e!

**Mehabad
sala 1946**



Mehabad (Rojhilatê welêt)


Weten

Ji weten çî qas dûr kevî,
Çî qasî bigerî li welatê der,
Bi hesreta wê tu yê paş da bêyî,
Çawa teyîr-tu tîn her bahar.

Bê weten meriv bêmal e, êtîm,
Bê weten reş in rojê emrê wî,
Weten gişka ra dayika miqîm,
Bê dayik zar birçî ye û tî.

Ax weten, weten heyra dilê min,
Tu nefesa min her saet û gav,
Bona navê te qet tune mirin,
Bi navê te nizamim tu saw.


Mîkaêlê Reşî



Qamişlo (Başûrê rojavayê welêt)



Hewlêr (Başûrê welêt)



Mêrdîn (Bakurê welêt)

Pirs

Di helbesta jorîn da çend rengdêr hene?

() heft () Çar () Deh () Yanzdeh () Neh



Hezkirina çivîkan

Li ser dara hewşa me gelek çivîk hene. Wextê ku ez dertêm dervayî, dibînim ku li ser şaxên darê çivîkên curbicur datînin.

Hinek ji wan reş in, hinek belek belekî ne û hinek jî reng zerî nin. Ew çivîkên ku reng reş in (reşbelek in) nikulên wan hinekî mezin in. Ew hêlîna xwe di dîwarên mala da, di qula da çêdikin. Lê yên ku belek belekî ne, hêlînên xwe li ser şaxên darê, di cîyên asê da çêdikin.

Ez ji wan gelek hez dikim, loma carinan ceh, genim direşînim bin daran, ew jî tîn û bi nikulên xwe dixwin. Carinan jî naxwin, tenê di nukulê xwe da digirin û difirin diçine hêlîna xwe. Wê wextê ez dizanim ku bi tenê ji bo çêlîkên (cûcîkên) xwe dibim, wekî den direşînim ber wan, diçe û dikeve devê çêlîkên wan jî. Ew ê jî di wextê da mezin bibin û bîn ser darê daynin û ji min ra bixwînin. Ez ê li dengên wan ên xweş guhdarî bikim û bextewar bibim. Ew çivîkên rengîn, biharê ji me ra tînin mizgîn.

Spartek

Di nivîsa jorîn da rengdêr hene. Çend ji wana binî xêzkirî ne, yên mayîn jî hûn bidine kivşê.

Rastnivîsara hejmaran

Bi saya hejmaran em dizanin mirov yan jî tişt çend in. Hejmar him bi nivîsê, him jî weke reqem tên nivîsandin. Hejmar bi kurdî weha tên nivîsandîn:

0 sifir
1 yek
2 du
3 sê
4 çar
5 pênc
6 şeş
7 heft
8 heşt
9 neh
10 Deh



11 yazdeh
12 duwanzdeh
13 sêzdeh
14 çardeh
15 panzdeh
16 şazdeh
17 hevdeh
18 hejdeh
19 nozdeh
20 bîst

100 sed
200 du sed
300 sê sed
400 çar sed
500 pênc sed
600 şeş sed
700 heft sed
800 heşt sed
900 neh sed
1000 hezar

yekem
duyem
sêyem
çarem
pêncem
şeşem
heftem
heştam
nehem
dehem

1. yekemîn
2. duyemîn
3. sêyemîn
4. çaremîn
5. pêncemîn
6. şeşemîn
7. heftemîn
8. heştamîn
9. nehemîn
10. dehemîn

Hejmarên dirêj weha têne nivîsîn:

789 Heftsed û heştê û neh.
4563 Çar hezar û pênc sed û şêst û sê.
23445 Bîst û sê hezar û çar sed û çil û pênc.

Spartek

Bi saya hejmarên jorîn hevokan ava bikin û di defterên xwe da binivîsin.

Nimûne: *Hesenê piçûk yazdeh salî ye.*

Hevnasî

Mecîd : Merheba!

Serdar: Merheba!

Mecîd: Navê min Mecîd e, navê te çî ye?

Serdar: Navê min jî Serdar e.

Mecîd: Ez pir şa bûm.

Serdar: Sipas dikim, ez jî pir şa bûm. **Mecîd**:

Tu li kîjan unîversîteyê dixwînî? **Serdar**: Ez li

Ûnîversîteya Abayê dixwînim. **Mecîd**: Ez jî li

wê ûnîversîteyê dixwînim, para ziman û edebiyatê (fîlolojî).

Serdar: Zaf baş e, ez jî di Fakultêya Têkilîyêr

Navneteweyî da me. Wê çaxê em ê hev bibînin.

Mecîd: De bi xatirê te.

Serdar: Di ser çavan ra hatî!



Saet çend e?

Mirovahîyê ji bo zanebûna wext saet îcat kiriye. Ji her kesî ra girîng e ku saetê, rojê bizanin. Saetên dîwaran û saetên desta hene. Di nava bajêr da jî saetên bircan hene. Em bi alîkarîya wan dizanin ka wext çî ye.

Berê saetên qûmê, yê avê û rojê hebûne. Mirovên berê, bi saya rojê wext tê derdixist. (Roj derket, bilind bû, çû ava) Wekî em bixwazin saetê hîn bibin, em weha bipirsîn:

- Saet çend e?

Heger berî nîvroyê be, yê hember me dibêje:

- Saet deh û panzdeh deqîqe ye.

Lê heger piştî nîvroyê be, weha tê gotin:

-15:45 (Saet panzdeh û çil û pênc e), yan jî şazde kêr panzdeh e.

Heger saet hatibe nîvî, wê wextê weha tê gotin:

- Saet şazdeh û nîv e (16:30), yan jî çar û nîvê piştî nîvroyê ye.



SAET

Saet yek	: (01:00)	Yek û nîv	: (01:30)
Saet dudu	: (02:00)	Dudu û 15 deqîqe	: (02:15)
Saet sisê	: (03:00)	Sê û bîst	: (03:20)
Saet çar	: (04:00)	Çara û pênc	: (04:05)
Saet pênc	: (05:00)	Pênc û deh	: (05:10)
Saet şeş	: (06:00)	Şeş û çil /heft kêmbîst	: (06:40)
Saet heft	: (07:00)	Heft û pêncî /heşt kêmbîst	: (07:50)



Yek kêmbîst	: (12:53)
Du kêmbîst	: (01:42)
Sê kêmbîst	: (02:45)
Çar kêmbîst	: (03:40)
Pênc kêmbîst	: (04:48)
Şeş kêmbîst	: (05:47)
Heft kêmbîst	: (06:36)


Bersiva van pirsan bidin

- Rojek çend saet in?
- Saetek çend deqîqe ne?
- Deqîqeyek çend sanîye ne?


Cîyên vala tijî bikin

- Trên di saetda radibe.
- Em piştî nîvdikevin rê.
- Gundê me ji viradûr e.
- Afto di saetda hatîye vira.
- Êvarê di saet were mala me.
- Ez îşev di saet radizê.

deh û nîvan
çar û çilî da
Şeşan
saetê
du saetan
heştan da



Salek 365 roj e.
Salek 52 hefte ne.
Rojek 24 saet e.
Saetek 60 deqîqe ye.
Deqîqeyek 60 saniye ye.
Saniyeyek 60 salîse ye.



Welatê me Kurdistan e



Kurdistan

Welatê me Kurdistan e,
Cî-miskenê me kurdan e,
Welat me ra ruh û can e,
Milet têda bira ne.
Welatê me pir şîrîn e,
Temam mêng in û zevî ne,
Qiz-xortê wê tev cindî ne,
Eslêd xwe va arî ne..

Kurdistana me zeynet e,
Cimeta we pir hurmet e,
Temam qedr e û qîmet e,
Welat me ra cinnet e.
Welatê me Kurdistan e,
Ci-miskenê me kurdan e
Miletê wê tev bira ne,
Sulheddin* bavê kurdan e!


Mecîdê Silêman

Kurdistan

Em kurd in. Navê welatê me Kurdistan e. Navê zimanê me kurdî ye. Nifûsa kurdan ji 40 milyonî pirtir e. Mezinahîya Kurdistanê 550 000 km² ye. Kurdistan di navbera Tirkîye, Îran, Iraq û Sûrîyeyê de hatiye dabeşkirin.



Zimanê kurdî zimanekî kevn e, rehê wê digihîje heta 2500-3000 sal berê, zimanê herî kevn yê kurdan MEDÎ ye. Kurdî ji çend zaravayan pêk tê. Zaravayê herî mezin kurmancî ye. Kurmancî li her çar parçeyên Kurdistanê tê axaftin.



Li Kurdistanê çemên mezin Dicle û Ferat in. Bilindtirîn çiyayê Kurdistanê çiyayê Agrîyê ye. Agrî 5166 m. bilind e.

Li Kurdistanê genim, ceh, nîsk, birinc, nok tîn çandin. Kurdistan ji alî sebzeyan ve jî dewlemend e. Nimûne: tomat, balcan, îsot, fasûlye, bamîye, xas, baxdenos, kelem, tivir, gêzer, pîvaz û hwd.






Fêkîyên Kurdistanê jî navdar in: Xox, hinar, hirmî, tirî, hêjîr, sêv, tû, mişmiş, gêlaz, zebeş, gundor, gûz, behîv li Kurdistanê digihêjin.



Li Kurdistanê gelek cûreyên ajelan tên xwedîkirin: Mîh, bizin, beran, nêrî, berx, karik, mange, ga, golik, hêştir, hesp, ker, pisîk, kûçik.



Li Kurdistanê ji bilî van heywanên kedî, yên kovî jî hene, wekî hirç, pezkovî, gur, rovî, mar, dûpişk, jûjî û hwd.

Mirov havînê li Kurdistanê sebze û fêkîyan hişk dike, zivistanê û biharê dixwe.



- Bersiva van pirsan binivîse.

Nifûsa kurdan çi qas e?

Mezinahîya Kurdistanê çi qas e?

Kurd herî pir li kîjan parçeyê
Kurdistanê dijîn?

Kurdistan di nava kîjan dewletan de
hatiye dabeşkirin?

Zimanê herî kevn yê kurdan kîjan e?

Zaravayê kurdî yê herî mezin kîjan e?

Navê roja kurdan ya neteweyî çi ye,
ku 21ê Adarê pîroz dîkin?

Navên sê fêkîyên ku li Kurdistanê digihêjin binivîse.

- 1.....
- 2.....
- 3.....

Navên sê sebzeyan binivîse ku li Kurdistanê digihêjin.

- 1.....
- 2.....
- 3.....

Navên sê heywanên kedî binivîse ku li Kurdistanê tên xwedîkirin.

- 1.....
- 2.....
- 3.....

Navên sê bajarên Kurdistanê binivîse.

- 1.....
- 2.....
- 3.....

LÊKER

Lêker ew parçeyên axaftinê ne ku tevger, rewş, bûn, proses û hwd dîyar dikin.

Nimûne:

Berfîn kitêbê dixwîne.

Narê baxçe paqij kir.

Gulîzerê sêv berhev kirin.

Heso xwarinê dixwe.

Komputera min dixebite.

Lêker bi awayekî giştî:

- Lêkerên sade
- Lêkerên nesade

Hemû cureyên lêkeran ji parçeyên axaftinê yên din cuda tên nivîsîn, loma divê em lêkerên sade jî ji parçeyên axaftinê yên din cuda binivîsin.

Ev lêkerên sade ne: bûn, çêrîn, êşîn, barîn, revîn, xwarin, xwendin, çûn, hatin, nivîsîn, kuştin, girtin, kenîn, şandin, dotin û hwd.

Lêkerên sade

Nimûne:

Ez kurd im.

Tu kurd î.

Ew kurd e.

Em kurd in.

Hûn kurd in.

Ew kurd in.

Mange diçêre.

Diranên wî diêşin.

Baran dibare.

Em dikenin.

Ez direvim.

Ew xwarinê dixwe.

Em hatin.

Hûn çûn.

Ez dinivîsim. Em dixwînin

Wan ew kuşt.

Te ez girtim.

Lêkerên nesade

Lêkerên nesade

1. Bi hev ve tên nivîsîn
2. Ji hev cuda tên nivîsîn

Lêkerên nesade yên bi hev ve tên nivîsîn

Nimûne

dagerîn

dagirtin

daxistin

daketin

dakirin

hilgirtin

hlkirin

hilgirtin

hilkişîn

hilqetîn

rakirin

raxistin

rûniştin

raketin

rabûn

ragirtin

raçandin

rahiştin

rabihurîn

ramedîn

vebûn

vegerîn

vekirin

veqetîn

vexwarin

veketin

veniştin

vêxistin

wergerîn

wergirtin

Lêkerên nesade yên ji hev cuda tên nivîsîn

Nimûne

av dan

bang dan

bar kirin

guh dan

bi cih kirin

bi hev ketin

bi ser ketin

dest pê kirin

hîn bûn

ji ber kirin

nimêj kirin

şû kirin

pê ketin

şahî kirin

tol hildan

Mar û rûvî



Rojekê mar û rûvî dibin destbirakên hev. Bi hev ra pir digerin. Paşê dest bi dijminatîya hev dikin. Yek dixwaze ecêbekê bîne serê yê din. Yek, bi yekî nikare. Ew wextekê diçin ber avekê, dixwazin derbasî alîyê avê yê din bibin.

Rûvî dibêje:

- Bira, tu dê derbas bibî, lê ez nikarim. Ez nayê. Tu derbas dibî, derbas bibe. Here, lê me gelek emek bi hev ra kişandiye, gelek şixul tev hev kirine, tev xwariye, tev vexariye. Were berî çûnê em emekên xwe li hev helal bikin. Devê xwe bîne em hevdu paç bikin, paşê tu diçî, biçî, şixulê te ye, hemin ez nayê.

Mar devê xwe dirêjî ber devê rûvî dike. Rûvî serê mar dike nava diranên xwe û diqetîne. Di pey wê yekê ra çendek derbas dibe, laşê mar rast dibe.

Rûvî dibêje:

- Bira, a biratî weha rastîyê dixwaze.

Li jêrê çend hevok hene, ji wan hevokan di kîjanê da lêkerê sade hene, bidin kivşê.

1- Rojname derket.

2- Birayê min avtoyek da kirînê.

3- Şamîl çar kitêb dan çapkirin.

4- Mêvanên me hatin.

5- Ew piştî civînê çû.

6- Îro ji me ra kovar anîn.

7- Jîyana min çîrok e.

8- Ez ji kilaman gelek hez dikim.

9- Ji min ra paste (tort) hatiye çêkirin.

10- Ordîxan diranên xwe dane çêkirin.

☐
☐
☐
☐
☐
☐
☐
☐
☐

Di hevoka jêrîn da bikin hevokên neyînî.

-Cindî kitêbê dinivîse.	Cindî kitêbê nanivîse.
-Dewrêş sêv anîn.	
-Ehmed qîmetê xwe zane.	
-Fetî karê xwe hez dike.	
-Etar laqirdîya dike.	
-Mûsa li dibistanê xwendîye.	
-Ezîz rênçberîyê dike.	
-Egît serwêrîyê dike.	
-Çerkez gelek bîranîn hiştine.	

Hevokên jêrîn bikin hevokên pirsyarî.

-Gulê hat.	Çima Gulê hat?
-Gulîzer çû.	
-Gulbahar ket. -	
Şemam rûnişt.	
-Besê difikire.	
-Têlî hilkişîya.	
-Zerê razaye.	
-Êmîne digirî.	
-Medîne diçe.	

Peyvên pêşîyan

Şixul bi aqil bi pêş da diçe.
Av rêya xwe dibîne.
Aqil ne di emir da ye, di serî da ye.
Xeber hene zêr in, xeber jî hene ava çêr in.
Hesp siwarê xwe nas dike.

Çand û dîroka me hebûna me ye

Fikira zanyaran di heqê çand û dîroka kurdan da

Gelek zanyarên navdar û eyan û rêwîyên bi nav û deng, yê sedsalên bihurî di heqê kurdan da, kultura wan ya kevnar, zargotina wan ya dewlemend da fikirên zêrîn gotine. Akademik û rojhilatzanê eyan H. A. Orbelî di pêşxebera berevoka "Li ser heykelên dewrana Rûstavêlî" da dinivîse, wekî kurdan ewledên xwe di bin navên azerî, faris, tirk, ereb û ermenîyan da winda kirine, ewled, navê kîjana çawa şaîr, zanyar, sazband, egît, serleşkerê bi nav û deng dîroka gelan xemilandine û dixemilînin.

Ulimdarekî din N.Y. Marrê bi nav û deng bi dilovanî nivîsîye, wekî kultura kurdan di nava çanda Rojhilata Nêzîk û Navîn da gelek bikêrhatî û kardar bûye. Ew tê ser wê fikirê wekî maneya wê yekê ew azadîhezîya kurdan e, ya ku di folklor, kilam û reqasên wê da zelal tê kivşê.

Hîmdarê edebîyata ermenîyan ya nû X. Abovyan, yê ku pir caran bûbû mêvanê kurdan û pak zanibû rabûn-rûniştina wê cimaeta kevnar, di heyne xwe da nivîsîye, wekî folklorê kurdan bi pêş da çûye û gihîştîye dereceya herê bilind. V. F. Mînorskîyê rojhilatnas jî guhdarîya ulimdara dikişand ser pîrsa edebîyata kurdan ya dewlemend û pîrhêl.

Yekî din jî heye ku navê wî ulimdar Blaû bû û bi pîrsa çanda kurdên Îranê va mijûl dibû. Wî jî dinivîsî ku qebîleya kurdan ya herî paşdamayî jî ji alîyê kilam û bi miqaman ve dewlemend e. Aha, ew bûye mane, wekî gelek ulimdarên di heyne xwe da curêyên zargotina kurdan berhev kirine, nivîsîne û heyr û hijmedkarê wê mane. G. Sirvanstyanê ku berhevkerê folklorê ermenîyan yê eyan e, di sala 1904an da nivîsîye, mirovê ku bi zimanê kurdî pak bizane û folklorê kurdan berhev bike, ew dikare karekî mezin bide ulim û zanîstê...

Spartek

1. *Di nivîsa jorê da lêkerên hevedudanî bidin kivşê.*
2. *Ji van lêkerên hanê hevokan ava bikin û di deftera xwe da binivîsin: dadan, badan, vekirin, wergirtin, hildan, veniştin, rabûn, lêkirin, jêkirin, çêkirin*

Di hevokên jêrîn da binê lêkerên hevedudanî xêz bikin.

Nimûne: Ev xwendekar hevalê xwe hildide.

- 1- *Min barê giran rakir.*
- 2- *Ew berbi çîyê hilkişya.*
- 3- *Hesen berjêr daket.*
- 4- *Ewî genim rijand.*
- 5- *Asîkê kilam gotin.*
- 6- *Qazî em sûcdar dîtîn.*
- 7- *Ez dersên xwe dixwînim.*

Peyvên pêşîyan

**Ez axa, tu axa kî dê golikan bibe nav baxan.
Masî di behrê da mezin dibin.
Ga bi cila nas nakin.
Ez li zikê wî dixim, ew dibêje wey li min pişt.
Werîsê derewan kin e.
Ezabê cînarîyê ezabê giran e.
Şêr şêre, çi jin e, çi mêr e.
Dirba ku nan dibire, şûr nabire.**

Di hevokên jêrîn da lêkerên nesade nîşan bikin.

- | | |
|-----|---|
| () | 1- <i>Ji germa ez şewitîm.</i> |
| () | 2- <i>Me çêleka xwe ser jê kir.</i> |
| () | 3- <i>Osman bilûrvan e.</i> |
| () | 4- <i>Wî em betal kirin.</i> |
| () | 5- <i>Resûl hilkişîya ser xanîyê xwe.</i> |
| () | 6- <i>Wê xwarin çêkir.</i> |
| () | 7- <i>Ez avê vedixwim.</i> |

Têderxistinok

Bûzê dişkênim,
Zîv derdikeve,
Zîv dişkênim,
Zêr derdikeve.



Ew çî ye?

khê

Berev dikî
barê ga ne,
datînê erdê
weke çîya ne



Ew çî ye?

nko

Di hevokên jêrîn da lêkerên sade bi cih bikin.

1- Wî heywan.....?

2- Kê pamîdor?

3- Te ji bavê xwe dirav.....?

4- Dildar ji kurê xwe ra çî?

5- Kê li dîwanê.....?

Wî heywan anîn?

.....?

.....?

.....?

.....?

Di hevokên jêrîn da lêkerên nesade bi cih bikin.

1- Dayikê lampe

2- Emîneyê derî

3- Wî kurtikê xwe

4- Têlmanjorê.

5- Kevanî xwarinê

6- Ewrên tarî ji ser me.....

7- Min şiklê kevin.....

Dayikê lampe vexist.

.....

.....

.....

.....


.....

.....

Skender û Dîyojen

Rojekê ji rojan Skenderê Mezin meraq kiriye ku Dîyojenê filozofê navdar bibîne, lewra navê wî di nava milet da ji zû da eyan bû. Peyayên xwe hildide û diçe ku Dîyojen bibîne.

Wexta ku Skenderê Mezin tevî peyayên xwe tê, wê gavê Dîyojen li kêleka cemekî bûve.



Li ber tavê rûniştiye. Skender nêzîkî wî dibe. Lê ew ji cîyê xwe ranabe.

Skender dibêje:

- Ez Skenderê Mezin im!

Fîlozof Dîyojen qet beşera xwe naguhêze û dibêje:

- Ez jî Dîyojen im!

Skender metilmayî dimîne.

Ji ber ku hetanî niha kesî li pêşberî wî usa nekiribû. Ew rastî ke hatiye, teva rêzdarî û hurmet nîşanî wî kirine. Jî ber kû, her kes ji wî ditirsîya.

Skender ji Dîyojen dipirse:

-Tu ji min natirsî?

- Na, çima tu zilamekî xedar î?

- Her kes ji min ra dibêje "tu zilamekî baş î".

- Wê wextê ji bo çî ez ê ji te bitirsim?

Gunehê Skender bi Dîyojen tê, dixwaze alîkarîyê bidê. Dibêje:

- Xuya ye ku tu zilamekî feqîr î, belengaz î, tiştekî te tune ye. Tu çî dixwazî ji min bixwazî, ez hikumdar im, ez ê bidim te.

Dîyojen lê dizîvire û dibêje:

- Sîyê neke, ez wekî din tiştekî ji te naxwazim!

Spartek

Rasthatina Skender û Dîyojen bi gilîyê xwe qisekin, maneya wê şirovekin.

Bûk û stûn



Rojekê xwesîyê ji bûka xwe ra got:

- Keçê, keçê ka rabe, hinek ar ji têrê derxe bîne. Têr jî danîbû pişt stûnê.

Bûk jî rabû çû destekî xwe di vî alîyê stûnê ra bir, destê din jî di wî alîyê stûnê ra bir, stûn ket navbera

her du destên wê. Kulma xwe tijî ar kir, xwast ku bîne, stûn bi her du destê wê ve asê bû. Ne dibû ku ar vala bike, destê xwe ji stûnê berde, ne jî destê wê ji stûnê derdiket.

Xwesîya wê rabû çû gazî navsereyên gund kir, got:

- Werin, destên bûka min li stûnê asê bûne, venabe.

Navser hatin. Aqil avêtin ser aqila û gotin:

- Bînin em destên wê bibirin ku bûkê jê xêlas bibe.

Yekî birekek anî û danî ser zenda bûkê ku destê wê bibire, bûkê ji nişkê va destê xwe revand, arê destê wê rijîya erdê û destê wê ji stûnê derket. Navsereyan bi hev ra kirin qîrîn:

- Wey, şikir ji Xwedayî ra, bûka me çî bîaqil e...



Lo lo Bekiro

Lo lo Bekiro,
Çilke qendo-şekiro,
Min pey diza war kiro,
Diza tirê keviro,
Min hilda qendo-şekiro.

Cafere

Cafere qelender e,
Hespê bozê zîn ser e,
Ca serê Sîpanê Xelatê,
Hewara xûşka xwe werê.

Tiştonek

Pişo, pişo nergîzo,
Çu ber avê dengizo,
Ne gur dixwe, ne dizo.

Şev xemilî,
Ro betilî.

Ew çî ye?

kîşip

Ew çî ye?

ariç

Hespê boz,
Afirê quloz,
Pêbengê lê,
Çivta davê,
Sor dixwe,
Spî davê. Ew çî ye?

mineg û şa

Tiştêkî min heye,
Dev dirêj e,
Xwîn dirêj e,
Dest davêjim ê,
Ber davêj e.
Ew çî ye?


gnivit

Bihar

Quling kişyan, çîya hesyan,
Gelîyêd kûrîn kirine xuşîn,
Berf hilkişyan, av rakişyan,
Çem xulxulîn, ewr gimgimîn.

Kulîlk şîn bûn û dil şa bûn,
Der û çîman gîşk bûn zozan,
Kerî rêz bûn hevraz hêlbûn,
Şivan, gavan çîyê bûn mêvan.

Fêrîkê Usiv



Pirs

Di parçeyê jorîn da çend lêker hene?

() Çardeh () Neh () Deh () Yazdeh () Sêzdeh

Zira kerê, lota devê



Di mêrgê deve û ker,
Diçêrîyan ser bi ser,
Goştê wan tev bûye bez,
Ne sewal û ne jî pez.

Mexel bûne ber li hev,
Bi ser wan da hatî şev,
Devê go: tira mi tê,
Kerê go: zira mi tê.

Devê zû gote kerê,
Pir nêzîkî me ye rê,
Dibî hebin rêbiwar,
Wê me bajone bin bar.

Ez ne xurt im wek cara,
Pişt kul bûye ji bara,
Ti jî wek min bike tir,
Nebî, bikî zire-zir.

Lê ew kerê têr gîya,
Sivik rabû ser pîya,
Heta jê hat kire zir,
Ew çol ji deng tije kir.

Kerwanek diçû di rê,
Çawa hat dengê kerê,
Yekî ji nava kerwan,
Barê kerê wî giran.

Go: wa, dengê kerê tê,
Vaye li vê derê tê,
Du kes derketin ji rê,
Berê xwe dan cem kerê.

Çawa gihane mêrgê,
Dîn ku ker û deve lê,
Ew herdu dane ber xwe,
Li wan kirin barê xwe.

Xuyaye ker nezan bû,
Barê wî pir giran bû,
Xwe avête ser qadê,
Nema diçim bi xwedê.

Çiqas lêdan wan bi dar,
Kerê xwe kir wek mirar,
Barê wî jî dan devê,
Ma wê çi bikî wê şevê.

Demek dî jî raborî,
Bû firte-firta wî kerî,
Wê şevê û wê revê,
Ew jî danîn ser devê.

Rewşa devê bû nexweş,
Bu zirzira kerê reş,
Devê jêre gazî kir,
Go: te ya xwe bi min kir.


Heta lota mijî bê,
Tê bibêhî wê ça bê...

Cegerxwîn

Pirs

Şaîr bi serê devê û kerê aqilbendî û beaqilîya mirovan çawa dide kivê?

ZIMANÊ KURDÎ



Kurd jî wekî faris, belûç, efxan, tacik û hwd miletekî îranî ye. Zimanê kurdî di nava malbata zimanên hîndo-ewropî de dikeve nav zimanên hîndo-îranî û di nav vê malbatê de jî dikeve nav beşê zimanên îranî.

Yekem car kurdî kengî hatîye nivîsîn baş nayê zanîn, lê **avestayî**, **medî**, **partî**, **pehlewî** wek zimanên îranî tên zanîn, ev zimanên hanê di gelek waran de bi qasî ku nêzîkî farisî, belûcî, tacikî ne, hewqas jî nêzîkî kurdî ne.

Ji ber wê yekê meriv dikare van zimanan wek zimanên bav û kalên ziman û zaravayên kurdî jî bihesibîne.

Dema ku weha be, wê demê nivîsa kurdî ya herî kevn **avestayî** ye, **partî** ye, **medî** ye heta meriv dikare bibêje **pewlewî** ye jî. Lê gelek dîrokzan û zimanzan dibêjin ku çavkanîya zimanê kurdî zimanê **medî** û **partî** ye.



Tekstê kurd jî pirtûka Avestayê

Zerdeşt medî ye, pêxemberê zerdeştîyê ye. Navê pirtûka wî ya pîroz **Avesta** ye. Tekstên avestayê yên pêşîn bi zimanê **medî** hatine nivîsîn (700 sal BZ).

KURDÎ	MED	AVESTA	
estore, hesp	aspa	aspo	
az, ez	azam	azem, azim	
raşt, rast	raşta	rasta	
sipa, seg, se	spaka	spa	
şaristan, şehir	xşasra	xşasra(hêz)	

Bersivê van pirsan binivîsin!

Kurdî di nav kîjan malbata zimanan de ye?

Di nav vê malbatê de dikeve nav kîjan beşê zimanî?

Îro zimanê herî nêzîkî kurdî kîjan e?

Kîjan zimanên kevn bav û kalê zimanê kurdî ye?


Li gor dîrokzanan çavkanîya zimanê kurdî kîjan ziman in?

Navê pirtûka Zerdeşt çi ye?

Avesta bi kîjan zimanî hatîye nivîsîn?

HESP û RAST bi zimanê avestayî û medî çi ye?

KURDÎ Û ZARAVAYÊN WÊ



Navê zimanê me kurdî ye. Kurdî ji gelek zaravayan pêk tê; kurmancî, soranî, zazakî, hewramî, lurî.

Zaravayê herî mezin kurmancî ye.

Kurmancî li her çar parçeyên Kurdistanê tê axaftin.

Soranî û lurî li rojhelat û li başûrê Kurdistanê tê axaftin.

Zazakî li bakurê Kurdistanê tê axaftin.

Hewramî jî li başûr û rojhilatê Kurdistanê tê axaftin.

Li başûrê Kurdistanê ji kurmancîyê re dibêjin behdînî, li rojhilatê Kurdistanê dibêjin şikakî.

Kurmanc û zaza bi alfabeya latînî dinivîsin.

Soranî û hewramî û lurî bi alfabeya erebî tên nivîsîn.

Kurmancî	Soranî	Zazakî	Hewramî
Gundê me	Dêyekey ême	Dewa ma	Dega ême
Hewa wî pakij e	Heway pakij e.	Hewayê ci pak o.	Huwaş weşe ne.
Xweş e	Xoş e	Weş o	Weşe ne
Ez şivan im.	Min şivan im.	Ez şiwane ya.	Emin şiwane nan.
Birayê min gavan e.	Birakem gawan e	Birayê mi gawan o.	Birakem gawan en

Bersivên van pirsan binivîsin		
1	Navê zimanê me çi ye?	
2	Navê sê zaravayên kurdî binivîse.	
3	Zaravayê herî mezin kîjan e?	
4	Soranî bi kîjan alfabeyê tê nivîsîn?	
5	Soranî û lurî li kî derê tê axaftin?	
6	Li rojhilatê Kurdistanê ji kurmancî re dibêjin çi?	
7	Hewramî li kîjan beşê Kurdistanê heye?	
8	Li başûrê Kurdistanê ji kurmancî re dibêjin çi?	
9	Li bakurê Kurdistanê kîjan zarava hene?	
10	Kurmancî û zazakî bi kîjan alfabeyê tên nivîsîn?	
11	Kîjan zarava li her çar parçeyên Kurdistanê tê axaftin.	

Van hevokan bi zaravayên din binivîse (Li nivîsa **Kurdî û Zaravayên Wê** binêre)

Kurmancî: Gundê me.	Soranî:
Soranî: Min şîwan im.	Kurmancî:
Zazakî: Birayê mi gawan o.	Kurmancî:
Kurmancî: Xweş e	Hewramî:
Zazakî: Dewa ma.	Kurmancî:
Hewramî: Birakem gawan en.	Kurmancî:



Heqî winda nabe!

Carekê gundîyek çend pezan dide pêşîya xwe, diçe bajêr wekî bifroşe. Bi rê da mêrikek rastî wî tê dibêje:

- Oxir be bira, tu ku da diçî? Gundî dibêje:

- Ez pezê xwe dibim bajêr, wekî bifiroşim.

Mêrik dibêje:

-Weleh, ez bikirê pezê te me, ez ê pezê te bikirim.

Li hev dikin, mêrik ji gundî ra dibêje:

- Heqê pêz ez niha nikarim bidim, li cem min ew qas pere tune ye, hema em gihîştine bajêr, ez ê pera bînim bidim te.

Çûn gihîştin bajêr, gundîyê reben kir û nekir wî heqê pezê wî neda û got:

- Na û na, ev pezê min e, pereyê çî? Tiştê çî? Tu derewan dikî!

Çûn cem qazî. Qazî şikayeta gundîyê reben bihîst û got:

- Şahidên te hene?

Got:

- Na.

Got:

- Wexta we bazar dikir, kî hebû li bal we? Got:

- Qet tu kes tune bû.

Qazîyê got:

- Li derûdora we çî hebûn?

- Xêncî zinarekî, tişteke tune bû.

- Tu dikarî herî wî zinarî bînî?

- Çima na! Vegerîya, kir ku here, mêrikê ku pez jê kirîbû kenîya.

Qazî vegeriya û jê pirsî:

- Çima tu dikenî?

- Qazî, ev bêaqilê reben dê çawa here û wî zinarî bar bike bîne? Loma jî ez dikenim.

Qazî got:

- Wekî usan e, gilîyê gundîyê rast e. Heger te nedîtîye, lê tu cîyê zinar ji ku dizanî?

Qazî pereyan ji mêrikî distîne û dide yê gundî..

Spartek

Qazî heqî û neheqî çawa safî kir?

Di nivîsa jorîn da çend lêker binî xêzkirî ne, yê din hûn binî xêz kin.

Xeberdana bi têtêfonê

- Alo, ew kî ye?
- Navê min Ezîz e. Ez li mala Evdo digirim. Gelo ev têt ya wan e?
- Erê, ez kurê Evdo me, navê min Mihemed e.
- Kurê min, bavê te li malê ye?
- Erê apo, bavê min li malê ye.
- Ka gazî bikê, çira min!
- Vê gavê, ez ê gazî bikim. Deqîqeyekê...
- Apê Ezîz, salamû aleykim, tu çawa yî, baş î?
- Kurê min, ez zaf razî me, baş im. Berî niha wî kurikê te têt hilda, welehî min dengê wî nas nekir.
- Êêê, apê Ezîz, ev çend sal in ku te ew nedîtîye. Xort mezin bûye, bûye zilam.
- De îşselah, Xwedê temenekî direj bidê.
- Gelek spas, Xwedê te ji me kêr neke, apê min ê delal.
- Kurê min, ev çend car in ku ez li têla we dixim, venabe, çima gelo?
- Apo, weleh ez nizanim, ez wekî dizanim têla me dixebite. Zarok pir diaxivin.
- De baş e kurê min, min ji zû da li halê we nepirsîbû, min got ka halê we çî ye?
- Apê Ezîz, pir spas! Halê me baş e, qe meraq nekin, zarok jî mezin bûne, şikir diçine dibistanê.
- De şikir, şikir ji me ra carinan li têtê bixin.
- Li ser çavan.
- De bi xatirê te.
- Oxir be, wekilê silavan be.




Dîroka telefonê

Bi wêneyan



Li van neh (9) wêneyên jêrîn binêrin û li ser dîroka telefonê bifikirin û bi dû ra bipeyivin.



Wêne:1



Wêne:2



Wêne:3



Wêne:4



Wêne:5



Wêne:6



Wêne:7



Wêne:8



Wêne:9

Mijûlîyên cimaetê

Qencî

Yekî ji aqilbendeke pirsî:

- Gelo mirov di bîra xwe da çi xwedî bike û çi ji bîr bike, wê baş be?

Aqilbend gotê:

- Heger yekî ji te ra qencî kiribe, wê yekê ji bîr neke. Lê heger te ji yekî ra qencî kiribe, wê yekê ji bîr bike.

Cudakirina qenc û xiraban

Yekî ji kûçkekî pirsî, got:

- Çira ser rêya me ketî?

Got:

- Wekî qenc û xiraban ji hev cuda bikim.

Got:

- Tu dê wan çawa ji hevdu cuda bikî?

Got:

- Ew mirovên qenc ji min ra dengê xwe nakin, dihêlin diçin, lê yên xerab ne ser tu, ne ber tu kevîran diavêjine min.

Hevalê qenc

Yekî gote yekî:

- Tu dê çawa bizanî ku hevalê te qenc e, yan xerab e?

Got:

- Heger li serê rê be, heger li malê be, ew hevalê ku şixulê xwe nake, lê li hêvîya hevalê xwe dihêle ew xerab e.

Ez ji bona xwe dibezim...

Nêçirvan tajiye xwe berdide dû kergoşkê (kewrîşkê). Tajî nikare kergoşkê bigire. Tajî ji kergoşkê dipirse:

- Ew çawan e, ez ew qasî dibezim, direvim, lê nikarim te bigirim.

Kergoşk dibêje:

- Ji ber ku ez ji bo xwe direvim, lê tu ji bo hinekan...

Spartek

Van mijûliyan bixwînin, maneya wan şirove bikin.

ÇARÎN

Bihar e berf dihele,
Bedew e dil dihele,
Ji qîrîna erş û ezmîn,
Hişyar dibin kulîlkên bîn.

Dinya şîrîn dinya jehrîn,
Hinek şa ne, hinek digrîn,
Gelo çima dilê însîn,
Hêvîdar e ji bo mizgîn?

Carna şa dike dilê însîn,
Carna dike kul û birîn,
Gelo kengê wê aza be,
Kurdistana me ye rengîn?



Tu hesreta dilê beng î,
Tu melhem î hezar reng î,
Çavê çavê te dikeve,
Min ji tirê dinya ev e...

Tebyet sir e, sira salan,
Ew ecêbê sal û zeman,
Tu kesî ra nabin eyan,
Tu kes nizan jana dilan,
Xêncî Sîyabend, Memê Alan.

Bavê Nazîr

SENTAKS (RÎSTESAZÎ)

Sentaks (ristesazî) zanista sazkirin û çêkirina hevokan e. Ew şirove dike bi çi teherî hevok ji xeberan çêdibin, çawan bendên xeberan li hev tînin, çawa hevok bi hev ra tîne girêdanê û çend cûrê hevokê di xeberdanê da hene.

Li hev hatina xeberan û çêkirina hevokan

Hevok çi ye?

Hevok ji xeberan çêdibin. Çaxê em xeber didin, em fikra xwe bi xeberan dibêjin. Alîkarîya bi hev ra girêdana komên xeberan fikir temam tê gotinê. Hevok ji xeberekê, yanê ji çend xeberan tê avakirinê û fikreke temam nîşan dide.

Mesele:

Ez kurekî bîaqil im. Êvarê ewrawî ye. Bahar e. Do bi şev hewa pir germ bû.

Nava hevokê da navên taybet (mexsûs), welat û bajaran bi tîpên gir tîne nivîsarê.

Mesele:

Îro Hesên di îmtîhana xwe da pênc sitand. (Hesên navekî taybet e, lema bi tîpa gir tîne nivîsîn.)

Xuşka min li Qirgizistanê dimîne. (Qirgizistan navê welatekî ye, lema bi tîpa gir tîne nivîsîn.)


Em bi neferê mala xwe va li Almatiyê dijîn. (Almatî navê bajarekî ye, lema bi tîpa gir tîne nivîsîn.)

Çîyayê Agirî (Ararat) havîngeha kurda ye. (Navê çîyayê Agirî bi herfa gir tîne nivîsîn.)

Navê derya (behr) û okyanûs û parzemînan (qita) jî bi herfên gir tîne nivîsandin.

Mesele: Behra Reş, Okyanûsa Hîndê, Amêrîka, Awrasiya û yêd din.

Dîyar ji xewê hişyar dibe



- Roj baş dayê!
- Roj baş kurê min! Tu tê razayî?
- Erê dayê. Xewa min pak bû. Zef baş razam.
- Pak e kurê min, serçavê xwe bişo, ez ji te ra taştê daynim.
- Dayê, ka bavê min û xwişka min?
- Kurê min, ew zû rabûn, çûne ser doktor.
- Çima dayê?
- Diranê xwişka te dileqîya, diêşîya, çûn ser doktor, wekî bikşînin. - Dayê, lê kengî diranê min ê bileqe? Wekî ez jî bi bavê xwe ra herim ser doktor?
- Her roj di wextê da rabe, bi sporê mijûl bibe, diranê xwe bişo û xwarina xwe bixwe, tu dê mezin bibî, wê çaxê diranê te dê bileqe, tu jî dê bi bavê xwe ra herî ser doktor.
- Bû dayê, ez ê her roj di wextê da rabim, diranê xwe bişom, sporê bikim û paşê jî xwarina xwe bixwim nola xwişka xwe biaqil bim.

Xeberên rojane*

Roj baş! (sibe bi xêr!)	—————→	Ji bo serê sibehê,
Dem baş! (merheba, roj bi xêr)	————→	Ji bo her wextê,
Êvar baş! (êvar bi xêr)	—————→	Ji bo êvaran,
Şev baş! (şev xweş)	—————→	Ji bo şevê

*Li komarên Sovyêta berê, usa jî li gelek herêmên Kurdistanê **xeberên rojane** bi awayê cuda cuda jî têne gotin.

Hevok

Hevok (cumle) çî ye?

Hevok yekeyeka ristesazîyî (komeksazîyî) ye ku bi giştî ji pêvaberekê û ji beşên din pêk tê. Ew fikrekê, xwastekekê, bûn û nebûnekê bi temamî û tomerî dide kivşê. Hevok maneyeka tam dide kivşê. Bi alîkarîya hevokan mirov fikirên xwe dîyar dikin, pirs û daxwazên xwe didin kivşê.

Nimûne:

Êdî bihar e. Ewra vî ye. Şev e. Ji azadîyê xweştir li dinyayê tiştek tune ye. Kurdên Çîmkendê welatparêz in. Ew çand û hunerên xwe bi pêş da dibin.

Hevokên jêrîn bi van bêjeyan temam bikin!

we, te, Almatîyê, dibistanê, mêze, destên xwe, deh, Qasim

1- Li mala kî heye?

2- Mala me li bajarêye.

3- Ez sibehê radibim û diherim

4- Navê bavê min e.

1- Ez li ba rûniştme.

2- Em li malê li tîlêvîzyonêdikin.

3- Em berî xwarinêdişon.

4- Ezsalî me.

Spartek



Di heqê bihar, havîn, payîz û zivistanê da çend hevokan di defterên xwe da binîvisin.

ÎSMAÎL Û ÎBRAHÎM

Îsmaîl û Îbrahîm birayên cewî ne. Ew pir ji hevdu hez dikan. Sibehê zû radibin cîyê razana xwe berhev dikan, serçavên xwe dişon, sipor dikan, bi dû ra taştê dikan. Kitêb û defterên xwe didin hev û diçin dibistanê.

Îsmaîl ji edebîyat û zimanê kurdî pir hez dike. Wî gelek helbestên kurdî, qazaxî, rûsî ji ber kirine. Bi xwe jî carinan helbestan dinivîse. Mamosteyê wî yê edebîyatê dibêje: “Kurê min, wekî tu guhê xwe bidî ser zargotina cimaetê û beşê wê bîra di xwe da xwedî bikî, tu dê bibî helbestvanekî baş”.

Îsmaîl li cem bapîr (kalik) û dapîra (pîrik) xwe yê 80 salî rûdine û guhên xwe didin çîrok û stiranên wan.



Îbrahîm jî ji siporê pir hez dike. Dixwaze bibe werzişvanekî baş. Xwişka wan a mezin rojhilatzan e; bi kurdî, erebî, îngilîzî, qazaxî û rûsî dizane. Haha ew ser wêjeya kurdî lêkolînan dike. Birayê wan ê mezin xwendekar e. Dê û bavê wan mamoste ne. Ew ji zarokan pir hez dikan.

Forma daxwaznameyê

**Ji serokê Çanda Navenda
Kurdên Qazaxistanê "Berbang" ra
Ji binelîyê bajarê Almatîyê Silêmanê
Mihemed.**

Daxwazname

Nevîyên min Îbrahîm û Îsmaîl di pola şeşan da dixwînin. Her du jî pir ji zimanê kurdî hez dikan. Hêvî dikim ku hûn wan gebûlî Dibistana Zimanê Kurdî ya Yekşemê bikin.

Bi rêz û sîyanet...

*Silêmanê Mihemed
25. 08. 2020*



Çemê gundê me

Gundê me li fêza bajarê Almatiyê ye, navê gundê me Janaturmis e (Rîya nû). Wexta dibe bihar, her der hêşîn dibe. Di hewşa mala me da kanîyek heye. Ava wê pir sar e. Weki ava zozanan e. Ji ava kanîya me çem dikişe.

Dayika min ji kanîyê avê tîne.

Dibêje: "Ava vê kanîyê pir sar e, ji bo saxlemîya mirovan gelek baş e." Çawa bavê min piştî xwarinê tasek ava sar vedixwe, ji min ra jî dibêje: "Keça min a delal, tu jî piştî xwarinê kaseyek av vexwe, ji bo ku tu zû mezin bibî, bedew bibî." Ez li gilîyê bavê xwe guhdarî dikim. Piştî xwarinê îskanek ava ne ewqasî sar vedixwim.

Carinan dayika min dibêje: "Keça min, were em herin ser kanîyê." Ez li gilîyê dayika xwe guhdarî dikim û tev dayika xwe diçim ser kanîyê. Alîkarîya dayika xwe dikim. Avê dadigirim. Ji bo ku piştî xwarinê ez û bavê xwe, eme îskanek av vexwin. Dayika min bi wê avê xwarinê çêdike, çayê dikelîne, hêvîr distirê.

Li jêrê çend hevokên sade hene, ji wan kîjan hevokên pirsyarî ne, bidin kivşê.

- 1- Ez diçim malê.
- 2- Şemam xwe ra dilîze.
- 3- Kî hate bal te?
- 4- Tu çima bêaqilîyan dikî?
- 5- Werin, em herin parkê.

Masîyên akvaryûmê



Gelek masîyên min hene. Hemû jî di hundirê akvaryûmê da dijîn. Ez rojê sê caran xwarinê didim wan. Wexta ku ez nêzîkî wan dibim, ew dizanin ku ez ê xwarinê bidime wan, loma jî berê xwe didin min û devê xwe vedikin.

Kengî xwarinê dixwin û têr dibin, ji xwe ra dilîzin, di nava avê da melevanîyê dikin. Ez carinan jî ji wan ra gilî dikim. Lê ez dengê wan nabihîzim.

Di heqê min da çî dibêjin, ez nabihîzim, lê usa seh dikim, wekî ez ji wan hez dikim, ew jî ji min hez dikin. Heywan usa ne, tu ji wan hez bikî, xwarinê bidî wan, ew ê jî ji te hez bikin.

Di wan hevokan da kîjan hevokên erênî ne, bidin kivşê.

- 1- *Têmûr dersa xwe hazir dike.*
- 2- *Meryem îro neçûye bal pîrika xwe.*
- 3- *Ez alîkarîya dayika xwe dikim.*
- 4- *Bavê min pir nerrehet e.*
- 5- *Çira kesek li min napirse?*

Li jêrê çend hevokên sade hene, ji wan kîjan hevokên neyînî ne, bidin kivşê.

- 1- *Gelek masîyên min hene.*
- 2- *Ez rojê sê caran xwarinê didim wan.*
- 3- *Carinan ji min ra gilî dikin.*
- 4- *Lê ez dengê wan nabihîzim.*
- 5- *Di heqê min da çî dibêjin, ez nabihîzim.*



Simore (sivorî) ji zarokan hez dikin

Hêlîna xwe di kunên daran da çêdikin. Xwarina wan çerez e, gûz, behîv, dendik û yên din in. Heywanên pir zîrek û jêhatî ne. Simore tu caran kedî nabin. Ew tim li ser darên gûzan dijîn.

Li baxçeyên bajarê Almatiyê da gelek simore hene û ji mirovan natirsin. Mirovên heywanhez gûz û dendikan didin wan. Loma ew hîn bûne û tene bal mirovan.

Lê heger di destê mirov da gûz, yan jî dendik tune bin, hema direvin û xwe bi dûr dikin. Kengî hûn çûn parkê bal simoreyan bi xwe ra gûz, yan jî dendikan bibin ku smoreyên bedew û xweşik ji we nerevin.

Wexta hûn destê xwe dirêjî wan bikin, ew ê gûz û dendikan bibînin û bi kêfxweşîyeka mezin ber bi we ve bên.

Li jêrê çend hevokên sade hene, ji wan kîjan hevokên pirsyarî yên erênî ne bidin kivşê.

- 1- Sivorî heywanên biçûk in, yan na?
- 2- Sivorî hêlîna xwe li kêdera darê çêdikin?
- 3- Li wê parkê sivorî gelek in?
- 4- Merivên heywanhez gûz û dendikan didin sivorîyan.

☐
☐
☐
☐

Pirs

Hûn dizanin di dawîya hevoka pirsyarî da kîjan xalbend (îşaret) heye?

Hevalê min tê mala me bi mêvanî

Duh min ji hevalekî xwe yê nêzik nameyek wergirt. Di nameyê (mektûb) da nivîsîye ku piştî sê rojan ew ê bê bal me. Hevalê min ê bi balafirê (firinde) ji bajarê Astanayê bê Almatîyê. Ew ê çend rojan li mala me bimîne û hêsa bibe.

Min ji dê û bavê xwe ra got, ew gelek şa bûn. Dayika min got; "Lawê min, ez ê ji we ra xwarinên zef xweş çêkim."

Min ji bo hevalê xwe bernameyek (programek) hazir kir. Ev bername ji bo 5 rojan e. Di nava van pênc rojan da ez ê wî li kî derê bigerînim, em ê herin kî derê, ez ê wî bi kîjan heval û hogirên xwe bidim naskirin, min ev hemû yeko yeko di bernameyê da nivîsîne.

Di destpêkê da ez ê wî bibim dibistana ku lê dixwînim. Bila wira nas bike. Paşê ez ê heval û hogirên xwe pê ra bikim nas.

Roja duyem, em ê herin parka mezin, ew parka ku di nava bajarê Almatîyê da ya herî bi nav û deng e. Di hundirê parkê da her tişt heye.

Roja sêyem, em ê tevî dê û bavê min herin havîngeha me. Ew havîngeha me li bin çîyayê Alatûê ye, dikeve jora bajêr. Li wê derê hewa gelek temîz e, hênik e. Avên sar gelek in, hêşînayî zaf in û cîyê seyrangehê hene. Paşê em ê herin Mêdeoyê û Çîmbulakê têr bigerin.

Roja çaran em ê herin muzêya Almatiyê. Li wê derê gelek tiştên dîrokî hene. Piştî nîvrojê jî em ê herin golên Almatiyê û li wê derê bikevin avê. Roja pêncan jî bavê min gotîye, "em ê gazî qewmê xwe bikin, li malê em ê xwarinên xweşik çêbikin, bila hevalê te, qewmê te nas bike."

Bernameya pênc rojan hazir e, min di deftera xwe da nivîsîye. Paşê jî ez ê, tevî dê û bavê xwe, hevalê xwe bibim balafirgeha (aîroport) Almatiyê, verêkim. Ew ê li balafira (firinde) Almatî-Astanayê siwar bibe û here bajarê xwe yê hezkirî, mala xwe.

Spartek

Di deftera xwe da di heqê mêvan û mêvandarîyê da nivîsekê binivîse.



Sersala We Piroz Be

Sersala we pîroz be

Ez sersala we ji dil û can pîroz dikim.
Hêvîya min ew e ku sala nû dê ji bo we
bibe sala kêfxweşî û dilgeşîyê.
Li gel rêz û silavên min ên biratîyê....

Mizgîn



Pirs

Hûn jî ji bo cejn û sersalê kartekê binivîsin.

Min Newroz çawa nas kir

Di heyamê me da cejna Newrozê qedexe bû. Li gel ku ez bi temenê xwe ne biçûk bûm jî lê min nizanibû ku cejna Newrozê ya kurdan e.

Li gor xwendina xwe, tenê min dizanîbû ku ew bi tenê cejna biharê ye. Heta rojekê Şêroyê hevalê min ji min ra got:

Sibê 21ê adarê ye. Tu jî naxwazî bi me ra bêtî şeva Newrozê?

Çima bi şev? min jê pirsî, ya baş ew e ku em herin seyrane û roja xwe bi xweşî li çolê derbas bikin.

Şêroyî bersiva min da:

- Berê ez jî wek te bûm, min digot qey Newroz cejna biharê ye. Lê ya rast, Newroz cejna kurdan e.

Min careke din jê pirsî:

Tu ji ku pê dizanî ku Newroz cejna me ya neteweyî ye?

Îcar wî ji min ra ta bi derzî ve kir, bi hûngilî behsa çiroka Newrozê kir.



ÇÎROKA NEWROZÊ Û KAWA

Hebû tunebû, li welatê kurdan
padişahê hebû, navê wî Dehak bû.
Rojekê Dehak nexweş dikeve. Li ser
her milekî wî marek derdikeve.

Dehak pir ditirse. Gazî hemû
doktoran dike. Doktor tu çareyekê
nabînin. Dehak ji hemû doktoran ra
dibêje:

-Zû dermanekî peyda bikin!

Doktor gelek ditirsîn, paşê
dermanekî peyda dikin û ji Dehakî ra
dibêjin:



**-Padişahê min divê tu her roj du zarokan
bidî van maran, yan na, mar dê serê te
bixwin.**

Dehak ji leşkerên xwe ra dibêje:

-Herin ji min ra zarokan bînin!

Leşker ji gund û bajaran zarokan digirin û
dixin zîندان. Û her roj du zarokan
didin maran.

Li welatê kurdan hesinkarek jî hebûye,
navê wî Kawa bûye. Dehak şeş zarokên
wî kuştine. Bi tenê lawekî Kawa maye.



Kawa ji xelkê ra dibêje:

- Weha nabe, divê em zarokên xwe ji destê Dehakê pîs xelas bikin!

Kawa bi şev û roj dixebite. Ew ji gundî û cotkaran ra şûr û mertalan çêdike.
Rojekê leşker dîsa tîn mala Kawa û dibêjin:

-Kawa divê em îro lawê te yê dawî jî bibin.

Kawa dibêje:

-Hûn herin, ez ê îşêv bi lawê xwe ra werim qesirê.

Kawa ji xelkê ra dibêje:

**-Ez ê îşêv Dehak bikujim. Dema min Dehak kuşt, ez ê li ser banê qesirê
êgir dadim.**

Êvarî Kawa çakûçê xwe digire û bi lawê xwe ra diçe qesira Dehak. Dehak
dibêje:

-Kawa ez gelekî diêşim, marên min birçî ne, zû kurê xwe bide maran!



Newroz li bajarê Akrê, başûrê Kurdistanê

Kawa kurê xwe dibe ku bide marên Dehak. Lê ew kurê xwe dide pişt xwe û yekser çakûçê xwe bilind dike û li serê Dehak dixê. Dehak dimire.

Kawa li ser banê qesirê agirekî vêdixê. Jin û mêr û zarok dema êgir dibînin, kêfa hemûyan tê. Ew jî li her derê bajêr agir dadidin. Li dora êgir govendê digirin.

Ev serhildan roja 21ê Adarê bûye. Welatê kurdan û zarokên kurdan jî Dehakê zalim xelas dibin. 21ê adarê jî bo kurdan dibe rojeka nû, rojeka cejnê. Navê vê rojê jî dibe **Nûroj, Newroz**. Her sal di **21ê Adarê** de, kurd bi agir û govend û stranan **Newrozê** pîroz dikin.

BERSÎVA VAN PÎRSAN BÎNÎVÎSE

Navê padîşahê ku zarokan dîkuje çi ye?

Li ser her milekî wî çi hebûye?

Doktor jî nexweşîya Dehak ra çareyekê dibînin, çare çi ye?

Leşker dadikevin gund û bajaran çi dikin?

Çend zarokên Kawa hatine kuştin?

Maneya Newrozê çi ye?



Kulîlka min

Îro ez û birayê xwe, em çûn sûkê. Em gelekî gerîyan. Me ji bo malê pincar, pamîdor, xiyar, îsot û sêv kirîn. Fêkî û pincar li bazarê gelek erzan in û ji bo saxlemîya mirovan kardar in. Loma ji heftayê carekê ez û birayê xwe, em diçin û dikirin. Piştî ku me fêkî û pincar kirîn, me berê xwe da malê. Bi rê da birayê min li bal jineka pîr sekinî. Jinika pîr kulîlk difirotin. Kulîlkên di nava kudikan da gelek bedew û rind bûn. Birayê min ji min pirsî:

- Kîjan kulîlk bedew e?

Min jî got:

- Eva hanê sosin e, pir bedew û rind e, hela gelek hêşîn e, hê venebûye.

Birayê min bi sed tengeyî baqek sosin ji min ra kirî. Me hilda anî malê. Min danî ser maseyê. Niha ew kulîlk li ser maseyê ye, lê kulîlka herî bedew e. Ez her roj avê didimê û pê ra xeber didim, çawa ku birayê min ji min ra gotiye: Tu pêra xeber bidî, ew ê gelek zû mezin bibe, ew ê jî bi te ra xeber bide.

Li jêrê çend hevokên têkel hene, ji wan kîjan hevokên erênî ne, bidin kivşê.

- 1- Îro ez û birayê xwe, em neçûne sûkê.
- 2- Em gelek gerîyan.
- 3- Niha ew kulîlk li ser maseyê ne, kulîlkên herî bedew in.
- 4- Bi rê da birayê min li bal jineka pîr sekinî.
- 5- Kîjan kulîlk bedew e?

☐
☐
☐
☐
☐
☐

Li jêrê çend hevokên têkel hene, ji wan hevokan kîjan hevokên pirsyarî ne, bidin kivşê.

- 1- Ez gelekî dixwazim xeber bidim, lê kes tune.
- 2- Wexta min ew dît, ez kelogirî bûm, lê çi bikim.
- 3- Tu zanî kî li wir heye?
- 4- Baş e, tu diçî wir, lê tu yê çi bikî?
- 5- Dinya him xweş e, him jî nexweş e.

☐
☐
☐
☐
☐
☐

Rojbûna te kîngê ye?

Dersdar: Fatma, tu çend salî yî?

Fatma: Ez 12 salî me.

Dersdar: Rojbûna te kîngê ye?

Fatma: Rojbûna min baharê ye.

Desdar: Kijan mehê ye?

Fatma: Meha gulanê ye.

Dersdar: Çendê meha gulanê ye?

Fatma: 20ê meha gulanê ye.

Desdar: Ez ji te ra, emrê baş dixwazim.


Fatma: Spas dikim mamoste.

Tiştonek

Tiştêk heye tiştônî,

Ne pê heye, ne pehnî

Her roj diçe kanî. Ew çî ye?



rêc

Odeke şûştî-mûştî

Axayek têda rûniştî.

Ew çî ye?



rûş

Li jêrê çend hevokên têkel hene, ji wan kîjan hevokên neyînî ne bidin kivşê.

- 1- Kulîlk xemla malê ne.
- 2- Ez ji kulîlkan hez dikim, lê xwişka min jê hez nake.
- 3- Her roj ez avê didim kulîlkan.
- 4- Ez bi kulîlka xwe ra xeber didim.
- 5- Ew bi rê ketin û çûne malê.
- 6- Emîne bi kurmancî baş diaxive.

☐
☐
☐
☐
☐
☐

Spartek

Di defterên xwe da hevokeka erênî û li hember wê jî hevokeka neyînî binivîsin.

Dîk, keresû (reşêlek), werdek û rûvî

Dîk, keresû û werdek bûne hevalên hev, gilîyên xwe kirin yek û gotin:

- Em ê herin Hecê.

Çûn bi rê da rastî rûvîyekî hatin. Rûvî dêna xwe dayê, dîk, keresû û werdek wa diçin. Got:

- Hûn bi ku da diçin, gelî xwişk û birayên min?

- Em diçin Hecê.

- Ez jî dixwazim bi we ra bêm, hema ez li hevalan digerîyam. Rûvî ew birin, çûn ber çem û got:

- Wekî em weha herin, rê dûr dikeve, lê got ku li vê derê bin vî çîyayî qulek heye, em ê di qulê ra herin û zû bigihêjin.

Rûvî ew birin kirin qulikê, dêla xwe da ber, sekinî. Wan dêna xwe dayê ku rûvî ew xapandine. Rûvî gote dîk:

- Ez ê te bixwim.

Dîk got:

- Çima?

Rûvî got:

- Tu bi şev, roj, nîvroj, êvarê weha bang didî, nahêlî xelq razê, xewa wan diherimînî, nahêlî hêsa bin, ez ê te bixwim.

Û dîk xwar. Rûvî gote werdekê:

- Tu diçî rex golê hêlîna xwe çêdikî, cûcîkên te dikevin nava avê, zar tîn, cûcîk xwe dîkin binê avê, zar lê digerin, nabînin, xwe davêjin avê, dixeniqin, loma ez ê te jî bixwim.

Rûvî werdekê jî dixwe. Dor tê keresûyê. Keresûyê digire dike devê xwe û dibêje:

- Tu ji ber xelkê radibî difirî dikî pirînî, xelk ditirse li erdê dikeve, dest û pîyên wan dişiken. Îcar keresû jê dipirse:

- Tu ew qas mirovekî serwext î, hemin tu dê min bixwî, lê esilê te çî ye? Esilê xwe ji min ra bibêje.

Rûvî dibêje:

- Esilê min fêlbazî ye.

Devê wî vedibe, keresû ji dêv derdikeve û difire diçe. Diçe dera hanê datîne û dibêje:

- Îcar te çima got, fêlbazî, "te bigota ez bêaqil û fêlkotî me!"

Spartek

Rûvî sembola fêlbazîyê ye. Hûn di heqê hevaltîya rûvî da çî dizanin, di defterên xwe da binivîsin.



Diz û mele

Li gundekî yek diçe dizîya mirîşkên cînarê xwe û mirîşkên wî didize. Sibe rohnî dibe, xwedîyê mirîşkan radibe, diçe derîyê kolikê veke, dinêre ku mirîşk di hundirê kolikê da nîn in. Difikire, diçe û tê, ji xwe ra dibêje:

- Heye, tune ye, diz ketine kolika mirîşkan.

Roja înyê meseleya dizîya mirîşkên xwe ji meleyê gundê xwe ra dibêje:

- Tu mele yî, tu her tiştî dizanî. Lazim e ku tu bizanî, bê kê mirîşkên min dizîne.

Mele dibêje:

- Temam, ez ê dizê mirîşkên te bibînim.

Xutbe xelas dibe, mele bang dike û dibêje:

- Gundîno, berî ku hûn belav bibin, gotineka min ji we ra heye, ez ê bibêjim.

Mele meseleyê dibêje:

- Kê mirîşkên vî merivî birine, bila bi camêrî rabe bibêje ku wî birîye. Lê heger nebêje, ez wî nas dikim û ez ê wî derxim pêşîya cimaetê û rezil û riswa bikim.

Mirovê ku mirîşk dizîne dengê xwe nake. Mele dinêre ku kes dengê xwe nake û hema radibe ser lingan û tilîya xwe dirêjî nava civatê dike û dibêje:

- Filankes, perikên wan mirîşkan ji ser serê xwe biavêje!

Hingê dizê me hema destê xwe diavêje ser serê xwe.

Mele dibêje: -Binêre, te rastî nedigot, lê destê te bê hemdî xwe got...

Hevokên jêrîn bixwînin û li gor wan hevokên pirsyarî binivîsin

- 1- Li gundekî yek diçe dizîya mirîşkên cînarê xwe û mirîşkan didize.
- 2- Sibê zû xwedîyê mirîşkan radibe, diçe derîyê kolikê veke, dinêre ku mirîşk di hundirê kolikê da nîn in..
- 3- Temam, ez ê dizê mirîşkên te bibînim.
- 4- Ew here kar, wê gelek baş be.
- 5- Germaya îro em aciz kirin, lê em dikarin çî bibêjin.



Axayê min bûye bostan

Rojekê axa nexweş dikeve, ji xulamê xwe ra dibêje:

- Kuro, here bal hekîm, bibêje zû were, axayê min nexweş e.

Xulam:

- Baş e, axa, lê heger hekîm nexweşîya te bipirse ez çi bibêjimê?

Axa:

- Hema bibêje ku serê axayê min wekî kundiran werimîye, pozê wî wekî gêzeran werimîye, destên wî wekî xîyaran werimî ne, lingên wî wekî bacanan werimîne, zikê wî wekî zebeşan werimîye....

Xulam:

-Axayê min ê delal, ma ez ê ew qas tiştî çawa di hişê xwe da bihêlim, hema gotina kurt, ez ê ji hekîmî ra bibêjim: "Hekîm, ez bi qurban, zû were, axayê min bûye bostan!..»

Li jêrê çend hevokên hene, ji wan hevokan kîjan neyênî ne, bidin kivşê.

1- Wexta ez diçim malê, ez li derûdora xwe nanêrim û wisa diçim.

2- Lê çaxê ji karê xwe tîm, ez dilezînim.

3- Ez li tîlêvîzyonê nanêrim.

4- Ev çi qas wext e ku min tu nedîtibû yî.

5- Apo, wekilê silavan be.

☐
☐
☐
☐
☐

Spartek

Hûn jî pêkenînekê di deftera xwe da binivîsin.

HA GULGULÎ, GULGULÎ

Allegro

Ha gul - gu - lî, gul - gu - lî,

Ha gul - gu - lî, gul - gu - lî, wey,

Keç' - kê rîn - dê, gul - gu - lî.

c 6820 κ

Ha gulgulî, gulgulî

Gulgulî, ha bi gulgulî, gulgulî,
Kesk û sor da xemilî, gulgulî,
Dinya kin û kemil î, gulgulî,
Gulgulî ha bi gulgulî, gulgulî.
Xortê kurda xalis in, gulgulî,

Ji elbeta fêris in, gulgulî,
Xwe egît in, natirsin, gulgulî,
Gulgulî, ha bi gulgulî, gulgulî.
Keçkê kurda dengbêj in, gulgulî,
Ji ser dila dibêjin, gulgulî.

Temam kezî direj in, gulgulî,
Gulgulî, ha bi gulgulî, gulgulî.
Keçkê kurda delal in, gulgulî,
Dengbêj in, deng zelal in, gulgulî
Tev yek in, tev heval in, gulgulî,
Gulgulî, ha bi gulgulî, gulgulî.



Koşk û seraya şagirtan (Almati)



Ez zarok bûm, min hê di dersxana çaran da dixwend. Carekê bavê min, ez û birayê min ê mezin hildan û em birin koşk û seraya şagirdan. Em ketin hundirê wê. Min li derûdora xwe nihêrî û ez ecebmayî mam. Salona sporê ya mezin, hewzê avê yê temîz, salona kilam û reqasê (ya folklorê) zarokan govend girtibû û dilîst. Bi dû wê yekê ra ez û birayê xwe, em her gav piştî dersan diçûn seraya şagirdan, me spor dikir û dilîst.

Hevala min ji min xeydî



Berfîn hevala min e. Ez gelek jê hez dikim, ew jî ji min hez dike. Em bi hev ra diçin koma sêyan. Li dibistanê ew li rex min rûdine.

Ez her tiştên xwe xweşik û cindî pê ra parve dikim. Ew jî gava ku çokolatayan dikire, tîne dide min.

Di rojbûna min da bavê min aftoyeka xweşik ji min ra kirî.

Duh wexta em ji dibistanê vegerîyan, ew hat bal min û got: "Ka afoya xwe bide min, ez hinekî biajom." Min deng nekir. Li ber xwe ket û çû. Lê min nizanibû ku wê ji min bixeyide. Ez ê niha herim bal wê û bibêjim: "Bibexşîne, min fam nekir, bê tu çi dixwazî, min bêhemdî xwe usa kiriye."

Çawa ku bavê min gotibû, lazim e ku tu dilê hevalên xwe neşikînî, heger te şikand jî lazim e ku herî bal wan û jê lêborîna xwe bixwazî, dilê wan şa bikî.

Spartek

Di heqê hevaltîya baş da qise bikin û di defterên xwe da binivîsin.

Rast û çewt

Li jêrê 20 hevok hene. Hin ji wan rast in, hin jî çewt in (şaş in). Yê ku rast in, li hember wan (R) û yê ku çewt in li hember wan jî (Ç) yê binivîsin.

Di zimanê me da 8 tîpên dengdêr hene.

R

- Mirov wexta berê xwe dide rojhilatî, milê rastê başûr e.
- Zozan cihê havîngeh û çêreya pêz e.
- Ehmed ava sar vexwarîye, gewrîya wî diêşe.
- Mîrze bejinbilind e, loma nikare bi rê ve biçe.
- Silêman gelek dewletî ye, lê xwarina wî tune ye.
- Li çîyayan tu caran berf nabare.
- Baran her tim biharê dibare.
- Di salekê da 12 meh û çar demsal hene.
- Meriv nikare zimanê kurdî hîn bibe.
- Emrê min ji emrê dayika min zêdetir e.
- Almati bajarê Qazaxistanê ye.
- Li Qazaxistanê bi tenê qazax dijîn.
- Bakurê Îraqê Kurdistan e.
- Yê ku gotinên pêşîyan gotine, rûsipîye berê ne.
- Zargotina kurdan gelek dewlemend e.
- Çîrok wekî çarînan tê nivîsarê.
- Tîpên zimanê kurdî 31 in.
- Şeş û çar tevayî dikin panzdeh.
- Mirov di têlêfonê da bi tenê dengê însanan dibihîse.
- Di behran da bi tenê masî hene.

☐
☐
☐
☐
☐
☐
☐
☐
☐
☐
☐
☐
☐
☐
☐
☐
☐
☐
☐
☐

MIROV Û MAR

(Qisa cimaetê)

Mirovek bi rê ve diçû, rastî marekî hat. Mar ketibû bin kevirekî mezin. Ne dikaribû derkeve, ne jî bilive. Gunehe wî bi wî marî hat, xwe da ber kêvir, kevîr rakir û mar xilas kir. Marî xwe rakişand, rabû ser zikê xwe û xwe dirêjî wî kir. Xwast pê vede. Mirov got:

- Maro, heyran, weha nabe! Min tu ji mirinê xilas kirî, tu dixwazî min bikuji?

Mar got:

- Çima, ma ji vira pê da em ne dijminên hev in? Ez ê bi te vedim.

Mêrikê reben kir û nekir mar jê venegerîya. Paşê gotê:

- Nabe, em herin ji aqilmendekî bipirsin.

Mar qayîl bû û her duyan bi hev ra da ser rêyê û çûn. Çend gava çûn rastî siwarekî hatin. Meseleya xwe jê ra gotin. Siwarî li mêrik nêrî û kenîya, paşê gote wan:

- Divê ez jî wî cihî bibînim? Bi dû ra ez ê biryara xwe bidim.

Bi şûn da vegehiyan û ber bi kêvir ve hatin. Siwarî ji mêrikra got:

- Tu kêvir rake.

Wî kevîr rakir. Siwarî ji mar ra got:

- Divê tu jî bikevî bin kêvir.

Mar ket bin kêvir û mêrikî kevîr berda ser. Bîstek derbas bû, siwar qet deng nedikir. Mar got:

-Siwaro, kanî biryara te? Ez di bin kêvir da pelixîm!

Siwarî got:

-Tu hele hê nizanî çî ye qencî, çî ye xirabî, çî xweş e û çî ne xweş e, di bin kêvir da van giliyan hîn be, paşê ez ê biryara xwe bidim.

Mêrikê reben xwest ku here, yê siwar jê ra got:

- Divê tu careka din vî kevirî ji cihê wî ranekî. Siwarî gilîyê xwe berdewam kir:


- Ew çî ye li ber te?

- Mar e.

-Ew çî ye di destê te da?

- Dar e.

- Bêaqilo, lê bixe, çima tu nizanî ku ew neyar e.



Biratîya quling û rûvî

Rojekê rûvî quling gazî mala xwe mêvanîyê dike û jê ra şorbeyeka nîskan çêdike. Paşê şorbê valayî taseka tenîsk dike û dibêje:

- Kerem bike, birayê quling.

Quling çend caran nikilê xwe li tasê dixê, dike û nake nikare şorbeyê bixwe. Mejîyê quling ji hêrsê diheje. Wê rojê quling birçî dimîne. Lê çawa bike, şerm dike ku bibêje: "Ez birçî mame", di dilê xwe da dibêje; "Lazim e ez tola (heyfa) xwe ji rûvî hilînim."

Quling ji rûvîyî ra dibêje :

- Bira, tu jî sibehê mêvanê min î.

Rûvî dilxweş dibe. Roja din berê xwe dide mala qulingê birakê xwe.

"Destebirakê" wî quling tê pêşîya wî û dibêje:

- Tu bi xêr hatî, di ser seran û çavan ra hatî, birayê min ê delal!

Rûvî gelek dilxweş bû. Ji xwe ra got: "Niha quling xwarineka gelek xweş ji min ra çêkirîye."

Qulingî jî hazîrîyên xwe, ji bo heyfîlanînê ji pêş da kiribû. Şorbeşîr çêkiribû û xistibû kûzîkekî qulpdirêj.

Qulingî xwarina mêvanê xwe anî û da ber wî. Lê belê, xwarin di kûzîkê dirêj da bû. Rûvî kir û nekir, devê wî negihîşte xwarinê.

Qulingî gotê:

- Birayê rûvî, kerem bike bixwe.

Rûvî xwe da pêş. Li dora kûzîkî çû û hat, lê nihêrî, bêhn kir, evraz kir, berjêr kir, tu çare nekir.

Qulingî nikilê xwe yê dirêj kire kûzîkî û kete ser xwarinê û xwar. Rûvîyî nihêrî û ji "birakê" xwe ra got:

-Çima ez pêkenîyê te me, te weha kir? Biratîya weha heram e...

Spartek

"Bratiya" quling û rûvî bi gilîyê xwe şirove bike.

JÎ ZARGOTÎNA GELE ME (Têderxistinok)

Berav dikim barê gane,
Datînim erdê wek çîyan e.
Ew çî ye?

(muq)

Cot bira ne,
Du diran e.
Ew çî ye

(seqem)

Sed û şêst şeş reşêle,
Duwazdeh hêlûn hêkele.
Ew çî ye?

(las)

Du xuşkê cînar,
Ji hevdu nakin bawer.
Ew çî ye?

(vaç)

Aş e, aş e,
Çend xeraş e,
Dudu paş e,
Dudu pêş e.
Ew çî ye?

(êkelêç ênahug)

Li vira go kişt,
Li wira go mişt
Çû ber derî kulê kuşt.
Ew çî ye?

(îzêg)

Qulçê tarî,
Dû lê barî.
Ew çî ye?

(gnivit)

Ji şekir şîrîntir e,
Ji hêsin girantir e.
Ew çî ye?

(wex)

Hespa çê,
Bazda hewşê.
Ew çî ye?

(çek)

Ez mîyê naxum,
Berxê dixum.
Ew çî ye?

(zûg)

Qesrek e sipî,
Glover û bê derî.
Ew çî ye?

(kêh)

Çar çarix,
Bîst û çar bençarix.
Ew çî ye?

(apseh ê ramzib û lan)

Pêkenok

Ceh jî radixin

Hebû, tune bû, du cînar hebûn. Ji wan yekî çî dixwast, dibir, lê venedigerand. Di nava gundî da jê ra Heqneda dihat digotin. Carekê ew tê bal cînarê xwe derîyê wî dikute û dibêje:

-Apo, ka werîsê xwe bide, ez ê gavekê bi şûn da vegerînim. Cînarê wî dibêje:

- Li ser çavan, tu li vê derê bisekine, ez ê niha bînim. Disekine, piştî bîstikekê cînar tê û dibêje:

- Bibexşîne cînaro, weleh pîreka min li ser wêrîs genim raxistiye. Kengî vala bû, were bibe.

Cînar ecêbmayî dimîne û dipirse:

-Apo, ew çî gilîye tu dibêjî, ka li ser wêrîs genim çawa tê raxistin?

Cînar dibêje:

- Çawa nabe cînaro? Çaxa tu naxwazî bidî, tu dikarî ceh jî raxî!

Êşa diranan

Bi gotina gotîyan, diranê Apê Hesen pir diêşîya. Bi rojan wî serê xwe dipêça, dikire ofeof, inteint, nalenal diçû û dihat. Rojekê dîsa serçavê xwe bi desmalekê dipêçe û ji malê dertê. Bi rê ve rastî xortekî tê, xort dipirse:

- Apo, te çima serçavê xwe girêdaye?

- Lawo, diranê min diêşe, ez ditirsim ku herim bikşînim.

- Ê, apo, diranek çî ye ku tu ew qas ditirsî û nikarî bidî kişandin? Wekî ew diran di devê min da bûya, vê gavê min ê ew bikişanda û biavêta.

- Ê lawo wekî ev diran di devê te da bûya, min ê jî vê gavê bida kişandin, hûrhûrî bikira û biavêta. Bela ew e ku diran di devê min da ye...

Kûsî û rûvî

(Ji zargotina kurdan)



Kûsî û rûvî xwast ku cîhanê di nava xwe da dabeş bikin. Lê wan li ser zevîyekê li hev nekir. Rûvî got:

- Zevî para min e.

Kûsî got:

-Na, zevî para min e.

Her duyan got:

-Baş e, em ê şert û qirarekê di nava xwe da daynin, yê bê kivşê, çika zevî wê ji kê ra bikeve.

Rûvîyî got:

-Ka, tu bibêje.

Kûsîyê jî got:

-Na weleh, tu bibêje, kî ji me mezin e.

Rûvî got:

- Sala qal û belayê tê bîra min. Ji vê kevintir tişt tune ye. Belê, sala qal û belayê xweş tê bîra min.

Kûsî rûnişt û dest bi girînê kir. Rûvî got:

-Bira, tu çima digirî?

Kûsîyê bersiv da:

-Bira, birînên min qalîk girtibûn, min ji bîra kiribû. Te dîsa anî bîra min. Sala qal û belayê du kurên min ên bermiraz (berzewac) di nava hefteyekê da hatin kuştin. Te ew anîn bîra min.

Rûvî bi gazin got:

-Weleh, min dizanibû ku ev qermoçekên li ser pişta te, ne yên van salan in.

Zevî bû para kûsîyê.

Bizin û karikên wê

Wextekê bizinek ji kerîyê pêz diqete, diçe çîyayî... Binê zinarekî dikole, cîyê xwe çêdike. Bizin li wê derê jî dizê. Sê karikan tîne. Navê yekê datîne Şengulo, navê ya duyem Mengulo û navê ya din jî datîne Qalîçengulo.

Çaxa karik mezin dibin, maka wan dibêje:

- Derî ji kesî ra venekin, kengî min got;

*Şengulo, Mengulo,
Qalîçengulo,
Ez çûme zozana,
Min xwarîye pelên qizwana
Şîr ketiye guhana.
Zû kin, lez kin
Derî vekin, werne dana*

Divê hûn paşê werin û derî vekin.

Çend roj usa derbas dibin.

Rojekê gur dengê bizinê seh dike. Xwe lê ditelîne. Sibetirê wextê bizin diçe zozanan, gur berî hatina wê tê li ber derîyê wan disekine û bi dengê bizinê ve gazî dike:

*Şengulo, Mengulo,
Qalîçengulo,
Ez çûme zozana,
Min xwarîye pelên qizwana
Şîr ketiye guhana.
Zû kin, lez kin
Derî vekin, werne dana.*

Şengulo dibêje:

-Mengulo, Qalîçengulo, derî venekin, ew dengê dêya me nîn e, wextê dana nîn e.

Qalîçengulo jî dibêje:

-Rast e, ev dêya me nîn e, dengê vê qalind e, dengê dêya me zirav û şîrîn e.

Lê Mengulo xebera wan nake, dibêje:

-Na, dêya me ye.

Derî vedike.

Gur dikeve hundir. Şengulo, Mengulo û Qalîçengulo
dadiqurtîne (dixwe), lê dixê diçe.



Bizin vedigere, tê dinêre ku ne Şengulo heye, ne Mengulo û ne jî
Qalîçengulo. Dike mikemik, gelek gazî wan dike, lê kesek cawa wê
nade... Ew êdî li wê derê nasekine, radibe diçe cem teyr û dibêje:

-Teyro, gelo, te her sê karikên min nedîtine?

Teyr dibêje:

- Min nedîtine.

Bizin radibe diçe cem leglegê û dibêje:

-Gelo te her sê karikên min nedîtine?

Legleg dibêje:

-Min nedîtine.

Bizin radibe diçe cem hirçê û dibêje:

-Gidî, ez di bextê te da me, gelo te her sê karikên min nedîtine?

Hirç dibêje:

-Min nedîtine.



Bizin hew dinêre gur di wê rastê ra diçe, dibêje:

- Hebe, tune be, vî gurê har karikên min xwarine.

Diçe pêşîya gur û dibêje:

-Guro, rêya teva kivş e, wekî te karikên min xwarine, were, şerê min, ji te ra şer e! Te Şengulo, Mengulo, Qalîçengulo xwarine. Tu dranên xwe tûj bikî, ez jî stroyên xwe tûj bikim.

Gur şa dibe: "Ev pak bû, ez ê wê jî bixwim" û radibe diçe cem hesinkarekî wekî diranên xwe tûj bike. Lê hesinkar ji bedêla tûjkirinê, diranên wî ko dike.


Bizin jî diçe cem hesankarî û dibêje:

- Heqê te çi qas e, ez ê bidim te, stroyên min rind tûj bike, ez ê heyfa karikên xwe ji gur hilînim»

Gur û bizin gelekî şer dikin. Berî êvarê, bizin stroyên xwe yên tûj di zikê gur ra dike, diqelişîne, Şengulo, Mengulo, Qalîçengulo ji zikê wî derdikevin.

Bizin bi karikên xwe şa dibe. **Karikên wê jî fam dikin, wekî careka din derî ji her kesî ra venekin.**

Balerîna kurd
LEYLA BEDIRXAN
(1903-1986)



Balerîna kurd Leyla Bedirxan di 1903yan da li Stenbolê ji dayika xwe bûye. Leyla Bedirxan keça **Ebdurrezaq Bedirxan** û **Hanriette Hornîk Bedirxanê** ye.

Leyla Bedirxan li dinyayê wekî dotmîra kurdan hatîye naskirin. Ew dotmama **Celadet Alî Bedirxan** û **Kamûran Bedirxanî** ye. Wê bi şeş zimanan dizanîbû.

Bavê Leylayê, Ebdurrezaq Bedirxan (1864 - 1918) jî ji malbata Bedirxaniyan e. Bedirxanî demekê mîrê **Botan** bûn. Paytextê wan **Cizîr** bû.

Leyla Bedirxan demekê li Misirê ma, zaroktîya wê li wê derê derbas bû. Piştî ku bavê wê Ebdurrezaq Bedirxan ji alîyê osmanîyan ve tê kuştin, dayika wê li gel keça xwe Leylayê diçe Vîyanayê.

Leyla Bedirxan li Vîyanayê perwerdeya xwe ya pêşî ya dansê dibîne. Cara pêşî li **Operaya Viyanayê** derdikeve sahneyê, piştî diçe Fransayê û li wê derê bi "**Henri Touache**"î ra dizewice.

Li Parîsê baleyekê pêşkêş dike û baleya wê gelekî tê ecibandin. Parîsî êdî hemû behsa dans û baleya vê dotmîra kurd dikin.



Nav û dengê Leylayê ne bi tenê li Fransayê her weha li **Swîsre, Almanya, Îtalya, Îspanya, Belçîka, Swêd û Amerîkayê** jî belav dibe. Gelek rojnameyên wan welatan li ser Leyla Bedirxan û hunera wê dinivîsin. Li ser afîşên wê her tim dinivîsin: **Prensesa Kurd**. Leyla Bedirxan, bi saya hunera xwe gelê kurd bi raya giştî ya cîhanê dide nasîn.

Di 1932an da di axaftineka xwe da ji bo rojnameya "**Paris Midi**"yê, Leyla bedirxan weha dibêje: *"Ez ne faris im... ez kurd im. Bapîrê min prensê Kurdistanê bû. Lê ji ber dagirkirina osmanîyan hemû belav bûn. Ez li Stenbolê ji dayika xwe bûm. Dema ez pir biçûk bûm, ez û dayika xwe em ji mecbûrî çûn Misirê, piştî Şerê Cîhanê yê Yekem jî em çûn Swîsreyê."*

Prensesa kurd Leyla Bedirxan di sala 1986an da li paytextê Fransayê, li Parîsê jiyana xwe ji dest dide, wefat dike. Lê wê navê kurdan bi dans û baleya xwe li dinyayê belav kir.



BERSİVA VAN PİRSAN BİNİVÎSÎN!

1	Leyla Bedirxan kengî û li ku ji dayik bûye?	
2	Navê bavê wê çi ye?	
3	Navê dêya wê çi ye?	
4	Leyla Bedirxan dotmama kê ye?	
5	Leyla Bedirxan bi çend zimanan zanîbû?	
6	Leyla Bedirxan ji kîjan malbatê ye?	
7	Malbata wan mîrê kî derê bû?	
8	Paytexta vê mîrîtiyê kuder bû?	
9	Kî bavê Leyla Bedirxanê dikuje?	
10	Leyla Bedirxan cara pêşî li kî derê perwerdeya dansê dibîne?	
11	Navê mîrê wê çi ye?	
12	Navê çend dansên wê binivîse.	
13	Di 1932an da di rojnameya "Paris Midi"yê da dibêje; "ez faris im yan kurd?"	
14	Leyla Bedirxan kengî û li kî derê mir?	

Komara Kurdistanê 1946 – Mehabad

Di 22.01. 1946an da Qazî Muhemed li Mehabadê li meydana Çarçirayê Komara Kurdistanê (Dewletî Cûmhûrî Kurdistan) îlan kir. Ev wêne roja îlankirinê hatîye girtin



Di 22.01.1946an da li Kurdistana Îranê, li bajarê Mehabadê, li meydana Çarçirayê, Komara Kurdistanê hat avakirin.



Komara Kurdistanê li bajarê Mehabadê hate avakirin, lê seranserê Kurdistana Îranê di bin hukmê wê de bû.

Serokê Komara Kurdistanê Qazî Muhemmed bû. Qazî Muhemed mirovekî xwende bû, wî bi îngilîzî, fransî, erebî, rûsî, tirkî, farisî û kurdî dizanibu.



Qazî Muhemed û kabîneya Hikûmeta Komara Kurdistanê.
Di hikûmeta Komarê da li gel serokwezîrî, 12 wezîrên cuda hebûn.

- | | |
|-----------------------------|--------------------------------|
| 1- Wezîrê Şer û Parastinê | 7- Wezîrê Poste û Telefonê |
| 2- Wezîrê Karûbarên Derveyî | 8- Wezîrê Karûbarê Bazirganîyê |
| 3- Wezîrê Perwerdeyê | 9- Wezîrê Karûbarê Dadmendîyê |
| 4- Wezîrê Karûbarê Navxweyî | 10- Wezîrê Karûbarê Çandinîyê |
| 5- Wezîrê Tenduristîyê | 11- Wezîrê Kulturê |
| 6- Wezîrê Karûbarê Aborî | 12- Wezîrê Karûbarê Agahdarîyê |



Ordîyek hat çêkirin. Di destpêkê da ji 70 serleşker û 1200 leşkeran pêk hatibû. Di nava serleşkeran da çar kes bûn general: Seyfî Oazî, **Heme Reşîd Xan**, Omer Xan Şîkak û **Mistefa Barzanî**

Di 31ê adara 1947an de Komara Kurdistanê bi destê dewleta Îranê ve hat hilweşandin. Serokê Komara Kurdistanê Qazî Mihemed û hevalên wî hatin girtin û li Mehabadê li Meydana Çarçirayê hatin îdamkirin.

Komara Kurdistanê salekê jîya. Lê di nava salekê da gelek karên hêja kirin. Rojname û kovarên **Kurdistan**, **Nîştiman**, **Hawarî Nîştiman**, **Helale** derxistin.

Ji bo zarokan jî bi navê **Girr û Galî Mindalan** kovarek derxistin.

Radyoyeka kurdî her roj weşana xwe dikiir.

Cara pêşî bi navê **Dayikî Nîştiman** şanoyeka operayî hat amadekirin.



Mamostayên kurd yên dema Komara Kurdistanê 1946. Her wê demê bi navê **Yekîtiya Afretanî Kurdistan** komeleya yekîtiya jinên Kurdistanê jî hatibû avakirin.

Bersiva van pirsan di nav tekstê de bibîne li deftera xwe binivîsin!

PIRS	BERSIV
Komara Kurdistanê kengî hat avakirin?	
Serokê Komara Kurdistanê kî bû?	
Serokê Kurdistanê bi çend zimanan dizanî?	
Navê paytextê Komara Kurdistanê çi bû?	
Çarçira li kî derê ye?	
Çend wezîrên Komarê hebûn?	
Ordîya wan ji çend serleşker û çend leşkeran pêk dihat?	
Navên du generalên Komarê binivîse.	
Komara Kurdistanê kengî hilweşîya?	
Navê du rojname û kovarên dema Komara Kurdistanê binivîse.	
Navê şanoya operayî çi bû?	
Navê kovara ku ji bo zarokan derdiket, çi bû?	

This image shows a full page of white paper with horizontal blue ruling lines. The lines are evenly spaced and run across the width of the page. There are no margins, text, or other markings on the paper.

JI BO TÊBÎNÎ

[illegible]

This image shows a full page of white paper with horizontal blue or grey ruling lines. The lines are evenly spaced and run across the width of the page, leaving small margins at the top and bottom. There is no handwriting or other markings on the paper.

JI BO TÊBÎNÎ

This image shows a full page of white paper with horizontal blue ruling lines. The lines are evenly spaced and run across the width of the page. There are no margins, text, or other markings on the paper.

This image shows a full page of white paper with horizontal blue ruling lines. The lines are evenly spaced and run across the width of the page. There are no margins, text, or other markings on the paper.

JI BO TÊBÎNÎ

[illegible]

ZIMANÊ KURDÎ

Zaravayê kurmancî

Күрд тілін оқытуға арналған оқу-әдістемелік құрал

Құрастырушы: К.И. Мирзоев

Редактор Г.А. Алиев
Тех. редакторы В.К. Мирзоев
Корректор Т.К. Мирзоева
Беттеуші Э.Н. Милютин
Мұқаба әрленімі Л.Г. Мирзоева

ISBN 978-601-08-1355-7



«Мемлекеттік тілді үйрету элиталық курсы» мәдени мекемесі дайындады